



Naverok

Sal 4 • Hejmar 15-16 • Payîz 1998

- Bi Maykil Çayed ra hevpeyvîn 3**
A. Gernas
- Şiûra tarîxî û Lozan 14**
Ahmed Ferîd
- Şerefname û Şerefxanê Bitlîsî 30**
Ebdulla Merdux
- Pirmaneyiya Întegrasyonê
û pêwistiya dabeşkirineke nû 41**
Osman Aytar
- Şeş keçên ciwan 49**
Ji swêdî: Serdar Roşan
- Casimê Celîl 90 saliya xwe tije dike 60**
Wezîrê Eşo
- Ji tîpên krîlî: Rohat Alakom
Edebiyat û nivşên wê 64**
N.Zaxuranî
- Çend helbestvanên nû 70**
Amadekar: Xelîl Duhokî
- Ji civata me kurdan 79**
Laleş Qaso
- Di pêvajoya dîrokê de zimanê kurdî 81**
Zekî Bozarslan
- Toreya civata kurdî 93**
Zeynelabidîn Zinar
- Gelê kurd lawekî xwe î hêja winda kir! 96**
Bo Orhan Kotan
- Ji Komelê 100**
- Di 100 salîya rojnamegerîya kurdî de
kovar û rojnameyên ku li Swêdê derketine 103**
Ji Weşanên Nû 109

Sal 4
Hejmar 15-16
Payîz 1998

Xwedî

Komeleya Nivîskarên Kurd
li Swêde

Redaksiyon

Laleş Qaso
A. Gernas
Zinar Soran
Cemal Batûn
Hesenê Metê
Xelîl Duhokî

Şertên abonetiye

Salek: 200 SEK
Niv sal: 100 SEK
Hejmarek: 50 SEK
*Ji bo welatên din mesrefa
posteyê lê zêde dibe.*

Îlan

Rûpelek: 1 000 SEK
Niv rûpel: 500 SEK
Çarîk rûpel: 200 SEK

Pergala rûpelan

A. Gernas

Rismê bergê pêşî

Postgiro

46 32 31-1

ISSN

1400-528X


Çap

Apec-Tryck

Berpirsiyariya her nivîsê, ya nivîskarê/nivîskara wê ye.

Navnîşan • Adres • Adress:
Box 2015, 176 02 Järfälla/SWEDEN

"Zimanekî ku zarok pê nepeyivin bê paşeroj e"



(Ev hevpeyvîn bi birêz **Maykil Çayed** ra li Biskop-Arnöyê, ku ji bo civîna Kurmancî ya bihara 1998an hatibû Swêd, hate kirin.

Maykil Çayed kurdolog e û sernivîskarê beşa kurdî ya radyoya Dengê Emrîka ye. Ew nêzî sêzdeh sal e ku li ser zimanê kurdî dixebite û 29 ziman zane.)

A.Gernas : Em ji vê pirsê dest pê kin. Di nav ewqas zimanên dinyayê da, te çima bi taybetî zimanê kurdî hilibijart?

M. Çayed : Bi giştî, gava ku ez musîqa û govendên gelêrî yên delal ên gel dibihîzim, ku kêfa min pê tê, arzûyek an daxwazek li nik min peyda dibe ku ez hînî zimanê wî gelî bibim. Wek mînak ez gelek hez ji muzîqa Albanî dikim. Min dest pê kir piçek hînî zimanê wan bibim û her wisa ez hez ji muzîqa û govendên gelên Balkanê dikim, çi Bulgar bin, çi Serb çi Romen bin. Û bi vî awayî jî ez gihîştîme kurda, çunke di destpêkê de, gava ku emrê min hijdeh - nozdeh salî bû, min gelek hez ji govendên Tirkîyê dikir, lê hingê min nedizanî ku, hemû mirovên ku li Tirkîyê dijîn ne Tirk in. Baş tê bîra min, ku min danasandineke govendekê dixwend. Govendekê de vera Entabê bû. Tê da dihate nivîsîn ku, ev govendekê kêmanîya (etnîk) Kurdan li Tirkîyê ye. Ez şaş bûm, ez metelmayî bûm.. Min got, "li Tirkîyê ji bilî tirkan gelekî din heye gelo"?

A.Gernas : Di kîjan salê da bû?

M. Çayed : Di sala 1978an da bû. Min qet nedizanibû. Ji wê rojê virda çavê min vebû û min li kitêbxana zanîngeha Kalîforniya li Los Angelesê, ku wê wextê min li wê derê dixwend, min kitêbek dît. Kitêba Leskot û Bedirxan, "Gramera Kurdî" (bi fransîzî). Min ew kitêb kopî kir. Û ev yekemîn gav bû ji bo min ku ez xwe bielîmînim kurdî.

A.Gernas : Birayê Maykil, te di axaftina xwe ya şevahenga kongreya federasyonê da got, "dema min dest bi hînbûna zimanê kurdî kir, ez di wê

bawerîyê da bûm ku, ew zimanekî feqîr û reben di halekî mirinê da ye.” Em meraq dikin, gelo sedemên ku dibûn bingeş bo hest û ramanê weha çi bûn?

M. Çayed: Li Emrîka kurdên Tirkîyê kê in. Li devera San Fransisko, kê zêde hemû kurdên Tirkîyê nas dikim. Di nav wan de kes tune ku, li malê bi kurdî bipeyive. Hemû bi tirkî dipeyivin. Wextê min ji wan pirs dikir, çima ew bi kurdî napeyivin, wan digot, welle em piçek bi kurmancî zanin. Her gava ku kesekî nû jî dihat, min digot firsat ev firsat e ku ez ê kesekî peyda bikim û bikaribim pê ra bi kurmancî bipeyivim. Yê ku bi soranî dipeyivin gelek bûn, yanî ji Iraqê. Ez her li kesekî ji Tirkîyê digeriyam ku pê ra bipeyivim. Bes min qet peyda nedikir li San Fransiskoyê. Kurdên ji Tirkîyê, bi giştî gelek kê in. Bo wan, kurdî tiştêkî kevn e, tiştêkî zemanê wê derbas bûye. Ew her roj bi tirkî dipeyivin.

Ez çend caran çûme Tirkîyê. Min dît ku li nav kurdên rewşenbîr, mirov rûbirûyê mijareke gelek ecêb da ye. Eger mirov nexwîne, eger mirov pale bimîne, yanî gundî bimîne, hingê mirov wê zimanê xwe biparêze. Eger mirov bixwîne wê bibe rewşenbîr û wê dev ji zimanê xwe, çanda xwe ya kevn berde.

A. Gernas: Yanî, tu bi vî awayî dibêjî, yê ku zimanê kurdî parastiyê, gundî ne?

M. Çayed: Belê, rast e. Gundî, navê aletên çandî û peyvên derbarê heywanan da baş dizanin. Lê fikrên nûjen, li nik wan çê nebûne. Çunke ewana naxwînin, yanî mirov mecbûr e ji du tiştên gelek ecêb yekî hilbijêre. Yan nexwenda bimîne û zimanê xwe biparêze, yan jî bibe xwenda û dev ji ziman û çanda xwe berde. Ne li San Fransisko ne jî li Tirkîyê, di pêvajoya heşt salan da, berî ku min dest pê kir her mehekê carekê biçime Kurdistanê San Diego, min wisa zanî nemaze li Tirkîyê, ku piraniya kurdên dinyayê xelkê Tirkîyê ne, eger kurd bi xwe vê rewşê neguhêrin wê ev ziman berbi mirinê ve biçê. Kurd li Emrîka azad in. Ew dikarin kitêbên kurdî bikirin û li ser refên kitêbxana xwe deynin. Tirs nîne ku, ji ber kitêb û kasetê kurdî polîsên tirk bên û wan bavêjin hepsê. Li Tirkîyê ew tirs her heye, bes li Emrîka nîne. Bes min dît, bo wan kesên ku hatin Emrîkayê, daxwazîya wan a yekemîn hînkirina zimanê îngilîzî bû. Hînbûna nivîsandin û xwendina zimanê kurdî bo wan ne girîng bû. Ji ber hemû van tiştan, min wisa zanî ku êdî paşeroja vî zimanê gelek tarî ye.

Dîsa ji ber ku ez cihû me, bes ez ne sîhyonî me û xwe wisa nadim nasandin, lê ji ber ku bo bavê min cihûtî û Îsraîlî gelek girîng e, wî ez ji zaroktîyê ve şandime xwendengeheke cihûyan. Yanî ez baş dizanim, zimanê îbrî, ku zimanekî mirî bû, çawa hate vejandin û ez vê pêvajoyê ji nû va dijîm bo kurdî. Yanî ez baş dizanim wan çi kir bo vejandina wî zimanî. Bo kurdî, herçend ku hêj nemirî be, dîsan tecrubeyeke gelek baş bû bo min, ku ez digel zimanê îbrî mezin bûm, niha ez di wan fikran da me, çawa em ê bikaribin feyde ji wan tiştan bikin bo vejandin û

pêşvebirina zimanê kurdî. Zimanê kurdî bikin zimanekî nûjen.

A.Gernas: *Nexwe tê wê manê ku, niha bawerîya te ya destpêkê guhuriye. Ango te di destpêkê da digot, ev ziman, zimanekî mirî ye. Te bi hezkirina ji çand û folklorê gelêrî dest pê kir û hînî zimanê kurdî bûyî. Piştî te ewqas kurd nas kirin, pêwendî ligel wan danî û xerîkî vê pirsê bûyî û gihayî qonaxa îroyîn. Di qonaxa îroyîn da dîtina te ya li ser zimanê kurdî çi ye?*

M.Çayed: Îro, kurdên Emrîka, ku piranîya wan kurdên Îraqê ne û rast e ew zimanê xwe bi kar tînin, lê ew ji edebîyata kurdî ya nûjen gelek dûr in. Tiştên ku bi pîtên latînî hatine çap kirin naxwînin. Ew nizanin ku, hebûna wan jî heye, wek Çîra, wek Kurmancî, wek Nûdem û gelekên din. Tu elaqet, tu pêwendî û têkilî di navbera wan û van tiştan da tune. Pêwendîyên min ên pêşîn ên herî bi qewet ligel kurdên Tirkîyê bû. Kurdên Iraqê çar mîlyon û nîv in lê kurdê Tirkîyê ji pazdeh heta bîst mîlyonî ne. Yanî bi kêmî ve sê qat ji kurdên Iraqê zêdetir in, eger ne çar qat yan pênc qatê wan bin. Vêca kurdên Iraqê çi dikin bila bikin, paşeroja vî zimanî, bi dîtina min, di destê kurdên Tirkîyê da ye. Niha, gava ku ez tîm cîhekî mîna Swêdê û we dibînim, ku bi rastî kom hene, xelkê Tirkîyê, ku her roj bi zimanê kurdî radibin û rûdinên, gelek gelek kêfa min pê tê, bes dîsan ez ji xwe dipirsim, gelo ev xewnek e?.. Gelo ew nûnerên tevgerê mezînan in yan ew kêmanî ne, ji ber ku kurdên li Elmanya dijîn ji kurdên Swêd gelek zêdetir in. Bi qasî ku ez zanîm, kes ji kurdên Tirkîyê (mebest kurdên Tirkîyê li Elmanyayê ne) beşdarî civînên Kurmancî nebûye. Vêca ev tirs li min her heye, ku kurd xwe bi xwe wê zimanê xwe bikujin, wê di bin bandora Tirkîyê û tirkan da bimînin û xwedî li zarokên xwe dernakevin.

A.Gernas: *Piştî ku tu fêrî zimanê kurdî bûyî, taybetmendîyên etîmolojîkî yê ku yekser bala te kişandin çi bûn?*

M. Çayed : Li zanîngeha Kaliforniya li Berkeley, ku min tê da xwend, profesorekî, mamosteyekî min bi navê Martin Schwartz hebû, ku bi xwe şarezayê dîroka zimanên Îranî ye, ew bi xwe kurdî nizane lê gava ku ez peyveke kurdî pêşkêşî wî dikim, ew dikare bêje min, ev peyv bi farisîya kevn wisa bû, bi Avestayî wisa bû, bi Sankrîtî wisa bû û koka wê ya Indo-Ewrûpî wisa ye. Gelek salan em bi hevra xebitîn, çunkî min dixwest dîroka zimanê kurdî baş bizanîm, min dixwest ku esas li nik min çê bibe û di ferhenga min da jî, çend ji min bêt eêz van peyvînan etîmolojîk vedigirim. Wek mînak, peyva "pîrsîn", bi farisî porsîden, bi Sankrîtî prcchatî, bi elmanî fragen, bi îtalyanî prego, bi îngilîzî to imprecate hemû eynî kok in.

A.Gernas: *Agahîyên me ew in ku, tu sê zaravayên kurdî (kurmancî, soranî, zazakî) zanî. Bêguman ev, derfeteke mezînan peyda dike da ku tu derbarê zimanê kurdî û taybetmendîyên wî da bibî pêzanekî pêşketî. Hin xêrnexwaz pirhejmariya*

zaravayên kurdî dikşînin alîyeke negatîv û regekî serbixwe didin wan. Di eslê xwe da, zimanê kurdî înkâr dikin, lê ji bo ku dijberîyê têxin navbera zaravayan û bi vî awayî di navbera kurdan da dijminahîyekê çêkin, xwe dispêrin dîtînen weha.

Pirsa me ev e, li gor te têkilîyên zimanî yên navbera zaravayên kurdî yên ku tu zanî, dîmeneke çawa radixe pêş çavan û li gor te pirhejmarîya zaravayan kare bibe qelsîyek bo zimanê kurdî?

M. Çayed: Ev pirsîyareke gelek baş û di cîh da ye. Dikarim bêjim ku, min li ser vê pirsê gelek dûr û dirêj fikir kiriye. Bi dîtina min, hemû li ser danîştina helwesta mirovî radiweste. Mirov dikare bêje, belê zazakî û goranî kurdî nînin. Bi dîtina min, bi alîyekî zimanzanî kurmancî û soranî şaxekî din e, zazakî yan dimilkî yan jî kirdkî û hewramî û goranî jî şaxekî din in, lê hemû jî ji eynî darê ne, dara zimanê Arî, zimanên Îranî ku beşek ji zimanên Îndo-Ewrûpayî ye û hemû jî zimanên Kurdistanê ne, zimanê kurdan in. Mirov nikare înkâr bike ku, zimanê nivîskî, zimanê mîran ê Mîrîtîya Erdalan zimanê Hewramî bû, goranî bû û tesîra goranî li ser soranî gelek mezin e. Yanî mirov nikare goranî ji soranî cuda bike, çunke wek mînak li Sine ku dilê Erdalan e, gelek peyv tên bi kar anîn ku him bi hewramî him jî bi soranî îro jî bi kar tînin. Zimanên Kurdistanê yên din jî hene, wek zimanê cihûyên Kurdistanê ku Aramî ye û zimanê mesîhîyên Kurdistanê ku ew jî Aramî ye, wek keldanî, asûrî, yaqûbî. Ew ziman jî zimanên Samî ne, yanî zimanên Îndo-Ewrûpayî nînin. Vêca divê ez ji destpêkê zelal bikim ku, hemû zimanên behskirî, zimanên Kurdistanî ne.

Ziman cuda ye û nasname cuda ye, çunke ev hemû kurdên ku bi zazakî û bi goranî dipeyivin wisa dizanin ku ew Kurd in. Eger ew bêjin, "ez Kurd im", ez kî me ku bêjime wan "na tu ne kurd î"

A. Gernas: Yanî tu vîya wek pîvaneke bingehîn destnîşan dikî?

M. Çayed: Belê, ev pîvaneke bingehîn e li seranserê cîhanê. Ez dikarim mînakek ji cîhekî din jî bidim. Di navbera Bulgaristanê û Sirbîstanê da li ser hudud cîh hene ku, eger tu ji zimanzanan bipirsî, ewê bêjne te, ev ne bulgarî ye ev sirbî ye. Bes eger tu ji xelkê bi xwe bipirsî, ewê bêjne te, ez ne Sirb im ez Bulgar im. Yanî ew çawa xwe dibînin? Nasandina wan a şexsî gelek gelek girîng e. Mirov nikare vî tiştî înkâr bike. Gava mirov bi mebestên siyasî bixwaze du xelk yan du grûp ji hev cuda bike, ewê tişteki wisa înkâr bikin. Niha em ji alîyê zanyarî ve tesbît bikin zimanê kurdî çi ye û çima zimanê zazakî ji zimanê kurdî cuda ye.

Kurmancî û soranî hene, ne wisa? Niha çend mirov here bakûra rojava, wek mînak ji Sulêmanî, eger mirov here berbi bakûr û berbi rojava, hêdî hêdî ziman wê bibe kurmancî. Mirov wê bigihê Hewlêr, ku hêjta soranî ye lê gelek nêzîktir

e bi kurmancî. Piştî hingê meriv derbasî Behdînan dibe. Behdînan "Kurmancistan" e lê Aqreyê gelek nêzî Hewlêr e, lewra gelek peyvên wisa hene li Aqreyê ezê bêjme te ev ne kurmancî ye, ev soranî ye. Lê ew bêjin, na ev kurmancî ye ne soranî ye, emê çi bêjin?.. Û hêdî hêdî mirov berdewam be û bigihê cîhekî wek Cîzîra Botan û piştî hingê Dîyarbekir û piştî hingê Erzincan. Herwisa çend mirov here berbi başûra rojhilat taybetmendîyên soranî wê xurtir bibin. Bi vî şiklî, kurmancî hêdî hêdî dibe soranî û soranî hêdî hêdî dibe kurmancî.

A. Gernas: *Yanî bêyî ku meriv ji nişkava têderxe û xetêke taybetî bikêşîne navbera herdu zaravayên kurdî bi nermayî têne guhartin?*

M. Çayed: Wek Elmanî û Holandî ne, yanî sînorek tune. Zarava hene û zarava wek devok devok devok berdewam dike heta ku derbasî zaravayekî din dibe.

A. Gernas: *Dîsa hin lêkolînan û nivîskarên biyanî dibên ku, "Sedemê aktuelbûna pîrsa Kurd û Kurdistanê, ne ziman û çanda kurdî ya jîndar e. Afirandêrê vê pîrsê, çalakîyên siyasî û xebatên rêxistinî ne. Di eslê xwe da, pîraniya kurdan bi zimanê tirkî diaxîfîn û wek kultur jî di navbera wan û tirkan da cudahîyên mezin nemane. Lewma jî, pîrsa kurda ne pîrsa dewlet, serxwebûn û hwd e. Çareserîya vê pîrsê bi demokrasîyê va girêdayî ye..."*

Di nav me kurda da jî, berevajîyê vê dîtinê dertê pêş, ango em dibên, yê ku pîrsa kurda li pîya hîştîye û bi şeweyek zindî gihandiye serdema îroyîn, ziman û çanda kurdî ye. Îca pîrsa me ji te, gelo tu vê pîrsê çawa şirovedikî?

M. Çayed: Pîrsiyara min ya pêşîn bo wan lêkolînanên biyanî ev e, gelo hûn bi kurdan ra dipeyivin gava ku hûn tiştên wisa dibêjin yan digel karbidestên resmî yên hukumeta Tirkîyê dikevin têkilîyê? Bes ya girîng ev e ku, kêman caran lêkolînanên biyanî ligel kurdan bi xwe dipeyivin. Ne bes bi kurdan ra, bi giştî rojnamevanên biyanî divê bizanibin ku gava mirov behsa pêwendîyên navbera kêmanîyekê û pîranîyekê bike, wek li Îsraîlê Cihû pîranî ne û Ereba kêmanî ne; yan li Mexrib Ereba pîranî ne û Berbera kêmanî ne, divê mirov ji herdu alîya bipirse. Mirov nikare digel Cihûyên Îsraîlê derheqa Ereba Îsraîlê de bipeyive bêyî ku digel Ereba bi xwe bişewire û piştî hingê nivîsarekê binivîse, çunke wê Cihû bibêjin "em nizanin çima Ereba bi hev ra gilî û gazinde dikin. Xizmeta wan a eskerî tune, di vîlla û xanîyên mezin da dijîn û ew bacê jî nadin. Ew çima şikayet dikin? Jîyana wan gelek hêsan e". Lê Ereba çi dibêjin? Ereba dibêjin, "ji ber ku em nikarin xizmeta eskerî bikin, em ji karên esasî bêpar in. Em dikarin yan bibine mamoste, yan bibine doktor û her hinde". Gava tu li Îsraîlê ji zarokekî Cihû bipirsî, "gava tu mezin bibî dixwazî bibî çi?" Ew ê bêje te, "ez dixwazim bibim balafirvan, ez dixwazim bibim serokê dewletê" û her tiştî. Gava tu ji zarokekî Ereba bipirsî, ew çi dibêje bila bibêje, ji bilî mamostetîyê, nûjdarîyê tiştêkî nayê pêş. Vêca mirov bê çawa vê tiştê bizanibe eger ew tenê yekalî bipeyivin. Ji ber

ku gelek kêmbiyanî pûte (danûstendin) bi kurdan re kiriye. Niha piçek zêde bûye lê ez her şik dibim ku rojnamevana bi karbidestên resmî yê dewletê re behsa vê meselê kiribe û ev yek têra wan kiribe.

A.Gernas: *Yek ji wan jî Martîn Van Bruinessen e ku vê dîtînê diparêze û dibêje, "bi raya min li Tirkîyê piranîya kurdan bi tirkî diaxîfîn û pirsra kurdan ne wek ku Kurd dibêjin aktuel e. Yê ku pirsra kurda li dinyayê û li Tirkîyê tîne rojevê, rêxistinên Kurd in, ango sîyaset e." Lê em Kurd berevajîyê vê dîtînê diparêzin û pê bawer in ku Kurdan xwe bi zimanê xwe, çanda xwe û xeysiyetên xwe yê cuda parastîye. Sîyaset ji vê dozê ra xizmetê dike. Rayate çi ye li ser vê yekê?*

M. Çayed: Bi dîtina min wî wisa gotiye, ji ber ku daxwaza wî ew e, Kurdên ku li malê jî li kolanê jî bi tirkî dipeyivin dev jê berdin û dest pê bikin bi kurdî dipeyivin, zimanê kurdî bi kar bînin. Ez hêvîdar im ku ligel we reaksiyonek peyda bibe û Martîn Van Bruinessen jî di vê manê da gotibe..

A.Gernas: *Di encamê da em karin bibêjin ku, tiştê ku kurd li pîya hîştine ne sîyaseta rojane ye lê çand, ziman û heyîyên kurdî ne? Li gor raya me piranîya kurdan bi tirkî napeyivin û bi çanda xwe va girêdayî ne. Vêca li gor te, ji çand û ziman û sîyasetê tesîra kîjan girantir e?*

M. Çayed: Bi dîtina min, divê ku mirov ji kurdan bi xwe pirs bike. Eger lêkolînavanên biyanî herin ligel wan dipeyivin û piştî hingê nivîsarekê binivîsin!.. Ligel Cihûyên Kurdistanê, ku di sala 1948 - 50 de derketin Îsraîlê, ev hest, ev hêvî (hest û hêvîya kurdîti) heye. Bi qasî ku ez kurda ji nêzîk ve nas dikim, çi li Tirkîyê û çi jî li Îsraîlê, hêvîya çêbûna Kurdistanê li nik hemûya heye. Yanî çêdibe ku herkes bi awayekî şirove bike û bêje ev xewna hanê çi ye? Çêdibe ku Kurdên Îraqê û kurdên Tirkîyê bi eynî awayî nayên zimên, lê dîsa jî ez dibêjim ev xewna hanê kêmbiyanî zêde li nik hemû kurdan heye.

A.Gernas: *Yanî tu dibêjî, ziman û çand jî tê da, ev xewn e ku kurda li pîya dihêle?*

M. Çayed: Belê ev xewn e.

A.Gernas: *Di hebûn û nebûna milletê Kurd da zimanê kurdî girîng e yan na? Yanî dema zimanê me têk çû wê doza Kurdistanê bimîne?*

M. Çayed: Eger ziman ji holê rabe, xetereke gelek mezin heye ku tiştêk nemîne kurda bi hev ve girê bide. Lê li eynî wextê pirsîyareke din jî heye, gelo ew ê hukumeta tirk an komara tirk dîsan hevvelatîyên başûrê rojhilata Tirkîyê tepeser bikin an na? Eger zimanekî wan tirkî be, wê dîsan wan jî gundên xwe birevînin an na? Ez bersiva vê pirsîyarê nizanim. Eger bi awayekî din bibêjim, eger zimanê kurdî ji alî dewleta tirk ve bête rakirin, wê helwesta wan li hemberî yê ku xwe wek kurd didin nasandin çi be? Wê bête guhartin an wê eynî bimîne?

A.Gernas: *Eger ziman rabe jî, heta hestên neteweyî yê kurdîti hebin ev pirsra*

han namire. Tu çi dibêjî?

M. Çayed: Çê dibe. Bila ev pirsîyarek be. Bersiveke min tune.

A. Gernas: Tu wek mirovekî pirzimanzan û her weha wek kurdolog, paşeroja zimanê kurdî çawa dibînî? Û bi raya te zimanê kurdî yê standard, raçavkirina zaravayên wî jî tê da, li ser kîjan bingehê û bi kîjan pîvanan kare çê bibe?

M. Çayed: Bersiva vê pirsê gelek sade ye. Li ser we radiweste. Yanî eger hûn vî zimanî biparêzin, wê bimîne, na eger hûn îhmal bikin (bavêjin piştguhên xwe) wê ji holê rabe.

A. Gernas: Ji peyva "li ser we radiweste" mebesta te ronakbîr û xwendevan in?

M. Çayed: Bi giştî li ser hemû kurdan. Ev gotina ku ez ê niha bêjim, bûye duruşma min. Zimanekî ku zarok pê nepeyivin bê paşeroj e. Yanî divê ku zarok bêne perwerde kirin û bizanibin ku zimanê wan zimanê kurdî ye. Bila zimanê wan ê zikmakî yan maderî heta ku dest bi dibistanê dikin, li Tirkîyê, li Îraqê, li Swêdê, li Almanyayê û li kê derê dibe bile bibe, bila kurdî be. Ev li ser we radiweste, ne li ser min.

Niha jî em dest bavêjin zimanê standard. Ev, bi tişteki gelek girîng va girêdayî ye. Ew jî nasnameya nîştimanî ye. Divê ku herkes li dijî dagirkeran dev ji parastina zimanê xwe yê lokal berde. Bo zimanekî standard, wek mînak, welatek heye ku bi îngilîzî dibêjin Austria, bi Almanî dibêjin "Österreich". Bi kurdîya reben sê peyv hene: Nemsa heye, Avûstûrya heye û Otrîş heye. Em ê li Dengê Emrîka çi bikin? Herkes nikare li gor dilê xwe carekê bêje Nemsa, carekê bêje Otrîş û carekê Avûstûrya bi kar bîne. Divê em peyvekê hilbijêrin û dev ji yên din berdin.

Vêca divê mirov nebêje, "li gundê me em her wisa dibêjin. Bapîrê min, bapîrê bapîrê min jî her Otrîş digot.." Ez bawer nakim, ji ber ku peyva Otrîş peyveke fransîzî ye û nû ye. Ji bo zimanekî standard divê em dev ji peyvên xwe yên lokal berdin, ne ku em ê wan peyvan ji holê rakin. Bo zimanekî standard divê em peyvên standard hilbijêrin. Hûn jî dizanin ku di kurdî da çend navên "yarasa" ya tirkî hene. Şevrevîng heye, şevşevok heye, perçemok, balçemk, çemçemok heye. Yan jî bo "örümcek" a tirkî... Ev mînakek e. Em ê kîjan bi kar bînin? Em nikarin hemûyan bi kar bînin. Em nikarin bêjin, bila dilê vî gundîyê ji me nemîne lewma jî em ê îro "şevrevîng" bi kar bînin, sibehê em ê "çemçemok" bi kar bînin... Bi vî awayî nabe. Divê em çawa bikin? Divê ku em lê bikolin û bibînin ka peyva ji hemûya giştîtir çi ye. Çawa giştîtir? Wek mînak, bi soranî çi dibêjin!.. Peyvên wisa hene ku him li nav soran him li Bahdînan bi kar tînin lê li bakûrê Kurdistanê tişteki din bi kar tînin. Yan li Hekarî û Bahdînan filan peyv heye, yan jî li Hekarî û li Serhedê peyvek din jî bi kar tê. Divê ku em, peyva ji hemûyan

giştîtir, ji hemûyan belavtir bi kar bînin, bêguman gava mumkun be. Gava ku mumkun be, ev gelek girîng e. Wek mînak, bo hejmarên yazdeh, dozdeh, sêzdeh, çardeh ... li hin mintiqên Kurdistanê mesela li Dersîmê û Ruhayê dibêjin dehûyek, dehûdudo, dehûsisê, dehûçar... Ev şêwe gelek herêmî ye yan jî lokal e. Ev li Îraqê, Îranê, Sûrîyê û Ermenîstanê qet nayê bi kar anîn. Yanî "dehûyek û dehûdudo..." bi tenê li herêmeke diyarkirî tê bi kar anîn.

Bo lêkolînên zimanzanî gelek balkêş e. Ez nabêjim bila ji holê rabin, bes standardkirina zimên bi vî awayî nabe, ji ber ku bo çapkirin jî, bo radyo û televîzyonê jî bi kêr nayê. Em nikarin bi kar bînin û divê em bi kar neynin jî. Di eynî wextê da em îbretê ji standardkirina zimanê tirkî jî werbigrin. Çünke zimanê Stenbolê bûye standard û eger herkes bi awayekî bipeyive lê didin û dibêjin, "tu çi kesî, ev çi ziman e tu bi kar tînî." Yanî gava ku bi zaravayên xwe dipeyivin, ew hestên xirab didin mirov. Ev nimûneyeke gelek xirab e. Divê her Kurd bi serfirazî bêje, ez xelkê Dersîmê me; ez xelkê Botan im. Li malê em wisa bipeyivin, bes bo zimanê standard em wisa nepeyivin. Bo hemû zimanên dinyayê diglosya heye. Bi îngilîzî jî heye. Gelek peyvên wisa hene ku kolankî ne, yanî li kolanan bi kar tînin bes bo nivîsînê bi kêr nayên.

A. Gernas: *Baş e, tu dibêjî bi kar neynin. Eger em rewşa kurda ya îroyînê bidin ber çav, ew ê metod çi be?*

M. Çayed: Xwendîgeh. Wê hemû zarokên Kurd li xwendîgehên kurdî bixwînin, lê berî ku em xwendîgehê vekin divê em hemû mamosteyan perwerde bikin da ku hemû eynî fikra perwerdekirinê bistînin. Ne ku herkes li gorî dilê xwe mamostetîyê bike. Divê xwendîgeh, radyo, televîzyon û çapemenî yekgirtî bin. Ez ê mînakekê bidime we ku duhî li vir derbas bû (qesd ji duhî, civîna Kurmancî ya li Biskop-Arnö ye). Me dixwest behsa termên qanûnî bikin. Min gote hevalan, berî salekê li Kurdistanê Îraqê kitêbek derketiye. Lîsteya termên resmî ku ew bi kar tînin û ji alî hukûmetê ve hatiye pejirandin, divê haya me ji vê kitêbê hebe. Dibe ku em biryarên wan bi kar bînin. Eger ew pirtûk nekeve destê me, gelek heyf e ku em ji nû ve bikevin wê girûnekê (tekerlekê). Ev jî ne hewce ye ku her Kurd li gora gelîyê xwe yê lê dijî rabe û rûnê îro. Îro televîzyon heye, radyo heye, rojname heye, yanî çapemenîyê gelek berfireh heye. Berî ku em bi filan projeyê rabin, divê ku haya me ji hevdu hebe. Îro gelek tişt hatine çapkirin. Berî ku mirov dest bavêje vî karî, divê mirov lê bikole, bibîne, seh bike ka tiştê hatiye çap kirin. Çi nivîsarek be di kovarekê da, çi kitêbek be. Belkî di televîzyona Kurdistanê Îraqê da bernameyek hatibe belav kirin. Divê mirov lê bikole û piştî hingê dest bavêje karê xwe.

A. Gernas: *Baş e, ew ê rola zaravayan çawa be?*

M. Çayed: Bersiva min hazir e. Divê wek şert zarokên Kurd bi herdû

zaravayên serekî bêne perwerde kirin. Yanî kurdên Tirkîyê dikarin înkâr bikin ku şaîrekî mezin î wek Hacî Qadirê Koyî, yan Pîremerd yan jî Nalî heye. Dikarin bêjin ku van şaîran ne ji mîrata kurdên Tirkîyê ne? Her wisa kurdên Sulêmanî û Mukrîyan jî bêjin, Ahmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Melayê Cizîrî û Cîgerxwîn nas nekin û ji bo wan ew bê mane bin. Vêca bo min, eger hemû zarokên Kurd ji zaroktiya xwe ve him bi kurmancî him bi soranî bêne perwerde kirin, ew ê gelek bi feyde be ku nîşeke temam û xwedî zanîneke berfireh di demeke dûr û dirêj da derkeve holê. Piştî hingê eger zimanek yekbûyî peyda bûbe baş e, bes eger peyda nebûbe em nikarin bi zorî tiştêkî wisa ferz bikin. Nabe!.

A. Gernas: *Te ji bo zaravayên soranî û kurmancî dîtina xwe pêşkêş kir. Gelo ew ê pîrsa kurmancî û dimilkî çawa be? Ji ber ku herdu zarava bi hev ra dijîn û di nav hev da ne.*

M. Çayed: Ew bi xwe kêmanî ne (qesd dimilkîaxêv in). Divê ku Kurd bi zimanê xwe bixwînin çî zaza bin, çî goranî bin û çî jî keldanî bin. Eger kêmanîyeke Tirk, Ermenî û yê din jî hebin di Kurdistanê da, bila ew jî bi zimanê xwe bixwînin. Ev maf bila her hebe. Digel zimanên Kurdistanê bila zimanê Îngilîzî, Fransîzî û zimanên cîran wek Tirkî û Farisî û Erebi jî hebin.

Bi dîtina min divê em tu caran di navbera kurmancî û soranî da yekalî nemînin û tu caran yek ji wan hilbijêrin yan yê din bikujin. Xelkê Sulêmanî gelek caran dibêjin, bila herkes bi soranî bipeyive. Bila tiştêkî wisa qet û qet peyda nebe, çunkî wê gavê kurdên soranîaxêv digel Tirkan wê rabin û bi hevra zaravayê kurmancî jî holê rakin. Tiştêkî weha gelek xeter e.

A. Gernas: *Dîtineke weha jî heye ku hin kes dibêjin, "li Kurdistana Bakûr ji sedî 80-90ên xelkê, yanî piranî bi zaravayê kurmancî dipeyivin, ji ber vê yekê jî bila zaravayê kurmancî wek zimanê standard bête pejirandin û zaravayên din jî digel zimanê standard hebûna xwe bidomînin." Îca pîrsa me ev e, gelo argumenta piranîyê dikare bibe pîvaneke bingehîn ji bo ku meriv zaravayekê hilbijêre?*

M. Çayed: Bi dîtina min, eger em dixwazin di pêvajoya heftê salên borî da hemû îbretên tal û tirş ên ku Kurd jê derbas bûne ji bîr bikin, kerem kin. Bes bo çî, çîma, çî feyde tê da heye? Wek mînak Hoch deutsch heye, bi zimanê Erebi "fusha" heye. Bila herkes zimanekî nivîskî yê standard hebe. Bo rewşa zaravayên Elmanî dibe, digel rastîya wan rêk dikeve. Bo zimanê Erebi lugat el quran, yanî zimanê quranê bo rewşa zimanê Erebi baş e, lê Kurdî ne Erebi ye ne jî Elmanî ye. Divê ku em li gora rastîya zimanê Kurdî çareyekê peyda bikin, ne li gora rastîya zimanên din. Çünke ya ku bi kurdî rast be, çêdibe ku bi zimanên din ne rast be.

Gelek kes dixwazin tiştêkî nerast, yanî ji realîstî yan ji waqê' bînîyê gelek dûr

e li ser mirovan ferz bikin. Me dîtiye ku zimanê tirkî çawa, heta kîjan dereceyê ev yek bi kar anîye. Belê, niha herkes "kuzey, güney, doğu û batı" bi kar tîne û "cenup, şimal, şark û xarp bi kar nayne. Bes gelek peyvên wisa hene ku rûneniştine û cîhê xwe negirtiye. Divê ku em realîst bin, waqebîn bin ji destpêkê ve û divê em dev ji tiştên bê paşeroj berdin.

A. Gernas: *Yanî tu dibêjî bila Kurd nekevin tatêla ka ew ê kurmancî yan jî soranî bibe zimanê standard û rastîya hemû zaravayan qebûl bike?*

M. Çayed: Belê, bila rastîya hemû zaravayan qebûl bike û qedr û rûmet jî bo hemuyan bigre. Gelek gelek girîng e. Ne ku her kesek rabe û bêje zaravayê min ji yê we çêtir e. Çünke him kurmancî û him soranî, him goranî û zazakî zimanê kurdan e. Bila bêjin, belê kurmancî zimanê bav û bapîrê min e lê zimanê ku Hacî Qadirê Koyî, ku ew jî soranî ye, ew jî yê me ye. Bila ev hestê hanê li nav zarokên kurd da belav bibe û bi vê hestê bêne perwerde kirin. Bes ne ku zaravayekî çêkirî, yekbûyî bête ferz kirin. Ez dikarim bêjim ku ew ê tiştêkî wisa bê encam bimîne.

A. Gernas: *Tu niha di xebata bêjesazîyê ya ku Înstîtuya Kurd a Parîsê li dara xistiye û di rojnameya Kurmancî da pêşkêş dike da cîh digrî û beşdarî civîna sêzdemîn bûyî. Gelo bi giştî ev kesên ku di vê xebatê da cîh digrin, karin bi ilmeke zimanî vî karî bi rêve bibin û bibin bersîva daxwazîyan? Pê va girêdayî, tu bi xwe vê xebatê çawa şirovedikî û li benda encameke çawa yî?*

M. Çayed: Ev xebat serbilindîyek e bo hemû kurdan. Him li vir him li radyoya me ya Emrîka gelek kême name, gelek kême reaksiyon digihête me, bi taybetî ji kurdên Tirkîyê. Ji "bîst mîlyonên bêdeng" bêjim. Ez nizanim ku bersîva pêwîstiyên wan dide yan na, ji ber ku ez

nizanim pêwîstiyên wan çî ne. Ew qet pêwîstiyên xwe nagihînine me. Bila haya me ji kêmasîyên wan hebe. Bila binivîsin, bila faks bişînin, bila telefonî me bikin. Yanî niha karê me heye. Em dizanin ku termên huqûqî gelek pêdivîne, termên matematîk pêdivîne lê encamên ku em li vir digihîninê em nizanin çawa, kengê yan jî ji alîyê kê ve wê bêne bi cîh anîn.

A. Gernas: *Axir niha dezgeheke wek Înstîtuya Kurd li Parîsê bi vî karî radibe?..*

M. Çayed: Qesda min hukumeteke kurdî ye. Gelo wê hukumeteke kurdî van encaman bigire dest û bi cîh bîne yan ji ber ku haya wê jê çênebûye ew ê bêje ez qebûl nakim!.. Yanî ez dibêjim ev xewna me hemuyan e. Em kar dikin, bes em nizanin ka Kurd bi giştî dê encamên xebatê me bigrin dest û bipejirînin yan ev karê me wê tenê bo me bimîne?..

A. Gernas: *Qesda min zêde derheqa bêjesazîyê da bû. Wek ku tu jî zanî, ji bo bêjesazîyê etîmolog lazim in, zimanzan lazim in û ev pirs pirseke akademîkî ye. Lewma meraq dikim gelo ev grûba ku çêbûye û vî karî dimeşîne, ew kesên ku*

di vî karî da beşdar dibin bersîva pêdivîyan didin an na?

M. Çayed: Kêmasîyên me hene, wek mînak, xwezî şarezayekî botanîk hebûya, xwezî şarezayê nexweşîyên heywanan hebûya û hwd. Ne şert e ku Kurd be jî. Gava ku em navê zanyarî, navê latînî bo filan nexweşîyê, filan gîhayê bigerîn em hevîdar in ku em ê navê rast bibînin. Lê eger botanîknas hebe ku bikaribe bêje ev ne rast e, navê wî yê latînî wisa ye, ew xebata me dê zûtir cîhê xwe bigre. Carcaran em piştrast nînin ku me navê latînî, navê zanyarîya resmî rast peyda kiriye bo filan gîhayê yan bo filan nexweşîyê. Yanî ev e kêmasîya me. Bi giştî grûp serketî ye û em baş bi hevra kar jî dikin.

A. Gernas: *Gelo tu çend zimanan dizanî?*

M. Çayed: Me carekê digel dostekî xwe jimartin, em gihîştine 29 zimanan. Niha jî bûye 30.

A. Gernas: *Ferhenga ku tu li serê kar dikî, wê kengê temam bibe?*

M. Çayed: Sala 1986 min dest pê kir ku ferhengeke bi xwe çê bikim. Di destpêkê da gava ez hînî zimanê Kurdî dibûm, kitêbên baş tunebûn. Bi mebesta ku bo min bi xwe aleteke baş be da ku ez hînî kurdî bibim, min çêkir. Piştî hingê min dît, heta wê gavê tiştêkî wisa bi Îngilîzî tunebû, min got çêdibe ku tiştêkî wisa bête çêkirin, ez rojekê ji roj, an karibim çap bikim. Niha ev xebat, li ser komputerê ji 650 rûpelan derbas bûye û hêj xilas nebûye. Her cara ku bi kurdekî ra dipeyivim, peyvên nû dibihîzim. Dema ku peyvên nû dibihîzim, divê ez li ser wana yeko yeko lêkolînê bikim û piştî hingê têxime nav ferhenga xwe. Ji ber ku ev bîstûpênc sal e ez hînî zimanên biyanî dibim. Gelek ferheng hebûn ku bo filan zimanî xirab bûn, kêmasîyên wan gelek bûn. Ev car ez bi zimanê kurdî hemû kêmasîyên ku min di ferhengên din da dîtine, dixwazim wan dagirim, dixwazim wan telafî bikim. Vêca di ferhenga min da maneya filan peyvê bi Îngilîzî didim û çend ji min bêt hevokeke nimûneyî jî didim. Wek mînak peyva "ardû" çî ye dinivîsim, yan ji jêderkekî çapkirî yan jî ji kesekî hevokekê digrim. Piştî jî dîroka wê peyvê, yanî etimolojîya wê peyvê datînim. Û eger bi zimanên Îranî yê din beremberê wê hebin, çî soranî be, çî zazakî, çî hewramî û piştî hingê farisî, pehlewî, avestayî û eger karibim peyda bikim sanskrîtî jî têxime nav. Yanî wek ansîklopedîyeke biçûk. Bes kengê wê bête çapkirin?.. Çapxaneya Zanîngeha Yale li wîlayeta Connecticut li Emrîka ji mêj ve gote min ku ew dixwazî çap bikin. Bes heta niha min peymanek îmza nekiriye. Ez dibêjim ku piştî min peyman îmze kir, ez ê muhleta sê salan bidime xwe ku ferhengê bo çapkirinê amade bikim. Bes dîsa jî ev çapa yekem e. Ez nabêjim ku ew ê hemû peyvên kurdî tê da cîh bigrin.

A. Gernas: *Em bo vê hevpeyvînê spasîya te dikin û gotin an mesaja te ya dawîn digrin.*

M. Çayed: Ez ê eynî mesajê, ku min bo Berbangê gotibû, bêjim. Bila "bîst mîlyon kurdên bêdeng" dengê xwe bigihînine min. Ez jî spas dikim û serketinê dixwazim.

Şiûra tarîxî û Lozan

Ahmet Ferîd

Mirovên kurd hergav gazinên xwe li hev dikin û dibêjin xwedêgiravî bi awakî giştî şîûra netewî li nik kurdan zeîfe. Bi raya min ku îro gazinên wisa belawela tîr kirin, ne bêesas in û rastîyeke wan heye. Rast e, şîûra netewî bi awakî giştî li nik kurdên vê dema em têdene zeîf e û bi taybetî li nik siyasetvan û ronakbîrên kurd ên bakurê Kurdistanê ji hemû mirovî kêmtir e. Sedema herî esasî a ku vê qenehetê bi min re çêdike ev e: Pîraniya siyasetvan û zanayên kurdên bakurê Kurdistanê mirov in ku li mektebên tirkî xwendine û li bajarên Tirkiyê jiyane. Ev in ên ku zêde nasiya wan bi kultura tirkî çêbûne û herwiha di bin bandora siyaseta asîmîlasyonê de mane.

Bêşik siyaseta asîmîlasyonê encamên xwe ên neyînî pirtirîn tesîrê li ser mirovên wisa dihêle. Ji ber ku ev mirovên ha di emrekî piçûk de (heftsalî) roj bi roj ji jiyana xwe a kurdî dûr ketine. Bi taybetî li bajarên di prosesa xwendina ku armanca wê asîmîlekirina zarokên kurdan, gelek mirov ji kultura kurdî dûr dikevin, ji çîrok û metelokên kurdî mahrûm dimînin. Hafîza van mirovan ji dêvla serpêhatî, qehremanî û bûyerên tarîxî ên kurdan, bi qehremanîyên tirkî selçûkî, osmanî û kemalîstan tîr dagirtin. Ji dêvla şîr, metelok û stranên kurdî, şerî, stran û merşên tirkî bi wan tîr ezber kirin. Encamên proseseke wisa gelek tesîrên neyînî li ser jiyana kulturî dihêle, mirovan ji civaka xwe xerîb dixê, hafîze û şîûra tarîxî bi mirovan re zeîf dike. Bêşik proseseke wisa tesîrên xwe ên neyînî li ser şîûra netewî jî dihêle. Mirovên ku di vê prosese de jiyane, hesabê ku ew çiqasî di bin tesîra wê de manin nekin, ew ê hew xwe bixapînin, ew ê ne tenê bûyerên tarîxî û kulturî ên dema kevin nizanibin, herwiha ên dema herî nezîk, heta ên dema ku ew bi xwe tîr de jiyane jî wê bi şêweyeke rastî nizanibin. Herwiha ji bîr bikin, an jî wê çewt û berevajî bizanibin.

Encamên siyaseta asîmîlasyonê hafîza tarîxî zeîf dike û tesîrên xwe ên neyînî li ser tevgera netewî dihêle. Bêyî ku mirov li ser vê mijarê raweste, ew ê zehmet be mirov tîr bigihê, gelo ji bo çî îro li bakurê Kurdistanê tevgera netewî gîhaye merhela herî nizm? Gelo ji bo çî gelek ji kadroyên siyasî ên bi programên serxwebûna Kurdistanê dest bi xebatê kirin, îro dev ji îdealên xwe berdane? Hin ji wan “Bawer dikin” ku ew realîst in û li gor wan “Rastî ji bo kurdan ew e ku

kurd doza mafên xwe ên netewî daxin dereca herî nizim. “Beşek din dibêjin: “Ev hêzar sal e kurd û tirk wek bira bi hev re jiyan e û ne mimkin e ji hev biqetin.” Hin jî li ser navê kurdan propaganda ordiya tirkîyê dikin û dibêjin “Tenê ordiya tirkîyê dikare pirsra kurdî çareser bike”. Beşek jî kurd û tirkan endamê neteweyekê dibînin. Lê hin kes jî “Difikirin“ ku xwedêgiravî eger Tirkîye perçên din ên Kurdistanê dagir bike û têkeve yekîtiya Ewropayê, wê gavê divê hin mafên kurdan bide wan. Mirov dikare bipirse, gelo ji bo çi nerînên wisa di tevgera kurdî de hakim in? Gelo xwedîyê van lênerînan, tevgera kurdî gîhandine kîjan merhelê? Ji bo çi “Hêvîyên“ wan hatine guhertin? Gelo rewşa aborî, siyasî û kulturî ji salên berî heştê çêtir bûye?

Tiştê tê zanîn, ji destpêka sala 80î û vir ve, dewletê bi kemanî 3000 gundên kurdan şewitandine, bi kuştin, girtin û darê zorê bi milyonan kurd koçder kirine. Ev yeka ha jî bûye sebebê ku di nav gelê kurd de hejmara mirovên cahil û nexwende zêdetir bibe. Dewletê ekonomîya welêt têk birîye û sermayedarên wê koçî bajarên Tirkîyê kirine. Bax, baxçe û zêwî ji bêxwedîtiyê beyar bûne. Bi kurtî, dewletê di warê iktîsadî, civakî û kulturî de struktura civaka kurdî têk birîye û siyaseta asîmîlasyonê bi her awayî dijwar kirîye..

Piştî van bûyerên neyînî, bersiva pirsên li jor, mirov bi gotineke pêşîyên me, “Sal bi sal xwezî bi par“ dikarê bide. Ji nimûneyên ku min li jor dan dixuye ku pêwîst e mirov serê xwe li ser sedemên esasî ên ku rê li rewşeke wisa vedikin, biêşîne.

Fikir û nerînên wisa ne li ser hîmê rastîya civakê ava dibin. Berjewendîyên gelê kurd naporêzin. Mirovên wisa di çarçova statukoya dewletê de hereket dikin û alternatîvên “Çareserkirina“ pirsra kurdî, di nav alternatîvên hazir ên di gerîneka dewletê de henin, dibînin. Ew îdealên gelê kurd, nixrên wê ên tarîxî û kulturî xistine, ji bîr kirine û ên mayî jî dane ber lîngan. Bawerîyên wisa xizmeta du tiştan dikin: 1. Şiûr û tewgera netewî a gelê kurd têk dibe. Ev du sed sal e, di dil û mejîyê gel de rih û îdealên serxwebûnê û azadîyê de hatîye çandin û bi sedhêzaran kurd bi xwîna xwe nixrê wê dane. 2. Nerînên wisa hakimîyeta dewletên dagirker û bindestîya milletê kurd mitleq dike. Bi helwesta di nav hêz û alternatîvên hazir de rawestandî, tarîx nayê çêkirin. Di derheqê vê mijarê de fîlozofê polonî Ejî şatskîn dibêje: “Eger mirovan, tenê ji hêzên hazir digel terefekî rawestîyana û tenê ji alternatîvên hazir yek hilbijartana, piştî demekê wê ne xwedî tarîx bana.“ (1)

Ji bona ku gelê kurd karibe şîûra xwe a netewî li ser lîngan bihêle, berjewendîyên xwe ên netewî biparêze û girêdanên xwe ên bi neslê berî xwe re nas bike, pêwîst e ew jî wek hemû gelên din berê xwe bide tarîxa xwe û bûyer û çalakîyên tarîxî û kulturî di bîra xwe de bîne. Xebatek wisa mirov dikare di çarçova pêwendî û girêdanên şîûra netewî û şîûra tarîxî de binirxîne.

Bîranîna bûyer û çalakîyên tarîxî û kulturî, ji teref zanyaran bi têgeha “Hafiza tarîxî” tê bi nav kirin. Herwiha, zanebûna derheqê dema derbasbûyî, wek perçekî esasî ê şîûra netewî û wek potansîyeleke manewî a gel tê nirxandin. Hafiza tarîxî perçekî kulturê ye û zanebûna mirovan a dema pêşîyên xwe, destan û urf û adetên xwe, îhtîwa dike. Lê hafiza tarîxî û şîûra tarîxî ne eynî tişt in. Ehemîyeta hafiza tarîxî ew e ku mirov dikare wê di gelek waran de bi kar bîne. Nimûne: Hisên netewî ên ku li ser bingehên bîranîna tarîxî şikil digirin, li nik mirovan dikarin welatperwerîyê û xurûra netewayetîyê geş bike. Lê ew ji teref nijadperest û faşistan jî, li dijî gelên din kare bê bikaranin.

Ji encamên bûyerên neyînî ên ku civaka kurdî xistine nav agirê dewleta Tirkîyê divê hemû mirovên kurd xwedî bersivek be. Gelo ji bo çî van bûyerên dijwar ji bo gel nabin potansîyelek manewî a ku nefretê li dijî dewletê zêde dike û daxwaza serxwebûnê xurt dike? Gelo ji boçî, ji dêvla rihê welatpererîyê û xurûra netewî geş bibe rihê teslîmîyetê û koletîyê li nik zanayên kurdan hakim dibe? Ma ne ev hêzar sal e ku tirkan bi zor û talanê Kurdistan dagir kirine? Ma ne ew in ên ku bi her awayî hewl didin ku kurdan ji holê rakin? Ma ne divê ku bûyerên ha perçekî kultura gelê kurd bin? Ma gelo lazim e ku gelê kurd mahkûmî jîbîrkirina van bûyeran bibe? Di rewşeke wisa de, gelo ehemîyeta aktuelkirina bûyerên tarîxî hene? Eger di derheqê bûyereke de lêkolîneke zanistî ne hatibe kirin û sedemên wê ên teybetî û gelemperî ne hatibin eşkere kirin, aktuelkirina bûyereke wisa wê xizmetê ji berjewendîyên gelê kurd re neke. Eger aktuelkirina bûyereke tarîxî berjewendîyên gelê kurd biparêze, wê gavê dikare şîûra tarîxî û netewî a gelê kurd geş bike û encamên pozîtîv li ser tevgera netewî bihêle. Tarîxnasa Sowyetî L.M.Drobîjeva di derheqê vê mijarê de wisa radigîhine: “Şîûra tarîxî aktuelkirina hafiza tarîxî ye. Hafiza tarîxî elementek şîûra netewî ye û ji teref berjewendîyên netewî-civakî tê aktuelkirin. Aktuelkirina bûyerên tarîxî û kulturî bi şertên konkret ve grêdayî ne. Berî her tiştî rewşa civakî û siyasî dikare van bûyerana aktuel bike.”(2) Mirov dikare şîûra tarîxî, bi şêwa pêwendî û helwesta mirovan a digel bûyerên tarîxî û kulturî binirxîne.

Bûyerên tarîxî ne tenê ên gelekî ne, mimkine li dijî berjewendîyên hin gelan bin, lê ên hinan jî biparêzin. Di rewşeke wisa de helwesta mirovan divê ji hev cida bin. Encamên bûyereke tarîxî, ne mimkine ji bo her milletî wek hev be. Di tarîxa gelê kurd de bûyerên wisa gelek in. Peymana Lozanê bûyereke tarîxî-navnetewî ye. Wê balansa hêza siyasî û eskerî, a dinyayê guherand. Peymana Lozanê ji bo demekê be jî, nakokîyên di nav dewletên bloka Antant û bloka Alman, Awstîrya û Tirkîyê de rakirin. Bi awakî îzafî be jî, îstîkarek û balansek siyasî di nav dewlet û hêzên vê herêmê de saz kir. Ew ji bo hin dewletan serketin bû. Lê ji bo kurdan windakirinbû. Mirov dikare Peymana Lozanê di sê xalên esasî de analiz bike: 1. Lozan di pêwendî û nakokîyên navnetewî de. 2. Tirkîye

û Lozan. 3. Pirsâ kurdî û Lozan. Her xalek bi serê xwe mijara lekolînekê ye. Ez ê hewl bidim li ser pirsâ kurdî û tesîrên encamên ku peymanê Lozanê ku li ser tevgera netewî kirine, rawestim.

1. Lozan di pêwendîyên Navnetewî de

Wek tê zanîn şerê Cîhanê ê yekê di nav du blokên mezin de derket (Bloka Antant - Ingilîz, Ferensa, Îtalya û Rûsya û bloka Almanya, Tirkiyê û Avistiryayê). Di prosesa şer de şoreşa Oktobê (1917) balansa siyasî a dinyayê guhert. Herçiqas dewletên Antant terefê serketî bûn, lê mecbûr bûn ku di peymanên bi bloka di şer de şikestibû, rewşa siyasî a nuh ango hebûna Sowyet Rûsya di hesêp xistana.

Şoreşa Oktobê, serketina bolşewikan li herêmên Kafkasya û Navçê Asyayê, serketina kemalîstan li Tirkiyê û nakokîyên dewletên Antantê bi xwe, bûn faktorên esasî ên ku prosesa parvekirina erdên dewleta Tirkiyê gîhandin peymanê Lozanê. Di prosesa peymanê de sê pirsên esasî hatin mînaqêşe kirin. Pirsâ parvekirina erdên dewleta osmanî, pirsâ rejîma tengavên Tirkiyê (Çanakale û Stanbol) û pirsâ kapîtilasyon û deynên dewleta Tirkiyê.

Di sesiya yekem a Lozanê de herdu pirsên ewil hatin mînaqêşe kirin. Tirkiyê bi şertê parastina tixûbên siyasî ên niha, digel pêşniyara dewletên Antan rawestîya. Di pirsâ Tengavan de berjewendîyên ingilîz û frensiyan digîhan hev. Îngilîzan hesabên li dijî Sowyet Rûsya û mihtemel şerek ku di nav wan de derkeve, dikir. Di rewşeke wisa de wê dixwest tengavên Tirkiyê ji gemîyên herbê re vekîrî bin. Frensa bi teybetî dixwest nîfûza xwe a li ser nefta Romanyayê biparêze û gava pêwîst be bi gemîyên herbê karibe kontrola rêyên transporta nefta Romanyayê biparêze.

Pirsâ rejîma tengavan li ser du pêşniyarên li dijî hev hate mînaqêşe kirin. Îngilîzî û frensî pirsâ ku gemîyên herbê bi serbestî karibin di tengavan re derbas bibin xistin mînaqêşe. Lê Sowyet Rûsya ne dixwest gemîyên herbê di tengavan re derbas bibin. Wê digot, divê tengav ji derveyî gemîyên herbê, ji hemû gemîyên ticarî re vekîrî bin. Konferansê li gor pêşniyarîya Îngilîstanê û Frensayê bîryar sitend. Bi kurtî, encamên vê peymanê di têkîlî û nakokîyên navnetewî de berjewendîyên Îngilîstanê û Frensayê, lê bi taybetî jî ên dewleta ingilîzan parastin û herwiha nîfûza ingilîzan di warê siyasî û aborî de li herêma Rojhilata Navîn xurt kir.

2. Tirkiye û rola kemalîstan di peymanê Lozanê de

Wek tê zanîn dewleta osmanî ji destpêka sedsala XIX de gîhabû qonaxa ku têk biçe. Rewşa wê di tarîxê de bi navê "Pirsâ Rojhilat" tê zanîn. Pirsâ Rojhilat (pirsa qedera herêmên Balkan û Rojhilata Navîn) bûbû sedema nakokîyên navnetewî.

Wê teqrîben sed salî berdewam kir. Bi teybetî nakokîyên Îngilîstanê û Rûsyayê ji bo nifûza li herêmên Balkan û Rojhilata Navîn temenê dewleta osmanî sed salî dirêjtir kir. Di destpêka şera Cîhanê a yekê de, li gor biryarên peymanê Saykes-Picot (1916) dewletê Antant li ser parvekirina dewleta osmanî li hev kirin.

Tirkî jî wek dewleteke di şer de şikestî, mecbûr bû ku li gor şertên dewletên Antant peymanek imze bikira. Ew peymanê Sewrê bû ku di 10. 08. 1920an de di nav hikûmetên Antant û Tirkîyê de hat imze kirin. Şertên wê çend bajarên Anadolîyê ne tê de, temamê herêmên dewleta osmanî dixist bin nifûza dewletên Antant. Di vê demê de hikûmeta osmanî di têkîlîyên navnetewî û ên hindûrî de gelekî zêf bû. Lêbelê rewşa kemalîstan her ku diçû xurt dibû û berî peymanê (23. 04. 1920), li Enqerê meclîsa xwe damezirandin.

Şertên peymanê Sewrê gelekî elastîk hatibûn hazir kirin. Ew ji bo bazarek di dema pêş de hatibûn hazir kirin. Bi taybetî xalên di derheqê pîrsa kurdî de bi hin egeran ve hatibûn girêdan. Şertên peymanê Sewrê ne tenê li gor rewşa Tirkîyê a siyasî hatibûn hazir kirin. Ew wek perçek stratejîya tekoşîna li dijî Sowyet Rûsyayê û li gor muhtemel guhertin û bûyerên li wê bibin, hatibûn hazir kirin.

Di vê demê de, dewletê Antant û Emerîka ji bo têkîbirina hikmê sowyetê li dijî Sowyet Rûsyayê tekoşîn dikirin. Îngilîzan hewl didan ku nifûza xwe di herêmên Navçaya Asyayê û Kafkasyayê de xurt bikin û wan ji Rûsyayê biqetîne. Herwiha dewletên Antant jî hewl didan ku mixalefeta Rûsyayê xurt bikin.

Xalek herî girîng a peymanê Sewrê, planên damezirandina Ermenîstana Mezin bû. Li gor vê peymanê erdên ermenîyan û herêmek mezin a bakurê Kurdistanê jî diket hindûrê tixûbên Ermenîstana Mezin. Ew plan bakurê Kurdistanê perçe dikir û şertên ku kurd karibin yek bin û dewleteke serbixwe ava bikin ji holê radîkir û herwiha desthilatiya ingilîzan li başûrê Kurdistanê xurtir dikir. Planê Ermenîstana Mezin gelên kurd û ermenî anî hemberî hev. Gelê kurd ne dixwest di bin hakimiyeta ermenîyan de bijî. Zilm û zora ji teref ermenîyan de (di dema herba Cîhanê de) li kurdan hatibû kirin, ne hatibû ji bîr kirin. Ew bêbawerîya di nav kurd û ermenîyan de û xistina hin herêmên bakurê Kurdistanê hindûrê tixûbên Ermenîstana Mezin bû faktoreke esasî ku kurd di wê demê de nêzîkî kemalîstan bibin.

Eger ku Ermenîstana Mezin ava bûbaya, ew ê ingilîzan di ser wê re karîbana nifûza xwe li herêma Kafkasyayê xurt bikirana û midaxeleyî hindûrê Rûsyayê bikirana. Lê planê ingilîzan û mitefîkên wan neçû serî. Mixelefeta rûsan ji teref bolşewîkan hat şikandin, herwiha li Gurcîstanê, Ermenîstanê û Azerbeycanê hikim ket destê bolşewîkan. Sowyet Rûsya di 1921ê de bi dewletên cîran Tirkîye, Îran û Afganîstanê re peymanên dostaniyê imze kirin.

Di destpêkê de ingilîzan di pîrsa desthilatiya dewleta Tirkîyê de, li dijî

kemalîstan piştgirîya siltanê osmanîyan dikirin. Lêbelê siltan jî, ji her şertên wan re digote erê. Lê hêza ku xurt dibû kemalîst bûn. Ew bi soza ku otonomîyê bidin kurdan, hêzên wan ên herêmî li dor xwe civandin. Kemalîstan piştî ku rewşa xwe a siyasî û eskerî li Kurdistanê saxlem kirin, karîbûn hêza yûnanîyan bişkînin. Serketina bolşewîkan li tevaya herêmên Rûsya û Kafkasyayê, hemû bûyer û guhertinên siyasî ên li Tirkîyê, bûn sedemên guhertina balansa hêza siyasî a herêma Rojhilata Navîn.

Kemalîstan di 1921ê de piştî avakirina hikûmetê, bîryarên peymanê Sewrê rawestandî. Frensî û îtalî ji bona nifûza Sowyetê di herêmê de zêde nebe û kemalîst nekevin bin tesîra wê - frebûna nifûza Rûsîyê berjewendîyên Frensa û Îtalya li Tirkîyê û herêma Balkanê dixist tehlukê - xwe nêzîkî wan kirin û sozên rawestandina peymanê Sewrê dan wan.

Guhertinên siyasî ên li jor, herwiha planên îngilîzan ên peymanê Sewrê jî têk birin. Ew jî mecbûr man ku siyaseta xwe li dijî Tirkîyê, li gora rewşa siyasî a nuh biguherînin. Hêvîyên xwe ji siltan birîn û bi kemalîstan re pêwendîyên xwe danîn. Îngilîzan pêwendîyên xwe bi Tirkîyê re, him ji bo ku rê li frebûna nifûza Rûsîya bigirin û him ji bo pirsê kurdî têk bibin xurt dikirin. Berê herdu terefan, tevgera kurdî ji bo berjewendîyên xwe li dijî hev bi kar dianîn. Lê rewşa nuh rê dida herdu dewletan ku Kurdistanê di nav xwe de parve bikin û tevgera netewî têk bibin.

Ji bona têkbirina peymanê Sewrê û hazîrîyên konferansekê nuh Tirkîyê û dewletên Antant dest bi pêwendîyên dîplomatîk ên nuh kirin. Rewşa siyasî a herêmê hedî hedî ber bi zelal bûnê diçû. Nakokîyên Tirkîyê û dewletên Antant kêmbûn û înteresên wan ên dabeş ew mecbûr dikirin ku dest bi pêwendîyên dîplomatîk bikin. Li ser vî esasî Tirkîyê, Îngilîstan, Frensa û Îtalya dest bi guft û goyan kirin. Di dema konferansa Londonê de (1921) şertên peymanê Sewrê sivik kirin. Li Mudanyayê (3-11. 10. 1922) herçar dewletan, li ser pirsên esasî ên mijara konferansa Lozanê li hev kirin. Pirsê yekê têk birina qerarên peymanê Sewrê bûn, ango redkirina mafê kurdan bû. A duyem jî guhertina rejîma tengavan bû. Kemalîstann ji nakokîyên siyasî ên navnetewî û bi taybetî jî ji nakokîyên dewletên Antant û Sowyet Rûsîyê fêdeke baş dîtîn.

Konferansa Lozanê di 20. 11. 1922an de dest bi sesîya yekem kir. Dî vê sesîyê de tirk û îngilîzî serketî ji konferansê derketin. Tirkan gelek erdên nuh bidest xistin û tixûbên siyasî ên niha hatin qebûl kirin. Di konferansêde bîryarên Sewrê ne hatin mineqeşe kirin. Tirk razî bûn ku Mûsilê bidin îngilîzan û herwiha rejîma tengavan li gor peşnîyara îngilîzan hate guhertin. Sesîya duyem di 09. 04. 1923an de dest pê kir. Di vê dewrê de jî pirsên kapîtilasyon û deynê dewleta osmanî hatin minqeşe kirin û di wê de jî Tirk bi serketî derketin. Peymana Lozanê di 24. 07. 1923an de hate imze kirin.

3. Pirsâ kurdî û biryarên peymanâ Lozanê

Pirsâ kurdî ji destpêka herba Cîhanê a yekê heta peymanâ Lozanê subjektek pêwendîyên navnatewî bû. Dewletên Antant û bloka li dijî wan di pêwendî û pêymanên xwe de, hertim hesabên jeo-stratejîk û iktisadî rola Kurdistanê dikirin. Ji prosesa dema herbê heta Loazanê guhertinên ku di hêza siyasî-eskerî de çêbûne, tesîrên xwe dîrek li ser rewşa gelê kurd kirîne. Di rojeva guft û goyên dewletên Antant ên li ser parvekirina dewleta osmanî, Kurdistanê cîhekî kî girîng girtîye. Li gor çavkanîyên tarîxî, yek ji xalên esasî a ku di nav dewletên Antant de bû sedema mînaqêşên cidî, pirsâ qedera Kurdistanê bû. Li gor qerarên peymanâ Soykes-Pîko (1916) a ku di nav dewletên Antant de hat imze kirin, Kurdistan ew ê di bin nîfûza Rûsyayê de bimaya.

Di vê demê de micadela tevgera netewî a gelê kurd, ji du hêlan ve dimeşîya. Li hêlekê tevgera netewî a ronakbîrên kurd bû. Piraniya van mirovan di mektebên tirkî de xwendibûn, li metropolê dijîyan û karbidestên dewletê bûn. Ev bûyera ha di tarîxa gelê kurd de destpêka prosesek nuh bû. Ji ber ku ew cîlê yekem e, a ku bi metodên rêxistînî a “Modern” micadela kirîye û ji gelê kurd re di hindurê tixûbên dewleta osmanî de otonomî xwestîye. Li hêla din serokên hêzên herêmên Kurdistanê serokatîya micadela gelê kurd - bi şerê çekdarî û metodên tradîtsîonî - dikirin. Li gor çavkanîyên tarîxî, heta sala 1918an micadela herdu hêlan ji hev cida bûn. Ronakbîrên kurd ên li metropolên Tirkîyê, karên rêxistînî, komeleyatî û çapemanîyê dikirin. Bi awakî giştî karê ku dikirin ji pêşketina kultur û şûra netewî re xizmet dikir. Lê encamên karên wan bi awakî berfireh di nav gelê kurd de belav ne bû. Herwiha di micadela siyasî de dewlet ne didan hemberî xwe. Lê rêberên hêzên herêmî herçiqas bi metodên ronakbîrên li metropolan micadela ne kiribin jî, lê li Kurdistanê bûn. Bi gel re di bin zîlm û zora dewletê de bûn. Ne tenê derdê gel dizanibûn, herwiha xwedî hêz û otorîte jî bûn. Ew xwedî tecrubên civatmeşandin û îdarekirinê bûn. Ev xisûsiyetên ha dibûn faktorên ku gelê kurd bawerîya xwe bi wan dianî û ew ji xwe re rêber qebûl dikirin.

Wek tê zanîn, di tarîxa gelê kurd de serhildana Betlîsê bûyereke teybetî ye. Lê di derheqê wê de kêma agahdarî heye. Li gor ragîhandinên generalê Rûsî Şaxovskoy, serhildana Betlîsê ne serhildaneke herêmî bûye. Di sala 1914an de rêberên kurdan ên herêmî û bi taybetî jî bedirxanîyan, hazirîya serhildanekê li tevaya Kurdistanê dikirin. Lê ew di prosesa hazirîyê de bêwext hatin girtin. Dewleta Tirkîyê ji bo pêşî li serhildanê bigire, êrîş anî ser Betlîsê û hin serokên serhildanê girtin û kuştin. Li gor agahdarîyên Şaxovskoy ermenîyan (rêxistina Taşnak) hazirîya vê serhildanê îxbarî hikûmeta tirk kirine. Sedemên we jî wisa radigihîne: Taşnakan planê damezirandina “Ermenistana Mezin” dikirin. Li gor planê wan gelek herêmên bakurê Kurdistanê jî diketin hindurê tixûbên vê

dewletê. Wan hayî jê hebû ku kurd hazirîya serhildanekê ji bo tevaya Kurdistanê dikin. Lê taşnakan serketina kurdan ne dixwestin, serketina kurdan li dijî planê xwe didîtin û ji bo wê kurd ixbarî dewletê dikirin.

Rêberên kurdan ên herêmî zû bi zû teslîm ne dibûn û zilm û zora dewletê ji bîr ne dikirin. Gava di sala 1915an de ordiya rûsan ket bakurê Kurdistanê, gelek alayên hamîdîyê tev li malên xwe - ji bo ku li dijî ordiya tirkan şer bikin - derbasî terefê rûsan dibûn. Li gor ku Şaxovskoy radigîhîne, ermeniyên ku di ordiya rûsan de esker bûn, kurd teslîm ne digirtin. Zilm li wan dikirin, dest diavetin jinên wan û ew dikuştin. Ev siyaseta ordiya rûsan bû sedemê ku kurd ji wan dûr bikevin. Şaxovskoy dinivîsîne ku herçiqas Kor Hiseyîn paşa dixwest ku bi rûsan re li dij tirkan şer bike, lê ji ber zilma ermenîyan derbasî terefê Rûsan ne bû. Lêbelê li dijî Rûsan jî şer ne kir, bê teref ma.

Rûsya piştî ku di sala 1916an de peymanî Seykes-Picot imze kir, bi alîkarîya Kamil Bedixan begê ji bona serhildanekê li tevaya Kurdistanê hewl da ku pêwendîyan bi rêberên kurdan ên herêmî re dayne. Rûsan dizanîbûn ku giranî û qîmeta rêberên herêmî di nav gel de heye û ji bo wê, hesabê xwe li ser wan dikirin. Lêbelê kurdan bi şertê ku ermenî di nav ordiya rûsan de nebin, pêşniyarîya wan qebûl kirin. Lê hazirîya serhildanê nêvcî ma. Şoreşa Oktobrê bû sedemê ku eskerên rûsan bi şûn de vekişin. Herwiha şûn de vekişandina rûsan ji Kurdistanê bû sedemê têkçûna hazirîya serhildanê.

Pirsa kurdî, ji sala 1918an heta navçê sala 1920î xisûsiyetek navnatewî distîne. Di vê prosesê de siyaseta pêwendîyên navnetewî gîhabûn merhelek nuh. Guhertina balansa hêza siyasî li Rojhilata Navîn, şertên ji bona ku gelê kurd karibe qedera xwe bi destê xwe tayin bike, hazir kiribû. Lê gelê kurd ji bona karibe firsetên wisa bi kar bîne, di warê siyasî û rêxistinî de, tu hazirî ne kiribû.

Rêxistina netewî "Kurt Tealî Cemîyeta" (KTC) li dor xwe ronakbîrên kurd kom kiribûn û pêşkêşîya tevgera netewî dikir. Lêbelê li Kurdistanê di nav gelê kurd de xebateke wê a berbiçav tunebû. Pêwendîyên wê bi serokên hêzên herêmî re gelek zêf bûn. Piştî xwe ne dabû hêza gelê kurd. Hesabên xwe ên siyasî, tenê li ser nakokiyên di nav dewleta Tirkîyê û dewletên Antant de dikir. Serokatîya KTC hewl dida ku bi alîkarîya dewletên Antant û bi taybetî jî bi alîkarîya îngilîzan pirsê kurdî çareser bike. Lê tixûbên çalakîyên wan tu netîcên pozîtîv ne didan, ji ber ku ew tenê di çarçova pêwendîyên diplomatîk de bûn. Îngilîzan ji bona ku gelê kurd mihtemel reaksiyonekê nîşan nede, hewl didan serokatîya KTC manîpule bike. Wan hêvîyên KTC ên ku ji bo çareserkirina pirsê kurdî, tenê bi sozên dewletên Antant, siltanê osmanî û qerarên peymanî Sewrê ve girê didan. Di derheqê vê mijarê de wezîrê derve ê Îngilîz Balfur di 31.07.1920î de, di talîmatnama xwe a ji nûnerê xwe ê li Stenbol re radigîhand: "Divê ku ji kurdan re tawsiya me ev be: Li cihê xwe runên, tahrîq nebin û li benda biryarên

konferansa aşîfîyê rawestin.“ (3)

Dewleta Îngilîz siyaseta xwe a di derheqê kurdan de li ser bingehê berjewendîyên aborî, siyasî û jeostratêjîk ava dikir. Di prosesa guft û goyên di nav dewletên Antant û ên bi Tirkiyê re, ingilîzan hesabê avakirina mandat a li Iraqê dikirin. Pirs a li hevragirtina mandatê û avakirina form û îdara wê, perçek ji tevaya siyaseta ingilîzan a di derheqê kurdan de bû. Bi vê mijarê ve girêdayî, di derheqê pêwendîyên bi kurdan re karbidestê ingilîzî Kîston di 28.10.1919an de li Parîsê wisa radigîhand: “Herçiqas em naxwazin ji kurdan bawer bikin jî, lê bikaranina wan ji bona berjewendîyên me ne.” Karbideste ingilîzî Mr. Clerk Cerr jî, di tebaxa 1919an de digot: “Rewşa kurdan û ermenîyan min qet eleqeder nake. Divê ku bingehê siyaseta me a di derheqê kurdan de, ji bona li Mezopotomyayê damezirandina “Tamponek” tatmînkar be. Tixûbekî wisa divê ne li deştê, pewist e li çiyayên Kurdistanê be.” (4) Ji van nirxandinên ingilîzan, mirov dikare bibêje ku siyaseta di derheqê tixûbên navbera Tirkiyê û Iraqê de, perçek ji siyaseta ingilîzan a di derheqê kurdan de bû.

Di prosesa guft û goyên peymanê Sewrê de dîyare ku ingilîzan di derheqê çareserkirina pirsê kurdî de ne xwedîyên bîyareke eşkere bûne. Lê xwedîyê helwestekê bûne. Bingehê helwesta wan serî li kurdan gerandin bû. Di derheqê mijara pirsê kurdî û jeostratêjîk ehemîyeta Kurdistanê de, serokwezîrê Îngilîz Lloyd George, , di 19.04.1920an de wisa radigîhîne. “Zehmet e mirov karibe derheqê Kurdistanê biryarekê bide. Welat di bin guhê Ermenistanê de ye û ji ber ku qedera wê, asûrî û keldanîyan jî girê dide, bala dewletên Ewropî gelekî dikşîne. Herwiha Kurdistana Başûr perçekî ji manda, a ku mimkine di bin îdara Bîrîtanya Mezin keve. Em fikîrîn ku qetandina Kurdistanê ji Tirkiyê, ew ê baş be. Lê zahmet e mirov karibe texmîn bike, encamên daxwazên kurdan û lihevragirtina wan di dewletek otonom de, wê balansek çewa derxe holê”. (5) Encamên vê siyasetê bû sedemên di konferansa li San-Remo yê (19-26. 04. 1920) de Kurdistan di navbera tirk, ingilîzî û frensiyan de bê parve kirin.

Diplomatê sowyetî Rozenberg sedemên pêwendîyên kemalîstan digel kurdan û rewşa wan a wê demê wisa dianî zimên. Tirk wisa zeîf û bêçare bûnin, ji mecbûrîyeta hebûna kurdan qebûl dikin û sozên otonomiyê didin wan. M. Kemal û tereftarên wî dizanîbûn ku kurd ne li ser hev in. Ji alîkî de welatê kurdan ji nuh ve hatîbû parve kirin û ew li ser erdê xwe bêçare mabûn. Ji alîyê din de serokatîya KTC ji bo mafê kurdan piştgirîya dewletên Antant dikir. Kemalîstan dizanîbûn di warê siyasî û rêxistîni de li Kurdistanê valahîyek heye. Wan ev rewşa kurdan a neyînî ji bona xwe fîrsetek dihesibandin. Herwiha hewl didan ku ew ê karibin serokên kurdan ên herêmî manîpule bikin û hêza wan bi alî xwe de bikişînin.

Di derheqê vê mijarê de Rozenberg konetî û derewên kemalîstan wisa dinirxîne. “Herçiqas mihtemel e hikûmeta kemalîstan soza otonomiyê dabe

serokên kurdan, lê wan ne dixwest wê di bîra xwe de bînin. Gava me ji mebûsên tirkan re digot, pêwîst e kurd otonomîyê bistînin, ew bi nefret li dij derdiketin û digotin otonomîya kurdan wê bi xwere serxwebûn û cidabûnê bîne.“ Rozenberg dewam dike û dibêje, “Eger hikûmeta Tirkiyê ji bo otonomîyê soz dabe kurdan, ew ji bona dema zeîf ketibûn, ku kurd li dijî wê ranebin û şerê wê nekin, bû. Li ew gava berxwe bibîne ew ê li dijî kurdan dest bi qetlîamên eskerî bike.“ (6) Di wê demê de li Kurdistanê gelek alayên Hemîdfiyê hebûna xwe berdewam dikirin. Li gor agahdarîyên rûsan, li bakurê Kurdistanê çil hezar mirovên kurd xwedî çek bûn.

Kemalîstan bi siyasetek kone, serokên herêmî xapandin û bi wan dan bawerkirin ku eger bi hev re li dijî dewletên Antant rawestin û bi serkevin, ew ê tirk û kurd bi hev re bin û xwediyê mafên wekhev bin. M.Kemal gava ji alîkî de soza otonomîyê dida û piştgirî û dostaya kurdan dixwest, lê ji aliyê din jî konetîya xwe berdewam dikir û li dijî kurdan ji qomandarê xwe ê cepha el-Cîzîrê Newzat Paşa re talîmat rê dikir. M. Kemal di talîmatnama xwe de radîghand: “Ji bo ku hûn karibin kurdan bi xwe ve girêdin, divê hûn wan ji ingilîz û frensiyan dûr bixin û bi tenê bihêlin û herwiha kurdan û ingilîz û frensiyan bînin beranberî hev.“ (7) Di derheqê vê mijarê de peyva sefirê Sowyetê ê Enqerê Aralov (1922) gelek balkêşe. Aralov di hevpeyvînek xwe bi M.Kemal re dibêje: “Kemal pirsra kurdî, pirseke zahmet û têkelhev didît. M.Kemal digot vê gavê serokên kurdan belav bûne. Hin ber bi îraniyan, hin ber bi ingilîzan ve diçin û hin ji ber bi me de tên“.(8)

Hikûmeta Enqerê piştî piştgirîya kurdan garantî kir, di 07.07.1920an de hemû peymanên dewleta osmanî imze kiribûn red kir. “Îttîfaq“ kemalîstan bi kurdan re û pêwendiyên bi Sowyet Rûsyayê re rewşa wan a siyasî û eskerî li Kurdistanê û Anadolîyê xurt kir. Encamên rewşa nuh tesîrên xwe li ser pêwendiyên Tirkiyê û dewletên Antant jî kir. Generalê ingilîzî Ravlîson (1920) rewşa tirkan a nuh di ber çavan re derbas kir. Ravlîson bi şertê ku nifûza Sowyetê li herêmê fireh nebe, soza ku li Tirkiyê piştgirîya îdarek xurt (kemalîstan) bikin, da. Ji ber eynî sedeman frensî û îtalî jî xwe nezîkî kemalîstan kirin. Serketina kemalîstan li dijî yûnanîyan rewşa wan a siyasî di pêwendiyên hindûr û ên bi der ve re xurtir kir. Hemû bûyerên nuh, bûn sedemên ku tirk karibin peymana Sewrê red bikin û di konferansa Lozanê de bi serketî derkevin.

Lê dîyar e, rêberên kurdan (ên serokatîya KTC û ên herêmî), iktîsadî-stratejîk û jeostratejîk ehemîyeta Kurdistanê a ji bona dewletên Antant û Tirkiyê û herwiha planên wan ên di derheqê Kurdistanê de tê ne gîhabûn. Piştî giranî û otorîta siltanê osmanî şikest û kemalîst desthilatiya xwe xurt kirin, serokatîya KTC mecbûr bû helwestek nuh bistîne. Serokê KTC Seyid Ebdulqadir û gelek endamên din li nik kemalîstan helwest girtin. Hin endamên KTC daxwaza

serxwebûnê derxistin pêş. Lê dewletê ew mecbûr kirin ku ji Tirkiyê derkevin. Grûbek kurd ên li Kurdistanê di bin serokatîya Xalit begê Cibrî de piştgirîya kemalîstan red kirin, lê li dijî wan jî şer ne kirin. Helwesta vê grubê payin bû. Di vê demê de tenê li herêma Dêrsimê - Koçgîrî (1920) kurd ji bona mafên xwe ên netewî serî hildan. Lê ew jî ji piştgirîya tevgera kurdî mahrûm ma û di herêmeke piçûk de hatê şikandin. Kurdên başûrê Kurdistanê, li gor min, di vê rewşa nuh de helwesteke rast sitendin. Kurdan li vê herêmê, ji bona ku berjewendîyên xwe ên netewî biparêzin, di bin serokatîya Şêx Mahmût Berzencî de li dijî ingilîzan serî hildan.

Bi awakî giştî kurd di navbera salên 1920 - 1922an de ji bo mafên xwe ên netewî bidestxin tu çalakîyên berbiçav ne kirin. Li bendî rehma tirkan û ingilîzan man. Lêbelê herdu teref jî ji bona berjewendîyên xwe ew li dijî hev bi kar dianîn. Bi raya min, bêdengîya kurdên Bakur û hevkarîya wan bi kemalîstan re, rê lê vekir, ku kurdên başûr, konetîyên kemalîstan nebînin û ji sozên kemalîstan ên derewîn bawer bin û nezîkî wan bibin. Vê helwesta neyînî a kurdên bakur, herwiha tesîr li ser raya giştî a dinyayê jî kir û pê re qenehetek çêkir ku li Tirkiyê mitleq hakîmîyeta kemalîstan heye, wan bi kurda re problema xwe çareser kirine û istîkrarek siyasî saz kirine. Bi kurtî, bûyer û guhertinên li herêma Rojhilata Navîn ji bo tirkan encamên pozîtîv anîn û bûn sedemên nêzîkbûyina Tirkiyê û dewletên Antant. Hin mirov bêyî ku rastîyê bibînin, dibêjin ku kurdan piştgirîya ingilîzan kiriba, ew ê mafên xwe ên netewî bidestxistana. Lê rastî ew bû ku guhertinên dibûn, ehemîyeta pirsê kurdî kêm dikir. Berjewendîyên dewletên hikim li kurdan dikirin, di nîqta herî girîng a têkbirina tevgera kurdî de gihastibûn hev. Daxwaza li vê herêmê balansek nuh a hêza siyasî, şer rawestandî û bêdengî, ji derveyî kurdan, berjewendîyên hemû hêzên li vê herêmê diparast. Ji bo daxwazek wisa di jiyane keve konferansa Lozanê hat amade kirin û wê nîqta danî talîya prosesê kevn û prosesê nuh destpêkir.

Encamên peymanê zerara herî mezin gîhand mîletê kurd. Ew li başûr û li bakurê welêt bû hedefa zîlm û erîşên tirk û ingilîzan. Îngilîz li dijî hikûmeta başur rawestîyan û dubendî xistin nav Ş.M. Berzencî û havalbendên wî. Tirkiyê heşkere li dijî gelê kurd rawestîya, mebûsên wan ji meclîsê avêtin, bi darê zorê hewl da gel bêçek bike. Hemû imkan û derfîyên desthilatiya siyasî û iktîsadî li gelê kurd hate girtin. Tirk, ingilîz û faris bi pêwendîyên dîplomatîk û bi metodên eskerî, li ser tevaya erdê Kurdistanê li dijî tevgera netewî rawestîyan û hewl dan ku bi her awayî wê ji holê rakin.

Gelo rewşa Tirkiyê û a navnetewî rê dida ku kurd pirsê xwe çareser bikin? Bi raya min tevgera kurdî karîbû tesîr li ser helwesta raya giştî û bi taybetî a gelê kurd bikira. Berî her tişt pêwîst bû ku yekîtiya netewî saz bûbaya ango tevgera ronakbîrên kurd KTC xwe gîhandiba hêzên kurd ên herêmî. Lê wê ji dêvla wê,

piştgirîya kemalîstan kir. Di dema pêwendiyên dewleta Tirkîyê bi dewletên Antant re xerab bûn û ew bi yûnanîyan re di şerde bû, diva bû kurdan jî li dijî Tirkîyê dest bi şer kiribana. Ez wisa difikirim. Lê wan piştgirîya wê kirin, an jî bêdeng man. Kurdên bakur tenê bi soza kemalîstan bawerî anîn û li se vî esasî bi wan re li hev kirin. Ew bi hin îmtîyazên şexsî û bi rûniştina li meclîsê têr bûn. Diva bû tirk mecbûrî peymanên resmî kiribana, pêwendiyên xwe bi dewletên li dijî Tirkîyê danîbana û tedbîrên ku mafê xwe bi destê xwe biparêzin sitendibana. Lê wan ew ne kirin û li bendî rehma tirkan rawestîyan. Diva bû kurdan hêza xwe a siyasî û a leşkerî parastibana û hebûna xwe wek hêzeke eskerî serbixwe, bi tirkan û dewletên li herêmê xwedî nifûz dabana hîs kirin. Gava pêwîst ba, li dijî wan rawestiya û ji wan re astengî derxistiba. Lê wan ew ne kir. Kurd di wê demê de ji hev belav bûn û bêdeng man. Gelek caran ji tirkan bêtir li pişt tirkan rabûn. Helbet ev faktorên neyînî bûn sedemên ku pirsra kurdî ji dêvla bibe subjektek pêwendiyên navnetewî, bû objekta bazara nakokîyên di nav dewletên Antant û Tirkîyê de. Ji bo we jî roja ku wan dewletan li hev kirin, pê re jî pirsra kurdî ji bîr kirin û bi hev re li dijî tevgera kurdî rawestîyan. Tenê kurdên başûr bi berxwedana xwe bala ingilîz û tirkan bi alî xwe de kişandin. Her tim hebûna xwe bi wan dan hîs kirin û ji ber wê jî hin mafên xwe bi dest xistin.

Gelo sedemên tevgera kurdî helwestek wisa neyînî a li dijî berjewendiyên milletê kurd sitend, çibû?

Bersiva pîrsek wisa mimkin e bi ronîkirina niqta herf girîng, karakterê serokatîya tevgera kurdî a bîstsalên destpêka sedsala XXan ve girêdayî be. Dî sedala 1800î de, bi rêxistin û metodên tradîtsiyonî, tevgera kurd ji bona serxwebûna Kurdistanê micadele dikir. Rêberên hereketê, ronakbîr û serokên hêzên herêmî bûn û bi kultur û xwendina kurdî gihîştibûn. Di jiyana civakî a kurdî de mezin bûbûn û xwedî şexsîyetek kurdî bûn. Lê piraniya ronakbîr û rêberên ji destpêka sedsala XXan heta peymana Lozanê, herçiqas bi huwîyeta kurdî dihatin naskirin, lê li mektebê tirkî xwendibûn û karbidestên dezgehên dewletê bûn. Serokên herêmî ji bona ku li Kurdistanê bûn ji ronakbîrên kurd ên metropolê ferq dikirin, lê gelekî wan jî li mektebên tirkî xwendibûn û qomandarê alayê Hemîdîyê bûn an jî karbidestên dewletê ên herêmên Kurdistanê bûn. Li nik vê xisûsiyete herwiha statu û karên van mirovan ji teref dewletê hatibû tayin kirin. Ew di warê iktisadî û siyasî de bi dewletê ve girêdayîbûn û pêwendiyên wan ên bi karbidestên tirkann re xurt bûn. Wan hesabê xwe li ser hêza gelê xwe ne dikirin, hêvî dikirin ku dewletên Antant an jî Tirk ew ê mafên gelê kurd bidinê. Daxwaza hemûyan, otonomiyek ku di hindurê tixûbên dewleta Tirkîyê de bû. Vê xisûsiyeta wan a dabeş faktoreke esasî bû ku nehişt tevgera kurdî firsetên tarîxî bikarbîne û qedera xwe bi destê xwe tayin bike. Herwiha vê xisûsiyete ne hişt ku ew tê bighên dewletên dagirker wan ji bo berjewendiyên xwe bi kar ûnin.

Tênegîha bûn ku di pêwendîyên navnetewî de tiştê herî giring, berjewendîyên netewî an jî ên dewletî ne. Bîratî, dostayî an jî sozdayin tiştên îzafî û miweqet in. Dost û dijmin tenê li ser esasê berjewendîyan tên tayin kirin.

Peymana Lozanê Kurdistan ji nû de perçe kir û hejîmara dewletên dagirker ji duduyan derxist çaran. Karaktêra pîrsa kurdî a nakokîyên faktorek navnetewî bû têk bir û ne hişt bigîhê merhela ku ew bibe subjektek pêwendîyên navnetewî. Dewletên dagirker ew wek objektek ji bona nakokîyên xwe çareser bikin bi kar anîn. Parvekirina Kurdistanê di nav wan dewletan de li nik berjewendîyên iktîsadî û siyasî, karakterekî nû sitend. Ew ji bo herçar dewletan bû bufor (tampon) zonek parastinê li dijî hev. Vê jeo-stratîjîk rola nû a Kurdistanê bû encamê sazûna balansek siyasî di nav wan dewletan de. Lêbelê, iktîsadî, siyasî û jeo-stratîjîk rola Kurdistanê ji bona herçar dewletên dagirker ehemiyeta xwe dipêrêze. Ew ji bona berjewendîyên xwe ên iktîsadî, siyasî û jeo-stratîjîk û bi taybetî ji bona vê balansê biparêzin li dijî tevgera kurdî, di her warî de bi hev re kar dikin.

Ecâmên prosesa peymana Lozanê digel tesîrên neyînî, herwiha tesîrên pozîtîv jî li tevgera netewî kir. Piştî dîyar bû ku Kurdistanê ew ê bê parvekirin û pîrsa kurdî di rojeva peymanê de tune, bi derengî be jî, rêberên kurdan tê gihîştin ku divê ew bi xwe pîrsa xwe çareser bikin. Di derheqê vê mijarê de mebûsê Erziromê - mihtemele Hiseyîn Ewnî beg be - dibije ku di civîna girtî a meclîse de gava Îsmet paşa biryara peymana Lozanê a ku Mûsil ji ingilîzan re dihişt xwend, mebûsên kurd li dij biryarê derketin û gotin, divê kurd ji îro pê ve qedera xwe bi destê xwe tayin bikin. Her wiha mebûsê Betlîsê Yusuf Zîya piştî vê bûyerê di hevpeyvînekê (27. 02. 1923) bi dîplomatê Sowyetî Şaxovskoy re helwesta xwe wisa dianî zimên: "Heta nuha em difikîrîn ku kurd û tirk ew ê pîrsa kurdî bi hev re di şerê li dijî dewletên emperyalîst çareser bikin. Lê nuha, ji gava ku hikûmeta Tirkiyê razî bû Mûsilê bide ingilîzan, hemû hêvîyên me têk çûn." Herwiha Yusuf Zîya, bazara tirk û ingilîzan li ser parvekirina Kurdistanê jî dianî zimên û digot : "İngilîzan pêşniyarîyek ji tirkan anîn, bi şertê ku eger tirk li Kurdistanê otonomîyê îlan bikin, ew ê jî ji Mûsil derkevin. Lê tirk ji bo otonomîyê nedin kurdan, Mûsil dan ingilîzan." (9) (Mihtemele Yusuf Zîya û hevalên wî nizanîbûn, tirk ji gava ku ingilîzan başûrê Kurdistanê zefî kirin, eskerên xwe ji herêmê derxistin û ajotin hêla herêma Kafkasyayê. Siltan û kemalîstan ji destpêkê de tu hesabên xwe li ser Mûsilê ne dikirin. Wan jî heta dema peymana Lozanê ew ji xwe re wek wasitek bazarê bi dewletên Antant re bi kar anîn.). Ve bûyerê, bi derengî be jî, bawerîya ku kurd û tirk karin wek hev û bi hev re bijîn, li nik rêberê kurdan têk bir û bawerîya ku divê kurd qedera xwe bi destê xwe çareser bikin, xurt kir. Ev bawerîya ha herwiha li nik kurdên başûr û rojavayê Kurdistanê jî bû helwesteke hakim. Di wê demê de yekîtiya netewî

ji bo kurdên hemû perçan bûbû pirsra herî gîrîng. Herwiha ji bo damezerandina Kurdistaneke serbixwe, hemû serokên kurdan (Xalit beg Cibrî, Simko, Şêx Mahmûdê Berzencî û ên dinê), hewl didan bi hev re kar bikin û piştgiyariya hev dikirin.

Peymana Lozanê rê lê vekir ku hêzên tevgera kurdî - rêxistina hêzên herêmî Komîta Erziromê û a ronakbîrên metropolê Komîta Stenbolê - di rêxistinekê de bigihên hev. Di meha gulanê 1923an de herdu komîte bi navê “Kurdistana Serbixwe Komîta Merkezî” rexistinên xwe gîhandin hev. Ji bona damezirandina Kurdistaneke serbixwe, pêwendî bi kurdên perçên din re danîn û ji bo alîkariya navnetewî dest bi pêwendiyên dîplomatîk kirin. Wê yekîtiya hêzên kurd hîmên serhildanên Şêx Seîd û Agirîyê danîn.

Di dema me de aktuelkirina peymana Lozanê, pêwîste di çarçewek wisa de bê nixandin heta ku gelê kurd zanibe vê bûyera tarîxî, ji bo tevgera netewî bû sedemên kîjan encamên neyînî u pozîtîv.

Ji bona ronîkirina peymana Lozanê û encamên wê, divê lêkolînên zanistî û berfireh bînin kirin. Daxwaza min bi vê nivîsê ew ê tenê li ser ehemiyeta netîcên peymana Lozanê ên ji bona hafîze û şîûra tarîxî rawestim. Ji ber ku ji bona şîûra tarîxî geş bibe û bibe perçekî şîûra netewî, divê mirov xwediyê hafîzek xurt a tarîxî be. Ji bo wê jî divê mirov bûyerên di tarîxa gelê xwe de rast bizanibe. Lê mixabin di dema me de gelek zana û rêberên kurd, wek ixtiyarên xwe ên nexwendî jî tarîxa gelê xwe nizanin. Ji ber ku mirovên ixtiyar gelek bûyerên tarîxî bi devkî be jî, ji pêşiyên xwe guhdarî kirine. Lê gelek zana û rêberên siyasî bi awakî giştî tarîx û bi taybetî tarîxa gelî kurd bi awakî çewt û berevajî ji çavkanîyên tarîxa îslamê û dewletên dagirker fêr dibin. Çend kitêbên tarîxî ên dîrokvanên kurdan bi xwe nivîsîne - “Tarîxa Merwisaya,” “Şerefname” û ên dinê - bi awakî cidî ne hatîye xwendin. Herwiha derheqê şexsîyetên kurd ên tarîxî -Selahaddîn Eyubî, şerefxan Betlîsî, Îdrîsî Betlîsî, Ahmedê Xanî, Mele Mahmûdê Beyazîdî û ên dinê - jî xebatên zanistî ne hatine kirin û herwiha di derheqê wan de xwedî agahdarîyên çewt in.

Hemû bûyerên tarîxî ên gelê kurd bi serê derzîyê be jî, divê ji nuh de lê bê gerandin. Agahdarîyên dewletên dagirker divê bi şik û bi rexne bînin nixandin. Di çarçova karekî wisa de mirov dikare hafîze û şîûra tarîxî bighîne rastîya wê û wê li ser lingên wê bide rawestandin.

Di 75 salîya peymana Lozanê de, li bakurê Kurdistanê tevgera kurdî û şîûra netewî daketîyê merhela herî nizm. Li nik gelek mirov û rêxistinên kurd, bawerîya ku karibin bi hêza tevgera gelê kurd xelasbe ne maye. Ev a dema berî Lozanê tîne bîra mirov. Lê di wê demê de, ji teref tirkan ve hebûna gekê kurd dihat qebûl kirin, mimesîlê kurdan di meclîsa Enqerê de runiştibûn û kemalîstan

soz û hêvîyên Kurdistaneke otonom dabûn serokên kurdan. Gava kemalistan hebûna gelê kurd înkâr kirin û mafên wan ji dest wan derxistin, tevgera kurdî dest bi hazîrîyên serhildanên ji bo Kurdistaneke serbixwe kirin. Lê dîyar e, tarîx ji bo kurdan bi hêlên xwe ên neyînî tekerur dike.

Di dema me de, dewlet ne tenê hebûna kurdan înkâr dike, herwiha ji bona ku wan ji holê rake her metodî bi kar tîne. Lê mixabin li dijî vê siyasetê reaksiyona tevgera gelê kurd bi awakî din xwe nîşan dide. Daxwaza serxwebûnê an jî qedera xwe bi destê xwe tayinkirin hatîye ji bîr kirin. Diyar e dewlet çiqasî siyaseta xwe li dijî gelê kurd dişdîne, helwesta li dijî wê, ji dêvla diwartir bibe, mixabin sistir dibe û vê helwesta bûyera “Ji çel gurî daket xuş xuşê” tîne bîra mirov. Ji ber ku xurtbîna tendensên wek, divê huwîyeta kurdî bê nas kirin; ev hêzar sal e gelên tirk û kurd “Bi hev re dijîn” û nabe ji hev cida bin; pirsra kurdî pirsra dewletê a hindûrî ye; pirsra kurdî ji pêşketina dewletê re asteng e; pirsra kurdî tenê ji teref hêzên derve - bi alîkariya Emerîka û dewletên Yekîtiya Ewropî - kare çareser bibe û hwd. encamên tirsê û bê hevîtiyê ne. Bîr û bawerîyên wisa dibin sedemên ku mirov bûyerên xwe ên tarîxî nerast binirxîne. Lê divê mirov ji bîr nekin ku tarîx mirêka dema derbas bûyîye û ders ji bo dema pêş e. Lêbelê kurd di tarîyê de li “Mirêka” xwe dinerin. Ji bo wê jî dema xwe yî derbas bûyî di ronahîyê de, di tarîyê de dibînîn û di vê tarîbûnê de hewl didin pirsra xwe nas bikin û alternatîvên çareser kirinê biafirînin.

Nimûna herî berbiçav, ji teref hin “Zana” û siyasetmedarên kurdan nirxandina 75 salîya peymanê Lozanê û encamên wê ne. Wek tê zanîn, heta Lozanê kurd li Tirkîyê ji teref raya kurdî û tirkî de wek miletekî dihate qebûl kirin. Li gor “Soza” kemalîstan, mafê kurdan ê netewî jî ew ê wek ê miletekî bihata qebûl kirin. Di derheqê vê mijarê de di destpêka peymanê de axaftinên mebusê kurd ê meclîsa Tirkîyê Hisên Ewnî gelek balkêş e. Hisên Ewnî di axaftina xwe a di meclîsê de dibêje ku “Ev welat, welatê kurdan û tirkan e. Ji vê kursiyê tenê du millet xwediyê heqê axaftinênin; milletê kurd û tirk.” (10) Lêbelê peymanê Lozanê pirsra kurdî bi temamî red kir û ji bona parastina mafên kurdan tu biryar ne girt. Hin mirov hewl didin Xala peymanê a 39an aktuel bikin. Ev xal herçiqas bi awakî giştî hatibe nivîsandin jî, lê ew ji bona parastina mafên grûbên etnîk ên nemisilman - ermenî, yahudî û rûm - hatibû hazir kirin. Her çî hikmet e, van mirovan berê milletê kurd dadixin sewîya grûbek etnîk-mînôrîtet û li ser wî esasî propagandayê dikin, xwedêgiravî kurd jî divê karibin li gor xala 39an a peymanê mafên xwe bi kar bînin.

Ji bona ku mirov di derheqê bûyera Lozanê de xwedî helwestek rast be, divê rewş û helwesta kurdan a dema Lozanê bi awakî zanistî û objektîv bê nirxandin.

Ehemîyeta aktuelkirina Lozanê dibe ji bo propagandayê hebe. Lêbelê bi şertê ku wê Kurdistan perçe kirîye û hemû mafên milletê kurd têk birine. Ji bo ders

sitendinê: Bîryarên vê peymanê, bi gelê kurd da fêhm kirin ku divê ew pirsaxwe bi destê xwe çareser bike û ji bo wê helwestê bistîne. Herwiha wê têgîhand ku bi tirkan re wek hev (wek du biran) û bi hev re jiyana ne mimkun e, ji ber ku tirk bi xwe hebûna kurdan înkâr kirine û heta niha dikin û hemû mafên wan ji dest wan derxistine. Ew siyaseta tirkan bû sedemê ku rêberên kurdan (bi nîrxê ku jiyana xwe li ser kirin) dest bi tekoşîna ji bona Kurdistanê ser bi xwe bikin.

Hêvîdar im, bi derengî be jî têgîhiştin, helwest û tekoşîna rêberên kurdan ê dema piştî Lozanê ji cîlên nû re mirêk be.

Jêrenot:

- (1) Ejî Şatskîn, "Utopya i Tradîtsî, 1990. s. 133.
- (2) Tradîtsîv sovremennom obşestvê, 1990. s. 226-228.
- (3) Abdûrrahman Aslan, Samsun'dan Lozan'a Mustafa Kemal ve Kürtler.
- (4) Zekî Sarihan, kurtuluş savaşı günlüğü c.2. s. 228. Abdûrrahman Aslan, Samsun'dan Lozan'a Mustafa Kemal ve Kürtler.
- (5) Zekî Sarihan, s. 236.
- (6) Rozenberg, Avp. f. 0132. op. 6, por.N. 288, 1. 49.
- (7) Abdûrrahman Aslan, Samsun'dan Lozan'a Mustafa Kemal ve Kürtler.
- (8) Aralov S.Î. Vospomineniya sovyetskogo dîplomata (1922-1923), M. 1960. s. 107-108.
- (9) Avf R.F. F. 0132, Op. 6, Por.N. 288, Pap.N.133, 1. 111-112.
- (10) Bedir-khan K.A. La Question kurde. Paris, 1959. M.A.Hasretyan. Kurdî Turtsî... 1990. r. 47.

Şerefname û Şerefxanê Bitlîsî

Ebdulla Merdux

Wergera ji soranî: **Sidqî Hiorî**

Dîroka kurdan, careka din ji sedsala şazdê, û bi taybetî piştî şerê Çaldîranê (1514)ê hat ve hildan. Di destpêka sedsala şazdê de guhertinên nû bi ser hevrikatî û şerê di navbera herdu împeratûriyan de; Îrana Sefewî û Tirkîya Osmanî, li ser dagîrkirina Kurdistanê hatin û di navbera wan herdu împeratûriyên navbirî de rewş giha qonaxeka nûtir. Xuya ye ku mîr û mezinên eşîrên kurdan, li hember wan guhertinkariyan nikarîbûn bê alî û rûniştî bimînin.

Dewleta Sefewî mîna piraniya dewletên sedsalên navîn yên Îranê, pêkhatibû ji çend xelk û êl û eşîrên cor bi cor ku bi hêza şîr û rîman hatibûn rêxistin. Şahên sefewî baş dizanî ku ragirtin û parastina yekîtiya welatê Îranê yê berfireh û wan komelên xelkê yên ku tê de dijîyan û gelên cuda û xwedî rewşa xwe ya abûrî ya taybet, ne karekî sivik û hêsan e. Her ji bo vê çendê û bo rêxistina welatî û wan gelên cor bi cor hatin û dînê dewletê yê şî'î bi ser wan de zal kir. Di wî serûberî de Kurdistan, ku gelê wê sinnî bû û ketibû di navbera herdu dewletên dijî yek de, bû pirsra herî giring ya herdu welatan; Îran û Osmanîyan de. Liberçavgirtina siyaseteka taybet di warê kurdan de di destpêka programên wan de bû û pirsra Kurdistanê bû pirsgerêka siyasî ya aloz û kûr ya Îranê û Osmanîyan û hêvênê hevrikatiya wan. Ew dewlet baş li ser pêçêbûn û mîrxasiya kurdan di meydana şerî de agahdarbûn û giringiya cihê Kurdistanê yê stratejîk ku keftibû ser rêyên bazirganiyê li cem wan aşkerabû. Hindî ji wan bihata wan hewla dagîrkirina Kurdistanê dida û dema ku wan pê çênedibû, wan bala mezinên kurdan bi awayên cor bi cor ber bi aliyên xwe ve dikişand.

Şah Îsmâîlî, binyatvanê dewleta sefewî, duktirîna xwe ya siyasî li Îranê li ser bingeha qirkirina giş sinnîyan ku wî ew bi alîgirên dewleta osmanî dinasîn, danîbû. Siyaseta rahêlan û kuştina sinnîyan ku kurd jî vedigirtin û dabeşkirina welat û mîrgehên kurdî di navbera serdarên tirka yên qizilbaş de û kiryarên çepel li hember kurdan û ji navbirina sîstema karûbar û desthilatê ya malbatên Kurdistanê yên kevin ji aliyekî din ve bûn egera serekî û herî giring ya nerazîbûna mezinên kurdan li hember fermandarên sefewî.

Dewleta Osmanî, ku agahdariya wê li ser êrişa şah Îsmâîlî ber bi welatê wê ve hebû û pişgiriya Îranê jî bo 'elewîyên şî'e yên Anadolê didît, kefte hewl û bizavê ji bo peydakirina çareseriyekê. Di wê rewşa nazik de destên dewleta osmanî bi

dehmanên kurdan ve bûn. Bi navê hevbeşiya dînî û şerî li dijî rafiziyan, siyaseta dostîtiyê ligel kurdan bi dest xwe ve girt. Dewleta Osmanî bi wecdîtinê ji nifûza desthilata hekîm Idrîsê Bitlîsî, piştgirî û feydedîtin ji hêz û pêçêbûn û şervaniya kurdan ji xwe re misoger kir. Her di eynî wextî de çil hezar 'elewiyên şî'e, ku piraniya wan kurd bûn, bi tawana alîgiriya Îranê kuştin.

Şerefxanê Bitlîsî dinvîse ku bêtir ji bîst kesên ji mezinên kurdan bi rêya mela Idrîsê Bitlîsî nameyek bo sultanê osmanî nivîsî û wan tê de alîgiriya xwe bo wî diyar kir (1). Nivîskarê "Kitabî Diyarbekriye", Ebû Bekrê Tehranî dinivîse ku çil û şeş kes ji mîrên kurdan bi peyayên xwe yê çekdar ve di şerê Çaldîranê de beşdarbûn (2). Dîroknivîsan hejmara şervanên kurdan di wî şerî de ji sih û pênc hezar kesên bêtir nivîsiye (3). Beşdariya kurdan di wî şerî de giringiyeka weha hebû ku Şerefxan bibêje ku sultan ji bo daxwazên mezinên kurdan amadebû û ji bo dagîrkirina welatê Ecemistanê, ber bi Ermen û Azerbêcanê çû û li deşta Çaldîranê bi Îsmailê sefewî re şer kir (4). Xuya ye ku dijwarbûna kî n û hevrikiyê di hemû warên siyasî û abûrî de û ji wan pirsê kurd jî sedemên serekî yê serhildana şerê Çaldîranê bûn.

Siyaseta dewleta şah Îsmailî ya xwar û vîç û azardana wê bo kurdan ku rûniştivanên serekî yê devera şerî bûn û keftibûne di navbera du aliyên şerî de, sedema bingehîn ya şikestina Îranê bû di şerê Çaldîran de. Piştî wê şikestinê nifûz û desthilata siyasî û kulturî ya Îranê di nav kurdan de dest bi nizimbûnê kir. Şerefxan dinivîse ku desthilata qizilbaşan piştî karesata Çaldîranê li welatê Kurdistanê kêmbû (5). Bê bihabûna nifûza Îranê li Kurdistanê weha kûr bû ku heta îro jî berdewamiya wê heye. Li wê serdemê bo xwendin û nivîsînê, ji bilî behsên olî ku bi zimanê erebî bûn, zimanê farisî dihat bikaranîn. Piştî şikestina Çaldîranê mezinaên kurdan nava xwe û dewleta osmanî xweş kir û ji bin desthilata Îranê derkeftin û li sertaserê axa Kurdistanê mîrgehine serbixwe pêkanîn. Mîrên kurdan mîna şahên Îranê û sultanên osmanî ji xwe re dîwanxane û baregehên ciwan durist kirin û wan dest bi handana helbestvan û nivîskar û zana û hunermendan kir. Sercema van egeran wekir ku bi taybetî şaîrên kurd dev ji zimanê farisî berbidin û bi zimanê kurdî berhemên xwe binivîsin û bibin şaîrên resmî yê wan dîwanxane û baregehên. Tenahî û xurtbûna abûriyê bûn egera ku kultur û zanist jî xurt bibin.

Di serdemê şah Tehmasibî, cihgirê şah Îsmailî de, siyaset dijwar û tûj ya dewleta Îranê li hember kurdan, bi mebesta bi karanîna wan li dijî osmaniyan, kêmtir lêhat. Lê ew guhertinkarî weha nebû ku bikaribe dewleta osmanî tûşî kêşe û derdeseriyê bike, çinkî li Îranê hêj dijîtiya siyasî di navbera serdarên leşkerî yê tirkên qizilbaş yê reşmalvan û dîwanîyên kîşwerî de, li ser çawa birêvebirina welatî, nehatibû çareser kirin. Li gelek deverên Kurdistanê dijîti ligel hikumeta sefewî her wekî cran berdewam bû. Li sala 1529ê Zulfeqar Beg mîrê kurdên

kelhor li dijî hikumeta şahê Îranê serhilda û Bexda dorpêç kir û paşî dagîr kir û hemî axa Îraqê xiste bin destên xwe û serê xwe li ber sultan Silêmanê Yekemîn neçemand (6). Digel vê çendê, di siyaseta kurdistanî ya dewleta sefawî de, girêdayî kurdan, hinek guhertinkarî bi ber çav dikevin. Wekî mînak; şah Tehmasibî li sala 1553ê deverên Ebher û Zencan û Sultaniyê dan Xelîl Xaniyî, mîrê kurdên Siyamensûrê, bi mercekî ku mîrê navbirî sê hezar kesan ji çekdarên xwe bide digel leşkerê şahî (7). Her bi vî terzî jî di navbera şahî û mîrê kurdên Erdelan de, Zoraw begê yekcar baş bû (8).

Lê li Kurdistana Bakûr, dewleta Osmanî ku gehiştibû armancên xwe di zêdekirina erd û milkê xwe de û piştî şerê Çaldîranê Îran bi nizim û lawaz nas dikir, êdî çavên wê bi hindê ranedibûn ku kurdan serbixwe bibîne. Evca careka din siyaseta xwe ya kurdistanî li ber çavan derbas kir. Bi lênerîna dewleta osmanî êdî ew giringiya ku kurdan daran hebû nemabû. Wan, berûvajî peymannameya (1514), dest kir bi dijîti û îşkencedana kurdan (9).

Li gor wê siyasetê yek ji wan mîrgehên ku diviyabûya bihata hilweşandin, mîrgeha Bitlîsê bû, bona ku ji mîrgehê din re bibe dersek. Li sala 1597ê ew 760 sal bûn ku mîrgeha Bitlîsê di destên malbata Şerefxanê Bitlîsî de bû. Hikimdariya Bitlîsê dem bo dem, serbixwe û nîvserbixwe, di destên vê binemalê de bû. Hêzdarî û giringiya wê mîrgehê wisa bû, ku şah Îsmail bê sê û du li sala 1502ê serbixwebûna wê bi resmî binase. Lê piştî şerê Çaldîranê hikimdarên Bitlîsê aliyê osmaniyan girt. Dewleta Bitlîsê ya navçeyî, di warê siyaseta navxwe û derve de, siyaseta xwe ya serbixwe hebû. Leşkerekê bîst hezar kesî li ber destên wê dewletê bû, di wextê pêwîst de dikribû heta çil hezar kesan jî bide serhev. Şerefxan li ser giringî û nifûza mîrgeha Bitlîsê dibêje ku her demeka Îranê bixwesta Kurdistanê dagîr bike diviyabûya li berahiyê dijîtiya hikimdariya Bitlîsê û eşîreta Rojekîyan bikira û heta ku ew eşîret milkeç nedibû çî eşîreta din serê xwe nedîçemand (10). Eşîreta Rojekîyan, di dirêjahiya dîrokê de, herdem jî bo serxwebûn û azadiya xwe xebat kiriye. Bi gotina Şerefxanî di nav kurdan de tê gotin ku bi hejmarê berên di dîwarên kelha Bitlîsê de ne, eşîreta Rojekîyan serhildaye (11). Şerefxan behsê mînakekê balkêş li ser emekdariya bitlîsiyan û hezkirina wan ji mîrgeha xwe û herweha wê hesta ku wan li hember osmaniyan hebû dide:

”Li sala 1533ê, bi paldana hinek kesan, Şemsedîn beg, babê nivîskarê Şerefnameyê û hikimdarê Bitlîsê yê wê serdemê, tê bang kirin bo baregehê sultan Silêmanê yekemîn. Birahîm paşayê serwezîr berê xwe dide Şemsedîn begê û dibêjeyê sultanî welatê Bitlîsê ji te divêt û li şûna wî, welatê Melatiye û Mer’êstê dide te. Şemsedîn di bersivê de dibêjeyê ser û mal û milkê me hemî yên sultanî ne. Ji êla Baykiyan Mehmûd Emadan ku ji axayên Rojekîyan bû li wê derê bû. Wî bi zimanê kurdî got Şemsedîn begî piştî ku mîrat bo wî ma û îcaxa

Rojekiyani ji dest me çû, jiyana me bo çî ye. Eger tu emir bikî ev ez Brahîm paşayî didim ber xenceran, ev îro nêzikî 150 kesani ji eşîreta Rojekiyani li vê derê ne û em hemî dê di Oxir Ocaqê de bihên kuştin û em dê ji bo bîranînê, navekî di rûpelên dîrokê de bihêlin (12)”.

Dewleta Osmanî mîrgeha Bitlîsê ji destên Şemsedîn begî derxist. Ew jî neçarbû berê xwe da bo cem şah Tehmasibî, li Îranê. Piştî wê, gelek êl û eşîrên kurdan li dijî sultanî rabûn ser xwe. Şahê Îranê bixêrhatina Şemsedîn begî kir û naznavê xanî jî pêşkêşî wî kir û ew kir hikimdarê Sera û Miraxê.

Şemsedîn Xanî li Îranê, keça yekî ji mezinên qizilbaşan, ku hikimdarê Xurasanê bû, mehir kirû. Li sala 1534ê, li devera Kerehrûdî ya ser bi Qumê, wî kurek bû û navê wî kir Şeref. Hêj Şeref xurt bû dema ku dayka wî mirî û babê ew ji bo perwerdekirinê deynayî ber destên qaziyên Kerehrûdiyê. Akademîk Valdemîr Vilyamînov Zirnov yê ku Şerefname bo cara yekemîn çap kirî dinivîse ku wan qaziyani şagirdên xwe bi riha zanist û rêzgirtinê bo zanînan û zanistê perwerdedikirin (13). Şeref her ji zaroktiyê hînî xwendin û nivîsînê bû û li gor adetên wê serdemê diviyabûya ew bi şehzade û kurên necîbzadeyan re di baregehê şahî ve bihata xwedî kirin. Her li wê derê baş hînî zanistên wê serdemê mîna qanûn û şerîetê bû. Şerefxan di serhatiya xwe de dibêje ku şah Tehmasibî ew hertim pal didan ku xwe hînî hunerê resimkirinê bikin û digot wan ku carûbara dest bidin hunerê resimkirinê, ev huner tama mirovî dixemilîne (14).

Dema ku Şemsedîn xan pîr û perîşan bû, li ser daxwaza wî û mezinên eşîra Rojekiyani, şah Tehmasibî kurê wî Şerefxan deyna cihê wî û kire hikimdarê Şîrwan û Mehmûd Awa û cihine din. Piştî sê salan hat ve bo baregehê şahî û digel şahî çû Hemedanê. Li wê derê Şerefxan dikeve dilê Mehemed begê, hakimê Hemedanê, ku yek bû ji mezinên qizilbaşan û ew keça xwe li wî mehir dike. Şerefxan sê salan li wê derê dimîne.

Li sala 1559ê şehzadeyê osmanî, sultan Bayezîd, ji ber gelek sedeman ji dewleta osmanî dilgiran dibe û diçe Îranê. Şerefxan ji wan kesani bû yê ku beşdarbûbûn di gotûbêjan de digel wî şehzadeyî. Di dema gotûbêjan de casûsên şahî dibêjine şahî ku Şerefxan hertim aliyê dewleta osmanî digire. Ji ber hindê şah li Şerefxanî bi şik dikeve û wî dûr dixê bo devera Gîlanê û her di eynî wextî de ew dibe berpîrsê vemirandina serhildana Xan Ehmed Xanê Biye Pîş li Gîlanê. Şerefxan wê serhildanê dişkêne û dibe hikimdarê wê deverê. Bi vî awayî bo dema pazde salan hikmê çend deveran li Îranê di destên wî de bû û heyamekî jî li baregehê şahê Îranê kar kir.

Piştî mirina şah Tehmasibî, li ser cihgirê şahî, hevrikatî û dijîtî kefte nav mezinên qizilbaşan. Her wekî Hesên Rûmlû dibêje ku lertzik hate seyd û qazî û mela ji ber paşeroja jiyana wan û ew ji xelkê û Xudê û serhildanan tirsiyani. Şerefxanî ku demekê zûtir hest bi metirsiyê kiribû û nîşana nerazîbûnê jî pêve

diyarbûbû, hertim di hizra hêlana Îranê de bû. Şerefxan di serdema şah Îsmâîlê Duyemîn de, cihgirê şah Tehmasibî, bûbû Emîr el-umera' el-ekrad, her demeka ku kar û xizmeteka mîr û mezinên Kurdistan û Luristan û Goran û êlên din li koçka şahî hebûya, diviyabûya wan li pêşiyê Şerefxan bidîta. Pile û payeya Şerefxanî, bû egera kerbjêvebûn û dijîtiya mezinên qizilbaşan li hemberî wî û ji bona ku wî bê biha bikin, wan gelek buxtan û gotin bi dû Şerefxanî xistin. Şahî bawer ji wan gotinan kir û bi navê bi dest girtina hikumeta Nexcewan, ew hate şandin bo wê derê û ji karûbarên baregehê şahî hate dûrxistin (1577). Şerefxanî ev bi delîveyekî zanî ku ji aliyê Xudê ve bo wî hatiye û her wê, rêya vegera wî bo welaî xweş kir. Piştî salekê û çend mehan digel çwarsed kesan ji hevalên xwe, xwe gihande Bitlîsê (1578). Kenkeneyên dewleta osmanî bi xêrhatineka baş li wî kir û hikimdariya ji bab û kalan ve jê re mayî ji wî re wekî xelat hat ve pêşkêş kirin.

Şerefxanî li sala 1594ê dev ji hikumetê berda û kurê xwe Şemsedîn beg deyna cihê xwe û jiyê xwe yê mayî ji bo nivîsandina Şerefnameyê terxan kir. Weha xuya dibe ku li sala 1586ê Şerefxanî dest bi nivîsandina bergê Şerefnameyê yê yekemîn kiribe. Xwediyê Şerefnameyê piştî nivîsandina berhema xwe gelek nejiyaye. Sala koçkirina Şerefxanî ne zelal e, lê dibe ku wî di navbera salên 1598ê û 1599ê ji dinyayê koç kiribe.

Di dûmahiya sedsala şazdeyê de gelek pirtûkên dîrokî bi zimanê farisî hatine nivîsandin. Piraniya wan kitêban ji aliyê dîroknivîsên baregehê şahî ve hatin nivîsandin û em dikarin bibêjin ku hemîyan aliyê kar û kiryarên şahên sefewî girtiye, ew dîroknivîs bi xwe çavdêrên karesatan bûn û hemî terzên belge û ferman û senedeyên dewletê li ber destên wan bûn. Şerefname yek ji wan berhema e yên ku di sedsala şazdeyê de hatiye nivîsandin. Ev berhem serûkaniyeka pir giring e bo dîroka kurd û Kurdistan û Îran û Osmanî û welatên dewrûberan di sedsalên pazde û şazdeyê de. Şerefname bi zimanê farisî hatiye nivîsandin û di du bergan de ye. Bergê yekemîn piştî destpêkê ji çwar beşan û paşkoyekê pêk tê û sercema behsa vî bergî li ser dîroka mîrgeh û êl û eşîrên kurdan e. Bergê duyê, ku bi navê xatîme naskiriye, behsê dîroka sultanên osmanî û şahên Îran û tûranan dike. Li cihê xwe ye em bînin bîra we ku di beşê sêyê, parça nehê, tayê duyê, geha duyê de ku pêhatiye ji dwazde parçeyan, parçeya heftê behsê mîrên zerza û parça heştê behsê mîrên estûnî û parçeya nehê behsê mezinên dasnî dikin, di Şerefnameyê de neniwîsandî mane. Mamoste Q. Kurdoyêf di destpêka çapa wergera kurdî ya bergê yekê ya Şerefnameyê de, ku ji aliyê Mela Mehmûd Bayezîdî ve hatibû çêkirin, dinivîse ku Mehemed Emîn Bozarslanî ew beşên neniwîsandî dîtine û di wergera kurdî ya navbirî de di cihê xwe de hatine deynan! (15). Ev gotine ne rast e, xuya ye ku hema Şerefxanî ew beş neniwîsandine, evca yan metiryalê wî karî di destên wî de nebû yan jî hema ji

binyatî de ji bîra wî çûbû. Çinkî di destnivîsên Şerefnameyê de ew beş berçav nakevin.

Ji ber ku Şerefxanî ew berhemê xwe li welatê osmaniyan timam kir, aliyê tirkên digire, lê xuya ye ew kar ne bi dilê wî ye û rengekê neçarbûnê pê ve diyar e. Heta, em dikarin bibêjin ku wî ew kar ne li gor hest û heza xwe kiriye. Di warê dewleta sefawî de, heta hedekê mezin, bê alîgirî behsê karesatan dike, her ev ya ku di Şerefnameya Şerefxanê Bitlîsî de ye, ku alîgiriya lênerîna resmî ya dewleta sefawî yan ola şî'eyan nake, vî berhemî ji berhemên din cuda dike û gicingiyeka mezin dideyê.

Gelek cara pirsyarek tê kirin, ew jî gelo Şerefxanî bo çî armançê Şerefname nivîsiye. Nivîskar bi xwe di vî warî de dibêje ku nivîskarên dîroka kevin û nû, di çî serdemê de behsê mezinên Kurdistanê û çawatiya rewşa wan nekirbû û di wî warî de çî kitêb nenivîsandibûn evca ket hizra min ku pirtûkekê li ser serhatî û kar û kiryarên wan binivîsim. Ew tiştên ku min di dîrokên 'eceman de dîtine û ji xelkê di nav salde çûyî bihîst û tecrube kirine û bi rastî zanîne, min ew nivîsandine û navê Şerefnameyê lêkiriye, bona ku nav û dengê binemalên mezin yên Kurdistanê nehên veşartin û winda kirin (16).

Me got ku Şerefname li welatê osmaniyan hat nivîsandin, lê xuya ye ku hizir û meteryalê vî karî li Îranê bi dest keftiye û her li wê derê jî, wî bîranînên xwe nivîsandine. Eger ew nikaribûya vebigeryaya welatê xwe, dê wî ew li Îranê timam bikira. Lê çarenivîsa nivîskarî û berhemê wî, ew bû ku vebigerin welatê osmanî. Armanca Şerefnameyê ji di ne li ber çav girtina hez û xwesta nivîskarî û hezkirina wî ji welatê wî de, ew bû ku pirsgirêk û giringiya kurd û Kurdistanê, li berçavên şahê Îranê, şah Tehmasibî yan sultanê osmanî zelaltir bike. Me got ku di wê serdemê de guhertun bi ser siyaseta şahî de li hember kurdan hatin. Her çend e heta niha jî çî belgeyek li ser hindê di destên me de nîne û nivîskar jî qala hindê nake, lê weha xuya dibe ku Şerefxan bi handana şah Tehmasibî keftibe hizra nivîsandina Şerefnameyê. Çinkî, ji bilî ne şehrezahiya karbidestên dewleta sefawî di warê kurd û Kurdistanê de, di wê serdemê de 'adet bû ku şah û şehzade dest bidin nivîsîna pirtûkan. Mînak li ser hindê şah Tehmasib bi xwe xwediyê pirtûkekê bû bi navê "Tezkiret el-Tehmasib" û birayê wî Sam mîrza nivîskarê pirtûkekê bû bi navê "Tuhfeê Samî".

Ji aliyekê din ve xwediyê Şerefnameyê di baregehê şahê Îranê de, bi birêveberên dewleta Îranê re tîkel bûbû û bi başî şehrezayê siyaseta Îranê li hember kurdan bûbû. Şehreza bûbû li ser siyaseta dewleta Îranê û nemaze li ser wan tirkên reşmalvan yên qizilbaş di warê ji navbirina kurdan û mîrgehên wan de. Şerefxan, herweha, li ser siyaseta dewleta osmanî, di warê kurdan de agahdarbû, ew jî li delîveyekê digeran bo ku kurdan ji nav bibin. Îranê û osmaniyan bi navê bergiriyê ji ola îslamê ya paqij û cîhadê li dijî kafiran şer dikir, lê armanca wan

ya rastîn dagîrkirina Kurdistanê bû, di her şerekê ku wan dikir can û malê kurdan bû ku tê de ji nav diçû. Di wan serûber û rewşên nazik de her çend eşîrên kurdan, bo parastina can û malê xwe, xwe dabûn aliyê yekê ji van dewletan, evca ku şerî dest pê dikir yan bi dawî dihat, wan dewletan, ji bo tol vekirinê, li vî aliyê û li aliyê din êriş dibirin ser kurdan û qir dikirin. Di çavkaniyên vê serdemê de gelek belge hene ku diyar dikin ka çawa mal û halê kurdan bi destên leşkerê Îranî û osmanî hatin kavi kirin. Şah Tehmasib di "Tezkiret el-Tehmasib" de dibêje em diçûn ravemasiyê, di nîva rêyê de em rasthevî bîst kesên pîr bûn, me pirsyar ji wan kir hûn kî ne û dê ber bi kî ve biçin, wan got em xelkê Xinosê ne, cihê me hatiye wêran kirin û eger em li wê derê bimana dê em ji birçê bimirana, niha jî hûn dibînin em ber bi Diyarbekrê diçin. Nivîskar dibêje ji bo halê wan giriya min hat û kerbên min ji wan kesên ew kar kirî vebûn. Kesê ku ew kar kirî Elqas mîrza, birayê şahî bû (17). Hesên Rûmlû jî dibêje ku welatê Erzincanê di bin simên dewarên leşkerê şahî ve bi yekcarî wêran bû. Agir berda bajarê wan û talan kir û ji nav bir (18). Ev kuştin û wêrankarî hertim dubare dibû ve û vê bi awayekê ciddî hebûna kurdan xistibû ber metirsiyê. Xwediyê Şerefnameyê hest bi wê metirsiyê kiribû û wî bi nivîsandina, da ku serhatiyên malbatên mezin yê Kurdistanê nehên veşartin û ji bîr kirin, hest û xwestên xwe û armanca nivîsandina Şerefnameyê bi ziman xistine. Di hemî rûperên Şerefnameyê de nivîskar bêzariya xwe ji pirt û belavbûna mezinên kurdan diyar dike û xemê ji hindê dixwe ku kurdan di nav xwe de yekîti nîne û ew, sedema neserkeftina wan, di vê cudabûn û pirt û belavbûna wan de dibîne û herdu dewletên Îran û Osmanî bi dijminên kurdan li qelem dide.

Piştî Şerefnameyê bê dengiyeka bil'ecêb di dîroknivîsîna kurdî de peyda dibe, ev di demekê de ku rola êl û eşîrên kurdan li deverê di her warekî de her giring bû. Zanyarî li ser kurd û Kurdistanê di destpêka sedsala hevdeyê û heta dawiya sedsala hejdeyê de, di berhemên dîroknivîsîna ereb û faris û tirk û li vir û li wir, di pirtûkên dîroka Îran û Osmanî û gerok û diplomatên derve de, digel karesatên wan welatan tîr berçav kirin. Di dûmahiya sedsala hejdeyê de, bo cara yekê, adeta nivîsandina dîroka deverê ku zehrîkrineka tima bû bo Şerefnameyê, li Kurdistanê Erdelanê ser hilda. Di wê serdemê de herdu emperatûriyên Îran û Osmanî sist û lawaz bûbûn û mîr û mezinên êl û eşîrên kurdan yê xwedî desthilat dest dabûn xebata azadixwaz. Li Kurdistanê Erdelan Xesrew Xanê Gewre (1754-1791) neku bes şiya hemî dijmin û nehezên xwe yê deverê ji nav bibe û bi ser wan de serbikeve lê hemî, ew kesên ku hewil didan paşatiya Îranê bixin nav destên xwe de, ji nav birin û ew tek-kite kes bû ku karî paşatiya Îranê bixe nav destên xwe de. Sine di wê demê de navenda hikumeta Xesrew xanî bû û ew her ji kevin de bingeha kultur û zanistê bû li hemî Kurdistanê. Waliyên Erdelanê yê ku baregehên hikimdariya Îranê û Osmanîyan dîtibûn hewil didan

wekî wan ji xwe re baregeh û koçk û kelheyên saz bikin. Wan şaîr û zana û nivîskar û hunermend û wergervan li cem xwe dihiştin û ew ji bo karên nû pal didan. Hinek ji waliyan bi xwe şaîr û nivîskar jî bûn û her ji ber hindê jî Kurdistanê Erdelan bûbû navenda desthilata siyasî û abûrî û kulturî li Kurdistanê Başûr. Ji aliyekê din ve piraniya rûniştivanên wê deverê dev ji jiyana keçerî û eşîriyê berdabû û ew demeka dirêj bû ku ew binetî bûbûn. Akincîbûn û tenahî û rewşa abûrî ya baş, bû egera hindê ku zanist û kultur jî li wê deverê pêş bikeve. Ji medreseya Darûlîhsan ya Sineyê, şaîr û nivîskar û melayên mezin derkeftin û ji gelek cihên dûr, feqê dihatine Sineyê û li ber destên zanyaê vî bajarî, hînî zanistan dibûn. Her ji ber hindê digotine Sineyê "Dar el-'ilm" (19).

Her li vî bajarî xwendîngeha dîroknivîsiya deverê pêk hat û bo cara yekê di dîroka Kurdistanê de dîroknivîsên Erdelan, berdewamî da wê xwendîngehê ya ku Şerfexan binyatvanê wê bû, û digel nivîsandina wan bo çend timamkirinên Şerefnameyê, wan bi xwe gelek pirtûkên serbixwe yên dîrok û cografyayê, ku hemî bi zimanê farisî ne, nivîsandin.

Dîroka yekemîn ya ku wekî Şerefnameyê hatî nivîsandin "Zubet el-tewarîx" e. Ev berhem dîroka giştî ye û Mehemed Şerîfî, qaziyê Erdelanê (li sala 1747ê hatibû dinyayê) bi zimanê farisî nivîsiye. Ev berhem ji duwazde beşan pêkhatî ye. Deh beş jê li ser dîroka pêxemberan û îslam û dewletên gelên musulman in bo heta serdema nivîskarî. Beşê yazdeyê bi navê li ser kurdên Goran û binyatê waliyên Erdelan e, ji sala 1215ê heta 1801a zayînî. Beşê duwazdeyê dîroka Qaçara ye. Ev berhem hêj nehatiye çapkirin (20). "Zubet el-tewarîx" paşî bû modêl û hêvîyê nivîsên dîroknivîsên kurd yên devera Erdelan. Bo nimûne Xesrew kurê Mehemed kurê Menûçerî berhemê xwe yê bi navê "Lubbê tewarîx" (21) ku li sala 1833ê nivîsiye, wekî "Zubet el-tewarîx" darişt. Mah Şeref Xanimê jî pirtûka xwe ya bi navê "Tarîx el-ekrad" ku bi "Tarîx Erdelan" (22) bi nav û deng e wisa nivîsandiye.

Ew timamkirinên ku bo Şerefnameyê hatine nivîsandin, bi giştî, timkerên beşekî yan pareçeka Şerefnameyê ne, ku li ser mîrgehekê yan eşîrekê ne. Dîroknivîsê ku timamkirineka durist, yanî hemî beşên bergê yekê yê Şerefnameyê nivîsandin, mela Mehmûdê Bayezîdî ye. Ev berhem bi navê "Tewarîxê cedîdê Kurdistanê" (23) bi zaravê kurdiya bakûr li sala 1857ê bi handana kurdnasê rûs Elikşander Jabayî ku li wê serdemê kunsulê Rûsya bû, li Erzerûmê, nivîsî. Deqa vê pirtûkê pêkhatiye ji destpêkekê û yazde beşan ku li cihê daxê ye windabûne û heta niha nehatiye dîtin. Destpêk Jabayî kiribû Fransî û deqa ne wergerandî li ber destan e. Mela Mehmûdî, herweha, bergê yekemîn yê Şerefnameyê kiriye kurdiya bakûr (ev werger ne ya hemî beşên Şerefnameyê ye û ne timam e) û bi navê "Tewarîxê qedîmê Kurdistanê" belavbûye (24).

Yeka din ji van timamkirinan ku bo beşê dîroka Donboliyan hatiye nivîsandin,

berhemê şair û dîroknivîsê bi nav û deng ê baregehê hikimdarên Qaçaran, Ebulrezaq begî kurê Necefqulî Xanê Donbolîyê ye (1762-1827), ku naznavê wî yê şîirî Meftûn bû. Ev berhem bi navê "Tarîxê Denabile" (25) navdar e û li serdema Fetih'elî şahê Qaçaran, bi zimanê farsî hat nivîsandin û hêj nehatiye çapkirin.

Dîroknivîsên Erdelanê du timamkirinên Şerefnameyê afirnadine û ew jî bo beşê dîroka Erdelanê ne. Yek ji wan ji aliyê Mehemed Îbrahîmî kurê mela Huseynê Erdelanî ve hatiye nivîsandin û behsê bûyeran, ji wî cihê ku Şerefxan gihastiyê (1596)ê heta sala 1810ê dike. Vî berhemî navê xwe yê taybetî nîne, lê di ketelogan de bi navê "Tarîxê Erdelan" hatiye binavkirin (26). Berî niha bi çendekê bi terzekê yekcar neşehreza hat çapkirin (27).

Ya duyê ji aliyê Îsmâîlî, kurê mela Huseynê Erdelanî ve (li sala 1776ê hatibû dinyayê), dibe ku birayê Îbrahîmê navbirî be, hatiye nivîsandin. Ev berhem jî bi navê "Tarîxê Erdelan" navdar e. Nivîskarî dîroka xwe ji destpêka damezrandina mîrgeha Erdelan, yanî ji sedsala dwazdeya zayînî dest pê kiriye heta dawiya sedsala şazdeyê, ku her ji Şerefnameyê nivîsandiye û timamkirina wan bûyeran heta serdema Xesrew Xanê Duyemîn, anku Xesrew Xanê Nakam 1829ê, wî bi xwe nivîsandiye. Ev pirtûk jî bi zimanê farisî ye û heta niha nehatiye çap kirin.

Li sala 1868ê li bajarê Sineyê namîlkeyek bi navê "Şerih halat emîr Suleyman bêg û selatîne Bane û hukumranî anha" (Serhatiya Silêman begê û sanên -mîrên-Baneyê û hukmê wan) ji aliyê dîroknivîsekê nenaskirî ve hatiye nivîsandin. Her çend e nivîskar çî behsê Şerefnameyê nake, lê xuya ye ku ew ne yê bê agah bû ji beşê dîroka hakimên Baneyê di Şerefnameyê de (28).

Li Kurdistana Mukrî, ku navenda wê bajarê Sablax e (Mehabad), du kesan dom da behsê dîroka Mukiryane di Şerefnameyê de. Yê yekê Mîrza Mehmûd Baneyî ye ku li sala 1842ê bi emrê Budaq Sultanî karê xwe bi zimanê farisî nivîsandî (29). Berhemê duyê ku pir kurt û kêmnaverok e, bi destê Mîrza Îsmâîlî kurê mela Elî Şêwezûrî, li sala 1842ê, bo Ebdulla Xanê Mukrî, bi zimanê farisî, bi navê "Şerhu halî Ebdullah Xan Mukrî" (Serhatiya Ebdulla Xanê Mukrî) hat nivîsandin (30). Ev berhem nehatine çap kirin, lê wergerên wan yên kurdî li ber destan in.

Li Kurdistana Bakûr jî domandîneka Şerefnameyê li ser mîrgehên kurdî yên wê derê, bi zimanê tirkî heye, lê mixabin ku heta niha nivîsevanê vê lêkolînê çav pê nekeftiye (31).

Deqa Şerefnameyê, bergê yekê, bo cara yekemîn li sala 1860ê, bi hewl û têkoşîna Vlademêr Vilyamînov Zirnovî li San Petersburgê hat çap kirin, bergê duyê jî, her ji aliyê wî ve, li sala 1862ê derkeft (32).

Li sala 1930ê, li Qahîreyê, çapeka din ya bergê yekê ji aliyê şêx Fereculla Zekî û Mehemed Elî Ewniyî ve belavbû (33). Li sala 1964ê Mehemed Ebasî çapa Qahîreyê ser ji nû ve bi Ofsête li Tehranê derxist (34).

Şerefname hatiye wergerandin bo gelek zimanan, wekî fransî, elmanî, erebî, tirkî û kurdî. Li dawiya vî behsî pêwîst e ku em bibêjin, ku ji ber siyaseta dijî gelê kurd ku ji aliyê hikumetên Îranê ve têt birêvebirin, Şerefname ku bi zimanê farisî ye, li Îranê nekeftiye ber lêkolînan û nehatiye çapkirin. Ew herdu çapên ku li ber destan in, li derveyî Îranê hatine çapkirin, û ji ber ku di wan çapxaneyan de pîtên (p, ç, j, g) nebûn, li şûna wan ev pît (b, c, z, k) hatin bikaranîn û vê, deqa wan çapan di rojgara me de kêmbiha kirin. Xuya ye ku gelek destnivîsên din yê Şerefnameyê hatine dîtin, ku di dema çapkirinê berê de çî agahdarî li ser nebû, û ji ber hindê jî pêwîst e ku çapeka zanistî û nû ya Şerefnameyê bête gihandin bo ber destên hogir û zanayan.

Stokholm

25.05.1998

Perawêz (Têbinî) :

1. Şerefxan ibin Şemsedîn Bedlîsî, Cildê evel ez kîtabê Şerefname, ke bi îhîmamê eçelû 'îbad Vladîbêr muleqeb Vilyamînof Zirnof, der mehruseê Pitirburx der Dar El-Tîba' Ekadîmîyeê Împîraturiyê seneê 1860 'Îsewî mutabiqê seneê 1276 Hicrî metbu' gerdîd. Sefhe 416.

2. Ebu Bekrê tehranî, Kîtabê Diyarbekrîye, cuz'ê duwem, Ankara, 1964, s. 89.

3. M. Î. Şemsî, Şerefxan Bedlîsînî "Şerefname" eserê kurd xelkinin tarîxî menbe'î kîmî, Bakî 1972, s. 62 (bi zimanê ezezrî).

4. Şerefname, cildê evel, s. 416.

5. Her ew çavkanî, r. 266.

6. N. W. Pîgoloskaya, Î. Pîtruşefîskî,tarîxê Îran, trecumê Kerîm Kişawerz, Întîşaratê Peyam, çap Pencemê, Tehran 1363, s. 482.

7. Her ew çavkanî, r. 479.

8. Tarîxê Xesru bin Mehemed benî Erdelan, çapê 'eksî ez ruy nisxeê xetî tercumê bi rusî, muqedime, te'liqat ve fihresthayê ez A. A. vasîlîva, Mosko 1984, s. 14a.

9. Mehemed Emîn Zekî, Xulaseyekî tarîxî kurd û Kurdistan, cildî yekem, Bexdad 1931, r. 166.

10. Şerefname, cildê evel, s. 360.

11. Her ew çavkanî.

12. Her ew çavkanî, r. 441.

13. Her ew çavkanî, destpêka Vladîmêr Vilyanov Zirnov bi zimanê fransî, r. 5.

14. Her ew çavkanî, r. 450.

15. Mela Mehmûd Bayezîdî, Tewarîxê qedîmê Kurdistan, ji çapkirina Q. K. Kurduyêf û J. S. Mûsailyan, Mosko 1986, destpêka Kurduyêf û Mûsailyanî bi zimanê rûsî, r. 14.

16. Şerefname, cildê evel, r. 7-8.

17. Şah Tahmasibê Evel, Tezkîret El-Tahmasib, Kelkite 1912, s. 58.
18. Hesen bîg Rûmlu, Ehsen el-tewarîx, cildê duvem, kelkite 1932, s. 334.
19. Mîrza Şukrîllahê Sinindecî "Fexr el-kîtab"; Tuhfeê Nasirîye, teshîhê H. Tebîbî, Tehran, İntîşaratê Emîrê Kebîr 1366, s. 14.
20. E. G. Browne, A descriptive catalogue of oriental MSS belonging to the late E. G. Browne, Combridge 1932, p. 103.
21. Navê durist yê vê pirtûkê "Lub el-tewarîx" e ku bi hisêba ebcêdî 1249a koçî sala nivîsandina wê ye, navê nivîskarê wê jî "Xesru bin Mehemed bin Menuçehrê Erdelan" e, li sala 1977ê ji aliyê binemala Erdelan ve li Tehranê hat çapkirin. Çapeka wê ya din jî bi bîzava xatû Vasîlyêva keft ber destan. Pirtûk dîrokeka giştî ye û di herdu çapan de bi tenê beşê dîroka Erdelanê ber bi çav bû.
22. Mah Şeref Xanim "Mestûre", Tarîxê Erdelan, teshîhê Nasir Azadpûr, Sinindec 1946.
23. Nivîskarê vî behsî nivîseka xatû Vasîlyêvayê kiriye kurdî bi navê "Mêjûyekî winbûy Kurdistan" ku destpêka pirtûka winbûyî ya mela Mehmûdê Bayezîdî ye ku A. Jabayî kiribû fransî. Ev nivîs dê di van nêzîkan de bihêt çap kirin.
24. Li perawêza hejmar 15 binere.
25. A. D. Papazian, Novie istochniki po istori kourdsokogo neroda, in. Strani i nerodi blizhnego i srednego vostoka, vol. VII, (bi zimanê rûsî) Kourdovedenie. Erevan, 1975, pp. 209-224.
26. W. H. Morley, A. descriptive catalogue of the historical manuscripts in the arabic and persian language, preserved in the library of the royal Asiatic Society of Grate Britain an İrland, London, 1864, p. 147.
27. Mehemed İbrahîm Erdelanî, Tarîxê Erdelan, teshîh Nesrîn Birna we Enwer Sultanî, Siwîd 1997.
28. Nivîskarê vî behsî hemî timamkirinên Şerefnameyê ji çapê re amadekirine.
29. Ev herdu timamkirin Husên Hiznî Mukiryânî kirine kurdî û di namîlkeyekê de bi navê Lapereyêk le dîrêkî.... çapkirine.
30. Kamal Fuad, Kurdische handschriften, Wiesbaden, 1970.
31. Kopyeka vê timamkirinê li cem Martîn von Brownsenî ye.
32. Li perawêza hejmar yek binere. Bergê duyemîn yê Şerefnameyê, deqa farisî, li sala 1862ê hat çap kirin.
33. El-emîr Şerefxan El-Bedlîsî, Şerefname, bîse'î Ferecillah Zekî El-Kurdî, Qahîre 1931.
34. Emîr Şerefxan Bedlîsî, Şerefname tarîxê mufeselê Kurdistan, muqedime ve te'liqatê Mehemed Ebas, Tehran, İntîşaratê 'İlmî 1343.

Pirmaneyiya întegrasyonê û pêwistiya dabeşkirineke nû

Osman Aytar

penaberî û hin pirsên bi wê ve girêdayî îro ji pirsên herî mezin ên dinyayê tîn hesabandin û li gor wê jî munaqêşe li ser wan dibe, nêrîn û pêşniyar tîn îfadekirin. Pirsê întegrasyonê¹ yek ji wan e û wekî termê jî întegrasyon yek ji ew terman e ku di lêkolînên li ser pirs û pirsgerêkên penaberiyê de xwediyên cihên girîng in. Taybetî jî piştî ku bûyeran bi gelek aliyên nîşan dan ku polîtîkayên asîmîlasyonîst an segregasyonîst² rê li ber gelek problemên civakî vedikin, polîtîkayên ku bi gotina întegrasyonê tîn binavkirin aktûeltir bûn. Êdî li welatên ku lê grûbên penaber henin, her roj di radyo û televîzyonan de, di çapemeniyê de gotîna întegrasyonê bûye yek ji termên herî mode.

Kurdên ku li dervayî Kurdistanê û welatên kolonyalîst dijîn jî, wekî mînak li welatên Avrûpayê, rasterast an jî bi awayekî din marûzê polîtîka û encamên ku di warê munaqêşeyên li ser întegrasyonê de xwediyên cihên girîng in dibin. Ji ber vê yekê jî întegrasyon wekî fenomenek, di jiyana kurdan de jî xwediyê maneyeke aktûel e û têkiliyên kurdan û mirovên xwecih ji nêzva elaqeder dike.

Mirov dikare bipirse, gelo ma terma întegrasyonê bi serê xwe beyî ku bê spesîfîkekirin xwediyê çi manan e? Kar, têkilî û hîs xwediyên kîjan giranî ne li ser întegrasyonê? Întegrasyon li kuderê jî asîmîlasyon û segregasyonê cuda dibe yan jî ew her sê term jî aliyê mane çuqas di nav hevdu de ne? Întegrasyon termeke ku bi tenê penaberan an jî penaber û mirovên xwecih bi hev re elaqeder dike? Bêşik pirs û pirsgerêkên derbarê terma întegrasyonê pir in.

Di vê nivîsa xwe de pêşî ez dê bi kurtayî behsa nêrînên hin lêkolîneran ên li ser terma întegrasyonê û hin mane û dîmensiyonên bi wê ve girêdayî bikim. Dû re jî ez dê li ser pêwistiya spesîfîkekirina terma întegrasyonê û pêwistiyanê ve spesîfîkekirinê pêşniyar, bîr û baweriyên xwe bi hin xetên giştî bînim ziman.

Çend nêrînên li ser întegrasyonê

Li ser mane û dîmensiyonên³ întegrasyonê nêrînên cuda cuda hene. Carnan wusa dibe ku întegrasyon di şûna asîmîlasyonê de tê bikaranîn û carnan jî

berpirsiyarên dewletan ji bo ku polîtîkayên xwe yê segregasyonîst veşêrin, pevya întegrasyonê bikar tînin. Ev tevlihevî tenê ne di warê polîtîkayên aktûel de heye, herweha di nav lêkolîneran de jî li ser terma întegrasyonê nêrînên gelek jihevçuda hene.

Li vir ez dixwazim behsa sê nêrînên ku di warê pirs û pirsgerêkên penaberiyê de ji aliyê dabeşkirina terma întegrasyonê balkêş in bikim. Yek ji van nêrînan a sosyologê amerîkî Milton M. Gordon e ku di salên 60'î de li Amerîkayê li ser asîmilasyonê, întegrasyonê û jiyana grûbî ya hindikayiyarî lêkolîneke berfireh çêkiriye. Xebata Gordon, taybetî jî ji aliyê teorî û pêvajoyên asîmilasyonê wekî xebateke klasîk tê qebûl kirin. Di gelek munaqeseyên li ser penaberî û têkiliyên wan ên bi civata ku ew tê de dijîn de tesîra ew dabeşkirina asîmilasyonê ya Gordon heye.

Li gorî Gordon pêvajoyên asîmilasyonê heft in û bi taybetmendiyên jêrîn tînin karakterîzekirin.⁵

Asîmilasyona kulturî: Guherandina kulturên grûbên penaber û hakimkirina kultura civata xelkê cih.

Asîmilasyona strûktûrî: Di sewîyeya mirovên xwecih de di rêxistin û dezgehên de beşdar bûyin.

Asîmilasyona malbatî: Zewaca înteretnîk⁶ di sewîyeyeke berfireh de.

Asîmilasyona kesayetî: Xwe ji civata serdest hîskirin.

Asîmilasyona helwestê: Jiholêrabûna pêşhukuman.

Asîmilasyona rabûn û rûniştinê: Jiholêrabûna dîskrîmînasyonê⁸.

Asîmilasyona sivilî: Jiholêrabûna dijberiya derbarê hêjayî û desthilatdariyê.

Nêrîna duyem a Anders Lange ye ku li Swêdê li Unîversîteya Stockholmê kar dike. Lange ku li ser penaber û penaberiyê xwediyê bi dehan xebatan e behsa ne di cihê xwe de bikaranîna terma întegrasyonê dike, bal dikêşîne ser lêkolîneke kanadeyî¹⁰ ku di şûna întegrasyonê de pîvanên wekî dereceya înkorporasyonê¹ û di bijartina organîzasyonan de rola tercîhên etnîkî bikartîne û dibêje ku, divê ev terma întegrasyonê di lêkolînan penaberiyê de neyê bikaranîn. Li gorî Lange terma întegrasyonê, taybetmendiyeye sîstemî ye û nikare di pirsên etnîkî de bê bikaranîn, ji ber ku kategoriyên etnîkî ne sîstem in. Lange di şûna terma întegrasyonê de îfadekirinên pir bi detay û kompleks pêşniyar dike!¹²

Nêrîna sêyem a Jose Alberto Diaz e ku li Swêdê li Unîversîteya Uppsalayê di warê sosyolojîyê de teza xwe ya doktorayê³ li ser întegrasyonê nivîsandiye û dû re jî xebata xwe ya li ser întegrasyonê dewam kiriye. Diaz behsa pîrdimensiyonî û pîrmaneyiya terma întegrasyonê dike û ji ber vê yekê jî vê termê dabeşî du

perspektîfên kompleks dike; perspektîfên *vertîkal* û *horîzontal*¹⁴. Li gorî Diaz, perspektîfa vertîkal di nav xwe de dabeşî sê dîmensiyonan dibe!¹⁵

Dîmensiyona makro: Fokûs li ser tîkiliyên civakî û dezgehî ye.

Dîmensiyona mezo: Fokûs li ser strûktûr, aksiyonên navxweyî û hebûnan¹⁶ e.

Dîmensiyona mîkro: Fokûs li ser potansiyel, hebûn û hewldanan e.

Diaz, perspektîfa horîzontal jî dabeşî heft dîmensiyonên întegrasyonê dike:

Întegrasyona ekonomîk: Beşdariya kar, taybetî jî bi riya piyaseya kar û karsazî.

Întegrasyona civakî: Beşdariya tîkiliyên civakî bi mirovên xwecih re.

Întegrasyona polîtîk: Beşdariya pêvajoya bikaranîna hemû mafên polîtîk.

Întegrasyona komunîkatîf: Beşdariya pêvajoya bikaranîna înfomasyon û îmkanên zimên.

Întegrasyona malbatî: Bi riya zewac û bi hevdu re mayinê tîkiliyên akrebayî bi mirovên xwecih re.

Întegrasyona cîwarî: Cîwarbûna tîkilhev, yanê li eynî herêman bi hev re mayina penaber û mirovên xwecih.


Întegrasyona şexsî: Kêfxweşiya şexsî ya jiyanê ya li welatê penaberiyê.

Dabeşkirineke nû pêwist e

Pirdîmensiyonî û pirmaneyiya întegrasyonê, ji van nêrînên ku min li jor bi kurtayî behsa wan kir jî diyar dibe. Herweha ev tevliheviya ku ji vê pirdîmensiyonî û pirmaneyiyê tê jî li ber çavan e. Dabeşkirinên ku di her sê nêrînên cuda de hene nîşan didin ku tiştên ku ba Gordon pêvajoyên asîmîlasyonê ne, di lêkolîna kanadeyî de ku Lange behsa wê dike dibin riyên înkorporasyonê, yan jî ba Diaz dibin dîmensiyonên întegrasyonê. Wekî mînak asîmîlasyonê strûktûrî ya Gordon, ba Diaz dibe întegrasyonê strûktûrî û civakî. Asîmîlasyonê sîvîl a Gordon, ba Diaz întegrasyonê polîtîk e. Herweha asîmîlasyonên malbatî û kesayetî yê Gordon ba Diaz dibin întegrasyonên malbatî û şexsî. Înkorporasyonê ku di lêkolîna kanadeyî de heye ku Lange ji bo nêrîna xwe wekî piştgir nîşan dide, bi gelek aliyên xwe ve nêzî asîmîlasyonê strûktûrî ya Gordon e.

Li gelek welatên penaberiyê, wekî mînak di salên 60'î de li Kanada, Îngiltere û Awustralyayê¹⁷ û dû re jî li Danîmarkayê¹⁸ di maneya asîmîlasyonê de bikaranîna terma întegrasyonê û ev dinavhevduketina termên li ser asîmîlasyon û întegrasyonê, li gorî bîr û baweriyên min pêwistiya dabeşkirineke nû di terma

Figûr 1. Dabeşkirina întegrasyonê di sewîyeya giştî de



Întegrasyonê de tîne holê. Ji ber ku terma întegrasyonê ya nespesîfîk bi serê xwe çerçewe û naveroka wê nîşan nade, bi gotineke din ji ber ku kî yê bi kuderê re întegre bibe ne bellî ye, divê berê her tiştî muxatabên întegrasyonê bellî bin. Yanê gelo tenê grûbên penaber dê întegreyê civata ku ew tê de ne bin, yan jî penaber û mirovên xwecih tev dê întegreyê civata nû ya ku ji penaber û mirovên xwecih pêk tê bin?

Li gor baweriya min, ev aliyê pirsê întegrasyonê girîng e û ji destpêkê heta dawiyê tesîreke mezin li ser polîtîkayên întegrasyonê û li ser munaqeseyên teorîk ên derbarê întegrasyonê dike. Herweha desena muxataban, yanê penaber tenê yan jî penaber û mirovên xwecih bi hev re, li ser naverok û çerçeweyên ew dîmensiyonên ku Gordon, Diaz û Lêkolîna kanadeyî behs dikin jî xwediyê girîngiyeke mezin e.

Ji ber vê yekê jî, ev aliyê pirsê, sebaba bingeîn a dabeşkirineke nû ya derbarê întegrasyonê ye. Ev dabeşkirin jî, wekî ku di figûr 1'ê de tê nîşandan, di sewîyeya giştî de yekalîbûn û piralîbûna întegrasyonê ye, yanê întegrasyon *yekalî* û întegrasyon *piralî* ye. Ger di warên polîtîk, civakî, kulturî, ekonomîk û hwd ên civatê de tenê penaber muxatab û marûzê polîtîkayên întegrasyonê bin, ew întegrasyon întegrasyonê *yekalî* ye. Yekalîti jî dikare du varyantên yekemîn bi xwe re bîne; întegrasyon *asîmîlasyonîst* an jî *segregasyonîst*. Çunkî di herdu varyantan de jî, her çend ber bi aliyên cuda cuda bin jî, fokûs tenê li ser penaberan e. Wexta armanc di hemû waran de tenê penaberan întegrasyonê civata xelkê cih kirin be, ew babeta întegrasyonê xwediyê karaktera asîmîlasyonîst e. Herweha ger armanc, penaberan tenê di hin warên

civatê de, wekî mînak di piyaseya kar û warê perwerdekariyê de, întegreyê civatê kirin be û di warên din de penaberan ji beşdariyê bêpar hiştin be, gotinên resmî çî dibin bila bibin ew întegrasyon xwediyê karaktereke segregasyonîst e. Întegrasyona *piralî* ku him grûbên penaber him jî mirovên xwecih himbêz dike û ji xwe re civata nû ya ku ji penaber û mirovên xwecih pêk tê bingeh digre, ji ber çerçeweya muxataban xwediyê karaktereke pirkulturî ye, yanê întegrasyona *pirkulturî* ye.

Lê ev dabeşkirin, divê ne wekî dabeşkirineke mekanîk bê qebûlîkirin. Çunkî çawa di pêvajoya yekalîtiyê de pirkulturî wekî varyanteke duyemîn di sewîyeyekê de heye, herwusa di pêvajoya piralîtiyê de jî rewşên asîmilasyon û segregasyonê dê wekî varyantên duyemîn hebin. Pirkulturiya ku dikare bibe encama întegrasyona piralî, ew pirkulturî ye ku taybetmendiyên wekî îhtirama hevdu girtin, piştgirî û hevkarî hêjayiyên herî giring in. Ji ber vê yekê jî jihev cudakirina varyantên yekemîn û duyemîn girîng e ji bo dabeşkirineke nû di întegrasyonê de.


Hebûnên giştî û întegrasyon

Ew dabeşkirin, di eslê xwe de di warê giştî de destpêkeke ji bo spesîfîkekirina întegrasyonê ku heta nuha bi bikaranîna xwe ya nespesîfîk ji polîtîkayên gelek jihev cuda re bûye û hîn jî dibe nav û wasite. Bêguman her çend dabeşkirineke weha pêwîst be jî, ew ne garantiya çareserkirina pirs û pirsgerêkên penaberiyê ye. Wekî mînak ji bo întegrasyona pirkulturî, pirsax wext faktoreke girîng e. Çunkî ger pêwîstiyên întegrasyona pirkulturiyê bînin bicihanîn, strûktûrên sedsalan (wekî mînak strûktûra desthilatdariyê) jî tê de di hemû warên jiyanê de pêwîstiyên guherandin û nuhkirinê dê derkevin pêş. Ew jî ne tenê pirsax xwestinê ye, herweha pirsax wextê ye jî. Lê tercîh, xwestin û gav avêtin ji faktorên herî girîng in ji bo pêvajoya çareserkirina pirsên ku wext dixwazin jî. Ji aliyê muxataban spesîfîkekirina întegrasyonê û li gorî vê jî jihev cudakirina varyantên întegrasyonê yek ji van faktorên.

Ev dabeşkirin û varyantên bi wê ve girêdayî fokûsê tînin li ser têkiliyên navbera *hebûnên giştî* yê penaberan û întegrasyonê jî. Çunkî di warên cuda cuda de beşdarî jiyanê civakî bûyin *hebûnên taybetî* yê penaberan ji nêzva elaqeder dike. Bikaranîna van hebûnên taybetî jî bi giranî bi polîtîka û gavên derbarê penaberî ve elaqeder e. Giringiya dabeşkirin û varyantên întegrasyonê li vir gelek diyar e.

Wekî ku di fîgûr 2'yê de tê nîşandan bikaranîna hebûnên taybetî yê penaberan — yê ku penaberan çî li welatê xwe çî jî li welatê penaberiyê bidest xistine — ger di beşdariya warên civakî yê taybetî de xwediyên fonksiyonên

Fîgûr 2. Têkiliyên navbera hebûn û întegrasyonê



xwe yên bingehîn bin, wê wextê dikarin tevî îmkanên beşdariya warên civakî yên taybetî hebûnên giştî pêk bînin. Desena hebûnên giştî û sewîyeya bikaranîna wan li ser form û naveroka têkiliyên penaber û civata mirovên xwecih xwediyê giraniyê mezî e. Întegrasiyona reel, yanê întegrasiyona bûyî yek ji mekanîzmayên têkiliyên weha ye ku ew jî li ser întegrasiyona hîskirî tesîreke mezî dîke. Întegrasiyona li welatê mirovên xwecih ku ji întegrasiyona reel û hîskirî pêk tê bi rotayêke din li paş vedigere û tesîr li ser hebûnên giştî dîke.

Ev mekanîzma her berdewam dîke, lê lezbûn û encamên vê sîrkulasyonê bi giranî girêdayê desena varyantên yekemîn û duyemîn ên întegrasyonê û dîmensiyonên wê ne. Em bibêjin penaberek xwediyê xwendin û meslekeke bilind e û di şertên normal de bi van hebûnên taybetî dikare di civatê de bibe xwediyê pozisyonên balkêş. Lê wexta di pratîkê de întegrasiyona yekalî ya bi karaktera segregasyonîst giraniyê de be, ew penaber li welatê penaberiyê dê nîkaribe ji van hebûnên xwe yên taybetî sûdeke berbiçav werbigre. Herweha ger ew hebûnên taybetî di pratîkê de ne xwediyên rolên balkêş bin, wê wextê dikare wusa biqewîme ku di navbera kesên xwedî û ne xwediyên hebûnên weha ferqeke berbiçav nemîne. Di rewşêke weha de dê ne zêde xerîb be ku yê ku ne xwediyê hebûnên taybetî yên li jor behskirî ye, di pevajo ya beşdariya têkiliyên bi civata xelkê cih re de bibe xwediyê zêdetir îmkanan. Çunkî daxwaz û hêviyên wê/wî,

ne wekî yên ku xwediyên hebûnên taybetî yên weha ne û ji ber vê yekê jî di navbera wê/wî û strûktûra desthilatdariyê de îhtimala dijberiyê vekirî ya berbiçav gelek kem e, yan jî ne wekî yên din e. Di rewşên weha de naskirina resmî ya nasnameya neteweyî ya grûbên penaber û li gorî wê hin gav avêtin, rê li ber segregasiyona navbera grûbên penaber û civata mirovên xwecih nagre, lê wekî mînak ev naskirin û gav dikarin têkiliyên navxweyî yên grûbên penaber xurtir bikin ku ew jî ji bo penaberan di çareserkirina hin pirsên penaberiye de dikarin bibin xwediyê rolên pozîtîf.²⁰

Wexta întegrasiyona yekalî ya bi karaktera asîmilasyonîst di giraniyê de be, wekî prensîb di hemû waran de îmkânên beşdariya jiyana civakî bûyin heye, lê ya nasnameya neteweyî ya penaberan nayê naskirin, yan jî wekî resmî bê "naskirin" jî di pratîkê de maneyê wê ya berbiçav tune ye û armanca asîmilasyonê di giraniyê de ye. Ji ber karaktera asîmilasyonê ya ku taybetmendiyên civata mirovên xwecih li ser penaberan ferz dike û dixwaze taybetmendiyên kulturî û civakî yên penaberan ji holê rake, ev pêvajoyê jî di eslê xwe de ne bêproblem e û talûkeya segregasiyonê jî ne biçûk e.

Întegrasiyona piralî ku pirkulturiya civata nû dixê navenda polîtîka û tercîhan, li gel gelek zehmetiyên xwe jî, li hember asîmilasyon û segregasiyonê alternatîfa herî bitesîr e. Ev alternatîf, ji aliyê mafên mirovî yên navneteweyî jî riyê herî maqûl e, çunkî ji bo berjewendiyên civata mirovên xwecih grûbên penaber nade aliyekî û jîholêrakirina neheqiyên ku ji cudabûna nasnameyên neteweyî tê wekî armançê datîne pêşiya xwe. Li vir hîm nasnameyên neteweyî tîn naskirin û pêwistiyên wê tîn bicihanîn, him jî îmkânên beşdariya warên civakî yên taybetî hene. Muxatabên politikayan ne tenê penaber in, herweha mirovên xwecih jî beşek ji pêvajoya guherandin û pêşdebirinê ne. Beyî ku nasnameya xwe bidin aliyekî, beşdarbûna penaberan a warên cuda cuda yên civatê û li gorî hebûnên xwe yên taybetî di pêvajoyên guherandin û pêşdebirina civatê de cihgirtina wan ji bo neslên nû jî bingeheke baş e.

Jêrenot

¹ Întegrasiyon babeta teza min a warê sosyolojiyê ye (li Unîversîteya Stockholmê) û ev nivîs jî perçeyek ji hin nêrînen ku di wê teze de bi berfirê tîn munaqesekirin e. Tez bixwe li ser anketekê ku ji şeş grûbên penaber li Swêdê (latînamerîkanî, polonî, pers, kurd, tirk û asûrî/suryanî) 1026 kesan hîmbêz dike ava bûye û li wir di pratîka bersivdana penaberan a derbarê pirsên bi întegrasiyonê elaqeder de pirsên întegrasiyonê ji aliyê teorîk û ampîrîk (weqî) tê munaqesekirin.

Ji ber ku ji bo min fêmkirindayîna naverokê girîng e, wexta di ferhengên lehçeyên kurdî de (yên ku min dikaribû bidestxista) termên ku maneyên hin termên biyanî — ku di lêkolînên li ser penaberiye de jî tîn bikaranîn — didin tûnebûne, yan jî hebin jî ji aliyê xwendevanan dikarin çewt bî fêmkirin, min

wekî prensîp termên ku di gelek zimanan de hema hema wekî xwe mane bikaranîn.

² *Segregasiyon* (îngilizî: segregation) termeke ku di lêkolînên li ser penaberiyê de di maneya *cudabûniyê* de ku encamê hin polîtîkayan e tê bikaranîn.

³ *Dîmensiyon* (îngilizî: dimension) yek ji ew terman e ku di gelek zimanan de bi hin guhertinên herfan tê bikaranîn. Di kurmancî de kelîmeyên wekî *bejnayî* û *alî* carnan di şûna dîmensiyonê de hatine bikaranîn, lê min di vê pêvajoyê de xwest ku terma dîmensiyonê bikar bînim.

⁴ Terma *hindikayîyan* ji bo grûbên neteweyî ku di civata ku ew tê de dijîn de di hindikayî de ne tê bikaranîn.

⁵ Gordon, Milton M. (1964), *Assimilation in American Life*, New York: Oxford University Press, rûpel 70-71.

⁶ Zewaca înternetîk ji bo zewaca mirovên ji neteweyên cuda hatiye bikaranîn

⁷ Terma *helwestê* di maneya ew terma ku di îngilizî de *attitude* hatiye bikaranîn.

⁸ *Rabûn û rûniştin* di şûna terma ku di îngilizî de *behaviore* de hatiye bikaranîn ku maneya wê di tirkî de *davranış* e û di swêdî de *beteendeye*.

⁹ *Dîskrîminasiyon* (îngilizî: discrimination) di maneya cudabûnî xistinê de tê bikaranîn.

¹⁰ Breton, Raymond & Wsevolod W. Isajiw & Warren E, Kalbach & Jeffrey G. Reitz (1990), *Ethnic Identity and Equality: Varieties of Experience in a Canadian City*, Toronto: University of Toronto Press.

¹¹ *Înkorporasiyon* (îngilizî: incorporation) li vir di vê maneyê de tê bikaranîn: Wekî mirovên xwecih beşdariya jiyana rojane bûyin û bûyina perçeyek bingehîn a civatê.

¹² Lange, Anders (1991), *Flyktingskap, boende och agens*, Stockholm: CEIFO (Centrum för invandringsforskning), rûpel 226-228.

Lange li ser terma asîmilasiyonê ji xwediyê nêrîneke wekî ya li ser întegrasiyonê ye.

¹³ Diaz, Jose Alberto (1993), *Choosing Integration*, Uppsala: Uppsala universitet.

¹⁴ *Vertîkal* (îngilizî: vertical): berjor, berjêr; *horîzontal* (îngilizî: horizontal): berayî, berwar, asoyî.

¹⁵ Diaz, Jose Alberto (1996), "Invandrarnas integration", di *SOU 1996/55 Văgar in i Sverige* de, rûpel 75.

¹⁶ Terma *hebûnê* di vê nivîsê de di maneya terma ku di îngilizî de *resource* e, di swêdî de *resurs* e û di tirkî de *kaynak* e hatiye bikaranîn.

¹⁷ Castles, Stephen, "How nation-states respond to immigration and ethnic diversity", di *New Community* 21(3), July 1995, Oxford de, rûpel 298.

¹⁸ Schierup, Carl-Ulrik, "Integration och invandrapolitiska ideologier", di *Sociologisk forskning* 2/1987, Göteborg: Sveriges sociologförbund de, rûpel 8-9.

¹⁹ Terma *feedback* termeke îngilizî ye û ji bo pêvajoya ku piştî hin guherandin û pêşdeçûnan bi rotayeke din li paş vedigere û li ser rewşa destpêkê tesîr dike tê bikaranîn. Maneya *feedbackê* di swêdî de *återkoppling* e.

²⁰ Tesîrên tēkiliyên xurt ên navxweyî yên grûbên penaber ên li ser pêvajoyên întegrasiyonê mijara munaqeseyeke din in û ji bo vê yekê ez li vir li ser wan ranawestum.

Şeş keçên ciwan

Ji swêdî: Serdar Roşan

Divê tu zanibî, ey Mîrê misilmanan, carekê nasîna min bi mirovekî dewlemend re çê bû. Bi xwe ji Yemenê lê terka welatê xwe kiribû û li Bexdayê, li bajarê me bi cih bû bû da ku jiyaneke bextewar û rehet bijî. Navê wî Elî El-Yemenî bû. Piştî ku midetekê li Bexdayê ma, tore û edetên me nas kirin û bi daxwaza dilê wî bûn jî, hemî mal û milkê xwe yê ku dikarî bi xwe re bîne ji Yemenê da anîn; di nav wan de, harema wî, ya ku jî şeş cêriyên spehî û ciwan, mîna şeş heyvên çardehşevî pêk dihat jî, hebû.

Ji wan cêriyan jina yekemîn spî, ya duyemîn esmer, sêyemîn qelew, ya çaremîn zirav, ya pêncemîn kej û ya şeşemîn reşik bû. Her şeş jî di sînorê herî dawî yê bedewbûnê de bûn. Bi nasîna edebiyatê re rihê wan dagirtî, di hunera reqsê û lêxistina aletên muzîkê de serwext û serketî bûn.

Navê keçika spî Heyveron, ya esmer Pêtî, ya qelew Heyvbano, ya bejinzirav Horî, ya kej Tavbano û ya reşik Roniya Çavan bû.

Rojekê Elî El-Yemenî ku li Bexdayê, li wî bajarê kêf û zewqê di nav xweşî û bextewariyê de dijiya, gazî cêriyên xwe kir da ku werin eywana mezin ya cihê qedirbilindan û bi wî re vexwin, sohbetê bikin û stranên bêjin. Hemî bi kêfxweşî û bi lezûbez hatin cem wî û ketin nav lîstikên kêfê, çî yên rihî çî yên din.

Gava ku şahî û kêfxweşiya wan gîhaşte pêleyeke bilind, Elî El-Yemenî qedehek hilda, tije şerab kir û berê xwe da Heyveronê û got:

- Ey cêriya spî, dosta spehî, ey Heyveron, ka em awaza te ya ku mirovî sermest dike û kela dilan radike bibihîzin.

Heyveronê, cêriya spî, ûdek hilda, akorda wê saz kir û tiliyên xwe li ser têlên wê gerandin û welê lêda ku piyên hemiyên bê hemdê wan bilind bûn û kevirên erdê jî pê re rabûn dîlanê. Û wê dest bi stranekê kir ku bi muzîkê re hema di eynî demê de dihate çêkirin:

Ev dostê min, -çî ji min dûr çî nêzîk be- ji bo her demê şiklê xwe di çavên min de neqîşandiye; û navê xwe di organên min yên sadiq de kolaye.

Ji bo navê wî bînim ser zimên ez dibim dilekî sade, ji bo wî bibînim dibim çavekî zelal.

Hakimê jiyana min ku hertim ji min re dibêje, got ku:

- Ma tu, çu carî nikarî evîna xwe ya bi pêtî ji bîr bikî?

Lê min weha bersîv da:

- Ey hakimê dilhişk, bi riya xwe de here, min bi tenê bihêle. Ma tu fam nakî ku tu çawa xwe dixapînî, gava tu tiştê nedîtî ji min dixwazî?

Gava Yemenî ev beyt bihîstin pêlên kêfxweşiyê xwe li wî pêçan, piştî ku tîna lêvên xwe şikand, piyale dirêjî Heyveronê kir; wê binê qedehê rakir. Wî qedeh cara duwemîn tije kir berê xwe da ya esmer û got:

- Ey Pêtî, ey alîkarê rih, ka ez bi dengê te çend beytan bibihîzim, bêh ku tu min bişewitînî.

Pêtî ûd hilda, akordeke nuh saz kir, dest pê kir ku kevirên erdê bi dilan re radibûn reqsê, pê re jî stran digot:

Ez bi vî rûyê biha û dilrevîn sond dixwim: Ez ê heta mirinê ji te û tenê ji te hez bikim û çu carî bêbextiyê bi evîna te re nakim.

Ey rûyê nûranî ku spehîbûn di bin çarşefa xwe de diparêze, tu xweşikbûn bi xwe yî.

Bi evîna xwe te hemî dil êsîr girtine; tu bi xwe hostayekî mîrane yî ku ji destê Avakar derketiyî.

Gava Yemenî ev beyt bihîstin kela dilê wî rabû, ji bextewarî û kêfxweşiyê tîna lêvên xwe şikand û qedeh dirêjî Pêtî kir, wê jî di binê qedehê de bang da. Piştî wî qedeh cardin dagirt, berê xwe da cêriya qelew û got:

- Heyvbano, ey xwedîya organên giran lê xwîna sivik, ka çend beytên xweş bêje ku mîna xwîna te zelal bin?

Keçika qelew ûd hilda, akord saz kir, bi lêdanê re rih hejandin, kevirên herî hişk yên erdê lerizandin, piştî kêlîkekê dest bi stranê kir:

Heke min karîbiya kêfxweşîya te qezenc bikira; ey agirê dilxwestina min, min dê bi hêsanî ji bo xatirê kenîna te, temamê dunyayê û rika wan bida ber pêyên xwe.

Heke tu bi heybet û ezameta xwe ber bi rihê min hilkişîya, dê temamê mîrên dunyayê bi carekê ve ji ber çavan winda biba bêh ku ez pê bihesiyama.

Heke tu bi evîna min ya mitewazî razî bûya, ew dê ji bo min bextewarî ba ku karîbim temamê jiyana xwe li ber pêyên te biborînim; ey peykerê xweşikbûnê ku hemî micewher li cem te bi cih bûne.

Gava Yemenî ev beytên Qelewê bihîstin, dilê wî bi evînê tije bû û wî tîbûna lêvên xwe şikand û qedeh dirêjî Heyvbanoyê kir, wê di binê qedehê de bang da. Wî careke din piyale dagirt, berê xwe da keçika zirav û got:

- Ey keçika bejin zirav, ey Horiya Buhuştê! Niha dor hatiye ser te, ku tu bi straneke xweş kela dilê me rakî!

Cêriya zirav mîna dayîkek ku xwe bi ser dergûşa xwe de xwar dike, welê

ûd hilda û beytên jêrîn gotin:

Ez bêpîvan evîndarê te me û tu jî wisa bêsinor bêfhmal. Ka bêje, kîjan qanûn hestên weha dijev dipejirîne?

Gelo hakimekî payebilind û adil ku mirov ji bo meseleyên evînê serî lê de heye? Ew dikare qaîdeyên lîstikê piçekî wekhev deyne û bi vî awayî evîna min ya ji pêtî bide dostê min û bêqeydiya wî ya qeşayî jî bide min.

Gava Yemenî beytên keçika bejin zirav û xweşik bihîstin, dilê wî bi kêfxweşî hat dagirtin; piştî ku tîna lêvên xwe şikand piyale dirêjî Horiya Buhuştê kir, wê jî li binê piyalê bang da. Wî qedeh cardin dagirt, berê xwe da cêriya kej û got:

- Ey Tavbano, tu, ya bi cismên kej û kehrîbar, tu dikarî, me bi beytên têrevîn dilxweş bikî?

Keçika kej serê xwe bi ser ûdê ve xwar kir; bi çavên xumarî, akord saz kir, çend caran lê xist ku pê re hemî mexlûq hatin coşê, piştî gehîştina pêleya berz wê weha got:

Gava ez dostê xwe dibînim,

Ew li min dinêre û berê awirên xwe yên mîna şûr

Dide dilê min.

Ez ji dilê xwe yê birîndar û lawaz re dibêjim:

Çima tu carî birînên te rehet nabin?

Çima tu xwe naporêzî?

Lê dilê min bersîv nade,

Hertim serî ji vê tehrîkê re datîne;

Yê ku dibe sebebê xweavêtina ber pêyên wî.

Gava malxwêyê kejê ev beyt bihîstin, kela dilê wî rabû; piştî ku tîna lêvên xwe şikand wî qedeh dirêjî Tavbanoyê kir, wê binê qedehê anî. Wî qedeh cardin dagirt, berê xwe da cêriya reşik û got:

- Ey Roniya Çavan, tu ya ku ji derve reş ji hundir spî yî, tu, ya canê wê di rengê şînê de ye; û bişirîna wê kêfxweşî û bextiyariyê li nav malê belav dike, ka ji me re çend beyt yên mîna tîrêjên rojê bêje.

Wê gavê Roniya Çavan rahişt ûdê û bi şeweyeke guhêrbar bîst meqamên cida lê dan. Piştê li meqamê pêşîn vegeriya ku gelek caran, wê xwe bi xwe jî, ew meqam digot, meqamekî dijwar:

Çavên min, bila rondik mîna çeman ji we biherikin bi ser dilê min de,

Ku bi agirê evmê hatiye sotin.

Ev agirê ku min dişewitîne, ev hemî kul û êş, ku min bêtaqet dikin;

Sedem ew e, ew dostê zalim, yê ku dihêle ez bimirim û kêfa raqîban li min tîne.

Hekîmên min qebhetekê di min de dibînin û cesaretê didin min

Da ku ez ji hinarikên wî yên gulvedayî bi dûr bim.

Lê ez çi bi dilê ku êsîrê gul û kulîlkan e bikim?

Bibîne, çawa qedeha şerabê tê gerandin...

Û dengê saz çawa rihê me ji bo kêfê vedijîne û organên me bi xwestinê...

Ez ji rihê wî hez dikim!

Axx, hinarikên min li ber agirên şehwetê çilmisîne! Lê çi heyf! Gulên bihuştê, hinarikên wî vane li vir in.

Maneya wê çi ye ku ez ji wî hez dikim? Herhal ji avakirinê hez kirin ne guneh û sûcek bêefû ye.

Gava malxwêyê keçîka ciwan ev beyt bihîstin dilê wî bi evînê tije bû, piştî ku lêvên xwe şil kirin, qedeh dirêjî Roniya Çavan kir, wê qedeh bi ser xwe dakir.

Piştê her şeş keçîk bi hev re rabûn, erdê di navbera herdu piyên wî ramûsan û li ber wî geriyan ku ji wan re eşkere bike ka kîjan keçîk serî li wî gêj kir û ji kîjan beyt û awazan mest bû. Elî Yemenî teredut dikir. Wî mideteke dirêj li wan mêze kir; awirên xwe li ser xweşî û hunerên wan yek bi yek gerandin; gîhaşt wê qeneetê ku form û rengê wan hemiyar hêjayê pesnê ye. Li dawiyê biryara xwe da, ku bipeyîve. Got:

- Hezar şîkir ji Xweda yê beşişkarê rindî û xweşikbûnê re; ku şeş jinên li hev, bêqîsûr û horiyane dane min. Baş e, guh lê bin! Ez li vir eşkere dibêjim ku li ber çavên min hûn hemî hêja ne û ez nikarim û wijdanê min qebûl nake ku ez yekê ji we di ser ya din re bigirim. De ka werin, hemî pêkve min ramûsin!

Bi vê gotina Yemenî re, bi hev re xwe avêtin hemêza Yemenî û bi hezar cûreyê ramûsan lê barandin, wî jî bersîva maçên wan bi dirêjahiya saetekê dan.

Piştê li ser daxwaza wî, ew mîna nîv xeleqeyekê li pêş wî rûniştin. Wî got:
- Mîn nexwest ez yekê ji we li pêş yên din bigirim û neheqiyê bikim. Lê tiştê ku min nekir hûn dikarin bikin. Hûn hemî şarezayên Quranê û edebiyatê ne. We weqaînameyên kevin û tarîxa me misilmanan xwendîye. Û li dawiyê hûn hemî xweşgo û xwedî merîfeta rabûn û rûniştinê ne. Ji lewre ez dixwazim, her yek ji we divê pesnê ku xwe layîq dibîne bide; û balê bikişîne ser cewaziyên xwe û di eynî wextê de kêmasî û nebaşiyên reqîba xwe bibêje. Misabeqe divê di navbera du raqîban ku form û rengê wan cida ye, ango di navbera spî û reş; zirav û qelew; kej û esmerê de; divê pêk bê. Di vê qayîşkişandinê de hûn dikarin bi tenê gotinên xweş, hevokên xweş lihev, jêgirtinên alim û xwendeyan, ji şairan û ji ruknên Quranê îstîfade bikin.

Wan keçîkên ciwan bersîv da, ku bihîstin ji bo wan ferman e; û ji bo şerekî sihrî tavil amade bûn.

Cêriya yekemîn ku rabû ser xwe Heyveron bû; îşaret da Roniya Çavan da ku ew li pêş wê rûne. Keçika spî dest pê kir:

- Ey keçika reşik! Di kitêbên zaneyan de tê gotin ku spiyê weha digot: Ez stêrka ronî me! Ez hîvek im ku di asoyêde dibiriqe. Rengê min ronî û xweş vekirîye! Eniya min zîvane dibiriqe. Û xweşikiya min îlham daye şaîr ku dibêje:

Gewr, bi hinarikên nerm û xweşik, ew mîna mircanek qewî parastiye.

Ew dişibe herfa elîf, herfa mîm devê wê pêk tîne,

Birûyên wê du nûnên berevajî ne,

Awirên wê mîna tîrên ku ji kevanê brûyên wê yên dijwar derketine.

Lê heke tu dixwazî hinarik û xweşiyên wê nasbikî, ez dibêjim:

Hinarikên wê wek pelên gulan û kulîlkên hinaran in.

Bejna wê mîna tayê rîhanê zirav, li gulistanê bi kêfxweşî diheje,

Mirov dil dike ku temamê bexçeyê ji wê şaxê deyne.

Lê ey keçika reş! Ez didomînim.

Rengê min rengê rojê ye. Herweha rengê kulîlka porteqalan e; û dişibe stêrka sibehê ya rengê mircana spî.

Herhal tu dizanî, Xwedê yê herî berz, di Kitêba xwe ya bi şeref de ji Mûsa re (selelahûteala!), Mûsa yê ku destê wî bi cuzam bû, dibêje: Destê xwe têxe berîka xwe, paşê derxe tu dê bibînî ku ew spî bûye, ango pak û delal.

Herweha li Kitêbê derheqê bawerîya me de nivisiye: Yên ku rûyê wan spî ye, ew dê di nav yên bijarte de bin, yên ku Xwedê ew bijartine.

Ji lewre rengê min sertaca rengan e, spehîtiya min mikemelbûna min e, mikemelbûna min xweşikiya min e.

Cil û micewherên spehî hertim li rengê min tîn; û xweşikbûna min zêdetir nîşan didin; û rih û dilan êsîr digirin.

Ma tu nizanî, berfa ku ji asîman datê hertim spî ye?

Ma tu nizanî, misilmanan kefiya spî li pêş yên din bijartine?

Ne hewce ye ez lê zêde bikim! Pesnê xwe bidim, ji lewre rastî mîna birûskên ku li çavan dikevin, hertim xwe eşkere dike.

Û herweha dema vê yekê ye ku bête diyar kirin; rengê min di ser yê te re ye, keçika reşik; reng hibir, tu, ya ku dişibî qijikekê.

Ka gotinên şaîr bifikire gava ew spî û reş dide ber hev:

Ma tu nizanî nîrxê mircanekê di spîtiya wê de ye,

Û çewalekî komir bi dirhemekî tê kirîn?

Ma tu nizanî, rûyekî spî nîşana xweşî û şahidê bihuştê ye,

Lê rûyê reş mîna zift û qetranê ye, ku agirê dojhê gur dike?

Guh bide min, baş bibihîze ku dîroknivîsên rastgo behs dikin; ango rojekê gava Nûh pêxember di xew re çû, herdu kurên wî Sam û Ham li cem wî bûn.

Gava bayek rabû û kirasê wî ji ser wî bir, organên laşê wî diyar bûn. Pê re jî pirqînî bi Ham ket; Nûh, bavê insanan yê duwemîn bi sitrê xwe gelekî xurt bû; Ham nexwest bavê xwe binuxumîne. Lê Sam bi rûyeke qedirbilind berbi bavê xwe çû, dawa wî avêt ser, aletên wî nixumandin. Pê re jî Nûh ji xewê şiyar bû û dît ku vaye Ham dikene, ji lewre wî, Ham lanet kir, lê Sam bi rûyeke cidî dixuya, ji ber wê yekê wî ji Sam re dua kir. Her di eynî lehzeyê de rûyê Ham reş bû , yê din jî spî ma. Her ji wê lehzeyê neslê hemî pêxemberan, pêşevanan, zaneyan û mîran ji Sam daket; û Ham yê ku ji nêrînen bavê xwe direviya bû bavê eşîra reşikan, ku jê reşik, sûdanî daketin. Û keçîka reşik, tu baş dizanî ku hemî zane û bi giştî hemî insan vê rastiyê qebûl dikin; ne mimkin e ku mirovekî zane ji nav reşikan û ji welatê wan der bê.

Gava cêriya spî ev peyv gotin, Yemenî jê re weha got:

- Tu têra xwe axifî! Niha dora ya reşik e!

Wê gavê Roniya Çavan bêî ku stûyê xwe xwar bike, li pêş ya spî sekinîbû, awirên xwe dan Heyveronê û got:

Ma tu nizanî, ey spiya cahil, li Quranê, cihê ku tê gotin; *Xwedê, yê herî bilind*, bi şeva tarî û roja ronî sond xwar? Lê gava *Xwedê, yê herî berz*, sond xwar ewil navê şevê paşê navê rojê zikir kir. Dê wisa nekira heke Wî şev li pêş rojê negirta.

Û berdewam! Ma reşbûna rîh û por ne îşareta ciwanî û xweşiyê û ya spî jî îşareta kalbûn û dawîya xweşiya dunyayê ye? Heke rengê reş ne xwediyê cihê qedirbilindiyê ba, *Xwedê çawa ew dikir bîbilka çavan û nava dil. Şair çiqasî rast dibêje:*

Gava ji canekî reng abanoz pir hez dikim; sebeb ev e ku ew ciwan e û herweha dilekî germ û çavinen reş en pêtî dinimîne.

Lê herçî rengê spî ye; tirs û dehşet bi xwe ye. Heke ez yek caran ji neçarî spîka hêkan yan goştê spîçolkî bixwim jî, şikir zêde naqewime.

Û şairekî din jî weha gotiye:

Heke ji ber evîne û coşa dil bo keçîka reşik ku canê wê dibiriqe, eger ez dîn bibim, ecêb nemînin hevalino!

Çi mixabin, hekîm dibêjin, hemî cûreyên dînîtiyê ji ber fikîen reş in.

Yekî din jî weha dibêje:

Ez tehamulê jinên spî nakim, ji lewre mirov dikare bifikire,

Ku canê wan bi arvanê kurmî hatiye seyandin.

Ew yara ku ez jê hez dikim qîzek di rengê şevê de

Ya ku rûyê wê mîna heyvê ye.

Reng û rû hev tamam dikin,

Eger şev ne tarîba dê ronîya heyvê jî tuneba.

Û herweha! Ma ne bi şev e ew hemî hevûdu dîtin û nêzîkahiyên ku pêk tên?

Û evîndar spasdarê şeva tarî ne, ku lîstikên wan hembêz dike û wan ji çavên nebaş, bêyom û bi meraq diparêze; rê li pêşiya gotinên vala digire. Ne hewce ye ku mirov bêje ew çiqas ji rojê zivêr in gava wan eşkere dike û rê dide kurte-pistan. Ev cidabûn bi tena serê xwe bes e, keçika spî.

Lê bibihîze ka şair çi dibêje:

Ez nikarim ji yê hantal û giran yê ku ji bez nepixiye hez bikim, lê ji xortê reş ê xulam, ciwan û zirav hez dikim.

Çi ji ber rewşa tebiî çi jî gava pêwîst bûye, ez bi xwe li hespekî ciwan û bi rim siwar bûme û min rê daye ku yên din li filan siwar bin.

Û yeke din gotiye:

Dostê min bi şev hat seredana min û em li kêleka hev heya sibehê bi kêfxweşî razan. Sibehê em di hembêza hev de girtin.

Ez ji Xwedê re dua dikim bila hemî rojên min bike şev ku dostê min tu carî neçar nemîne ku terka min bike.

Keçika spî, eger ez axaftina xwe bi başbûn û pesnên rengê reş bidomînim, ew dê bibe dijberê gotina pêşyan: Gotinên zelal û kin ji yên dirêj û vala bi qiymettir in. Lê ez mecbûr im bêjim; dê û bavê te li ber yên min qermiçokî xuya dibin. Tu mîna nexweşiya cuzamê spî yî, genî û madê mirov ji te li hev dikeve. Û wexta tu xwe bi berfê re miqayese dikî tu ji bîr dikî, li dojhê ne tenê agir, herweha li cihinan serma û qeşa dibin sebebê êşên nedîtî ku yên li dojhê, ji pêtiyê agirî bêtir, diêşînin? Û gava tu min dişibîni hibirê, ma ji bîr dikî ku kitêba Xwedê bi hibira reş hatiye nivîsîn; û miskê ku mîr wek xelatê didin hev reş e? Ya baş ev e ku tu guh bidî beytên şair:

Heke misk ne reş baya dê nebaya misk û kils biçûk nedihate dîtin,

Herçiqas spî ye jî.

Qiymeteke mezin ji bo bîbilkên reş heye

Lê pir biçûk ji bo spiyê çavan.

Gava Roniya Çavan ev peyv gotin; Yemenî weha got:

- Bêşik, tu keçika reşik û tu cêriya spî hûn herdu jî xweş axiffin. Lê niha dora diduyên din e.

Ya spî û reş rabûn ser xwe çûn cihê xwe yên rûniştinê. Nuha jî ya qelew û ya zirav hatin cihê wan. Li wê derê rû bi rû sekinîn; ya qelew, Heyvbano, xwe ji bo axaftinê amade kir.

Lê berî ku dest bi axaftinê bike, wê hêdî hêdî cilên xwe danîn hema bêje tazî ma, bi wî awayî laşê xwe yê qelew nîşan dida; nava wê ya lefek-lefekî, navika kûr û kemaxên wê yên dagirtî û mezin xweş li pêş çavan bûn. Bi tenê binkirasekî tenik lê ma bû; ku forma wê ya girover bi her awayî di kirêş re xuya dibû. Piştî van haziriyên, berê xwe da Horiya Buhuştê û jê re got:

- Şikir ji Xwedê re ku ez wisa qelew çêkirime, bi îtîna ez xuluqandime, çi

ji nêzîk çî ji dûr, bêhnên xweş ji min difûrin; canekî nerm û teze daye min; û herweha ji masûlkeyên bi hêz ez mehrûm nehîştîme ku gava pêwîst be bi kulmekê ez karibim li dijminê xwe bixim û di erdê re rast bikim.

Lê belê niha guh bide, keçîka zirav, zaneyan weha gotiye:

Bextiyariya jiyane û şehwet bi sê tiştan ve girêdayî ye; goşt xwarin, li goşt siwarbûn û xistina goşt nava goşt.

Kî dikare bêf ku ji şehwetê biricife li min, li bedena min ya dagirtî mêze bike? Xwedê bi xwe, di Kitêbê de, pesnê qelewbûnê dide; dibêje gava mî, berx an conagayekî bête qurbankirin divê yên bi bez û qelew bin.

Canê min mîna bexçeyekî têrfêkî ye; hinar pêsîrên min, hêjîr hinarikên min û zebeş kemaxên min in.

Ma ew tiştê firinde çî bû ku neslê Îsraêl li çolê herî pir bêf kiribû, gava ew ji Misir bi derketin, wan koç kir. Ma ne qitik bû, ya qelew û bi dohn?

Ma tu car hatiye dîtin ku kesek çûye cem goştîroş û jê çerm û hestî xwestiye? Ma goştîroş parçeyên herî bi bez û dohn nadin mişteriyên xwe yên herî baş?

Û herweha bibihîze, keçîka zirav, ka şaîr ji bo keçîka qelew yeke wek min çî dibêje:

Meşa wê bibîne, çawa ji herdu aliyan ve wek meşkên şerabê dilivin; giran û bi şehweta xwe mêrkuj in.

Bibîne, gava ew rûdine û radibe li şûna kemaxên xwe, şopek, bîranînek kûr dihêle.

Bibîne, gava ew direqise û bi alîkariya kemaxên xwe rihê me ji me difirîne û dilê me diavêje ber pêyên xwe.

Lê tu dişibî çî, keçîka zirav, heke ne serçeyeye reben be? Ma çîpên te ji qijîkekê cidatir in? Ma kemaxên te naşibin darikan? Û ma laşê te naşibe rewtekî? Bi rastî jî behsa te dibe, keçîka zirav, qijîka spî, gava şaîr van beytan dibêje:

Xwedê min ji hembêzkirina keçîka zirav biparêze; laşê wê yê hişk, bi zivir û tîj.

Di her cismekî wê de qilochê conagayekî heye ku li hestiyên min dide ku ez ji ber êşa wan bi canekî tevîzî şiyar dibim.

Piştî ku Yemenî ev gotinên cêriya Qelew bihîstin, ji wê re weha got:

- Bes e, tu têra xwe peyîvî! Nuha dora keçîka zirav, Horiya Buhuştê ye!

Keçîka bejinzirav û dirêj bi awirên tûj li ya Qelew mêze kir û bi bişîrîn jê re got:

- şikir ji Xwedê re ku Wî ev bejina mîna şaxekî dara biyê zirav û tewanbar, mîna selvî badar û mîna sosinek xweşlihev daye min.

Gava radibim ez sivik im, rûdînim spehî û kubar im, bi henekên xwe ez

seriyan gêj dikim. Ez bêhnxweş û rih şêrîn im, rihekî min î besît û pak heye, ez ji hemî tevgerên ne kubar û hişk nefret dikim.

Keçika qelew, min çu carî nebihîstiyê ku dostekî, weha pesnê yara xwe bide: Ew qelew e mîna filekî û bi goşte mîna çiyayekî berz.

Lê berevajî hertim min bihîstiyê, gava dostekî yara xwe tarîf dike wisa dibêje: Bejna wê zirav, sivik û letîf e. Meşa wê welê sivike ku pêyên wê hema bêje çu şopê li pey xwe li erdê nahêlin. Bi pariyekî nan têr dibe û bi çend dilopan tîna wê dişike. Lîstik û mistdanên wê bi isûl û hembêzkirina wê bi şehwet û xwestinê dagirtiye. Ji beytikê bêtir nazik e, û ji şivan xapînkarnêtir jîndar e. Mîna hezeranekî tewanbar e. Bişîrîna wê bi xwestinê tije ye û nezaket taybetmendiyek wê ye. Gava ez wê berbi xwe dikişînim çu dijwariyê nabînim; û gava bi ser min ve, xwe xwar dike û bi xweşî û xwestineke spehî li ser çokên min rûdine, tevgera wê welê xweş û sivik e, mirov dibêje qey perikek dadikeve.

Keçika qelew, ma tu nizanî, ji bo min, ji bo ziravê, hemî dilên çê dişewitin? Yê ku êş û derdan di dilan de dixuliqîne û yên herî maqûlan jî dîn dike, ez im.

Li dawiyê, yê ku mewa tiriyê ye, ez im; ku xwe li darê dipêçe, karexazala zirav ya bi çavên xweşik, nerm û dilbirî ez im; û ji min re belesebe negotîne Horiya Buhuştê.

Herçî tu yî, keçika qelew, ez çend gotinan derheqê te de jî bêjim:

Tu, ey barê giran; qedene, tu mîna qazekê dimeşî; û mîna filekê dixwî. Di nav nivînan de têr nabî, dema bêhnvedanê tu dixwernedîtî yî.

Ka bêje, ma mirovê ku bi aletê xwe bigîje qula te -ku di pişt newal û çiyân de ye- heye?

Heke yek peyda bibe û bikeve nava te jî, dê bi hilatin û dahatina wî zikê te dê cardin vekîşe.

Herhal tu dizanî ku tu ji her aliyê ve qelew î; û tu hew ji tişteki re dibî ew jî ev e ku te bikin qelî û bifiroşin.

Niha rihê te jî mîna laşê te ye. Henekên te welê giran in ku mirov wextî pê bifetise. Lîstikên te yên nav nivînan welê qebe ne ku dikarin bibin sebebê kuştina mirovî. Kenîna te wisa hişk û nexweş e ku guhên mirovî ker dikin.

Gava dostê te di hembêza te de keseran dikişîne tu nikaî nefesê bigirî; û gava ew te hembêz dike tu ji ber xweydanê şil û mezeloqî yî.

Gava tu radikevî xirxira te ye. Gava tu şiyarî mîna mangeyekê fişîşa te ye. Gava tu bêhna xwe didî tu nikaî ji cihê xwe rabî, tu bi xwe li stûyê xwe dibî bar. Jiyan ji bo te ew e ku tu wek çêlekekê kayîna xwe bînî û mîna hêştirekê bêhnan vedî.

Gava tu dimîzî tu kirasê xwe şil dikî, heke xwestina şehwetê bi te bigre tu ji dêlikan xirabtir î; tu herî derekê tu tê de asê dibî.

Ji pêş ve mîna filekê, ji kêlekê mîna hêştirekê û ji paş ve mîna meşkekê yî.
Sedîsed şaîr behsa te dike:

*Ew mîna meşkeke dew giran e, kemaxên wê dişibin du giran û gava dimeşe
mîna zelzeleyê erd diheje.*

*Gava ji hêla çepê bêhemdî bayekî ji ber diçe, hêla rastê jî ji ekoyê bêpar
namîne.*

Gava Horiya Buhuştê ev tişt gotin, El-Yemenî ji wê re weha got: Bi rastî, ey Horiya Buhuştê, xweşbêjehiya te nayê te inkar kirin. Û zimanê te, Heyvbano, pir xweş bû. Lê niha dem e ku hûn herin cihên xwe yên berê, bila Kejê û Esmer werin bipeyîvin.

Bi vî awayî Tavbano û Pêtî rabûn, li hember hev rû bi rû sekinîn. Pêşîn ya kej ji reqîba xwe re got:

- Ez im, ya kej ku li Quranê bi firehî behsa wê dibe. Ya ku Xwedê dest nîşan dike ez im, gava dibêje: Rengê zer e ku çavan kêfxweş dike. Di nav temamê rengan de ya herî spehî ez im.

Rengê min mîrane ye, spehîbûna min digehîje sînore dawiyê û cazibeya min di pêleka herî bilind de ye. Yê ku nixê dide zêr, û şatafatê dide roj û stêrkan rengê min e.

Ew e ku xweşikbûnê dide sêv û hejîran û safranê bi mane dike. Ew e yê ku rengetonên kevirên bi qîmet dinimîne; û çêbûna zadî nîşan dide.

Gava erd ji ber pelên weşiyayî mîna xaliyeke rengîn dixuye û tîrêjên rojê di nav pelan re diçûrusin, ji bo wê spehîbûna rengzeriya xwe payîz spasdarê min e.

Lê tu keça esmer... Gava rengê te li derekê be nixê tiştan kêr dike. Çu tişt ji wî besîtîr û zîştîr nîne. Berê xwe bide gamêşan, keran, guran û segan. Ew hemî qehweî ne.

Ji min re nimûneyek bi tenê nîşan bide ku mirov bikare bi çavekî dostane û xweş lê mêze bike. Ne gul ne jî micewher çucar ne bûne qehweî. Lê eşkere ye ku sifir di rengê te de ye.

Tu ne reş î ne jî spî. Ji lewre mirov nikare gotinên pesindanê yên ji bo wan rengan ji bo te jî bi kar bîne.

Piştî vê axaftina Kejê, Yemenî weha got:

-Rê bide bila niha jî Pêtî bipeyîve!

Keça Esmer bi bişirîneke xweş û nerm cotegerdeniyên xwe yên ji mircan û spehî diyar kirin; ji bilî rengê wê yê hingivîn, canê wê bi formên sempatîk, bejineke efsanewî, tiştên dilbijokî û porekî reş ku bi keziyên giran daketibû ser kemaxên wê yên şahane; ew bêhnêkê ji bo xweşikbûna wê tesîrê li derûdor bike rawestiya; paşê dest bi axaftinê kir, berê xwe da reqîba xwe Kejê:

- Şikir ji Xwedê re, ez ne mîna qedeneyekê, ne jî mîna skeletekî çênekirime;

ne spî mîna kilsê, ne mîna safranê, ne jî reş mîna komirê; berevajî di rengê min de hemî hunerên mîrane û rengên herî spehî û formên herî xweşik civiyane, hatine ser hev.

Hemî şaîr bi hemî zimanan û di hemî deman de, bi hev re ketine reqabetê da ku pesnê min bidin; yê ku li hemî wextan hemî mirovên zane dibijêrin ez im.

Ne ku ji bo ez pesnê xwe bidim, ne hewce ye, ez ji we hêvî dikim guh bidin tenê şîrekê ku ji bo min hatiye gotin. şaîrekî weha gotiye:

Yên esmer ji mêj ve di nav rengê xwe de nêhênîyeke letîf û şêrîn vedişêrin. Ma tu dikarî texmîn bikî ku dê çavên te nema li yê din mêze bikin.

Ew, remildarên hunermend, dekbaziya hunerê dizanin; melekê Harût divê gelekî tiştan ji wan fêr bibe.

Yekî din gotiye:

Ez ji esmera ku aqil ji serê min bibe hez dikim;

Rengê wê min diêxe bin sihrê, bejina wê mîna rima şervanekî ye.

Gava ez şana reş ya mîna hevrîşimê nerm ku rindiyê dide gerdena wê, mist didim û radimûsim, diricifim.

Bi rengê canê xwe ve, bêhna xweş ku jê difûre dişibe emberê.

Û gava şev siya şala reş bi ser xwe de dikişîne, wê gavê,

Ew, keça esmer, tê cem min. Û li ba min dimîne heya ku sîdan rengê xewnên me digirin.

-Lê tu, keça zer, tu, ya çilmisî, mîna rengê pelê milxiyê ku mirov li *Bab-El Lukê* bide ser hev, hişk û tije talaş in.

Rengê te û dîzikan wek hev e, yê ku wan bi kar jî tînin, kesên serûpêfiroş in.

...

Rûyê te mîna sifirê zer e, dişibe fêkiyên dara ziqûmê, ew dara ku li dogehê qehfê serê şeytanan wek fêkiyan pê ve ne.

Û şaîr ji bo te gotiye:

Qederê keçîkek ku rengê canê wê zer e kiriye para min; rengê wê wisa fehş e ku serê min pê diêşe, bi dîtina wê re dil û çavên min bêhuzûr dibin.

Eger rihê min hîn biryar nedabe ku dev jê berde;

Ez dê qerar bidim û welê li bin guhên xwe bidim ku diranên min bikevin.

Piştî ku Yemenî ev gotin bihîstin, gelekî kêfxweş bû; pîrçînî pê ket û wisa kenîya ku li ser piştê ket, paşê ji wan cêriyan re jî got, herin cihê xwe; ji bo nîşan bide da ku hemî cêriyan, ew gelekî kêfxweş kiriye, wî diyariyên giranbiha ji cil û micewheran û bi qasî hev dan wan.

Têbinî: Ev çîrok ji berhevoka Hezar û Şevkê hatiye wergerandin.

Casimê Celîl

90 saliya xwe tije dike

Ji tîpên krîlî: Rohat Alakom



Casimê Celîl

Wezîrê Eşo

(Ji ber 80 saliya Casimê Celîl di sala 1988an de li Erîvanê pirtûkeke bi navê Bijare hatiye weşandin. Di vê pirtûkê de çend berhemên nivîskar çih girtine. Wusan jî nivîseke Wezîrê Eşo ya dirêj li ser jiyîna Casimê Celîl di vê pirtûkê de hatiye weşandin. Piştî weşandina pirtûkê deh sal derbas bûne. Bi minasebeta 90saliya Casimê Celîl me çend beşên vê nivîsê bi kurtkirî guharte tîpên latînî û li vir pêşkêşî xwendevanên kovara Çirayê kir. Ji mala Casimê celîl wek ocax û navenedeke çanda kurdî çend nefereyên mayîn jî derketine ku di warê folklor, dîrok û edebiyata kurdî roleke mezin lîstine, wek Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl, Cemîla Celîl û Zîna Celîl).

Casimê Celîlê Osê di sala 1908an de li gundê kurdan yê Qizilqulê, li nehîya Dîgorê (qeza Qersê) ji diya xwe bûye. Qizilqulê gundekî ji 16 gundên êla kurdên vê nehîyê bû: Şîrînkoy, Emençayir, Şatiroroxlî, Qozilce, Qereqe, Eyle, Dûzgeçît, Engugu, Dîgor, Bacelî, Sûsîz, Taşnîk, Hesencano, Soxitlî, Sîçan.

Ev gundên kurdan yê Ezdî ji dor û beran qetiyayî û dorgirtî nîn bûn. Di nav gundên misilman û ermenîyan de bûn, ew gund jî bi rêz di nava wan de bûn. Gundên kurdan yê mezin li vir gelek bûn. Bazarcix, Tirmaşên, Balem, Sorxulî, Alece û ên mayîn. Gundên ermenîyan yê nêzik cînar evên han bûn: Mevreg, Zibnî, Zixçî, Akrak, Dîgora Ermenîyan. Him kurdên misilman, him kurdên ezdî, him jî ermenî gişk bi hevra bi aşîtî, bi cînarîke qenc û bi xêrxwazî dijiyan, didebirîn.

Êla kurdên ezdî bi deba kal û bavên jiyana derbas dikirin, ew deb jî ya patriarxaliyê (hukimbav) bû ku bi sal û zemanan nehatibû guhastinê. Belê, qeyde û qanûnên civatê, pêwendiyên civakî, tê qey bêjî, ber sur-serma meha çile qerimî bûn, hatibûn parastinê.

Rûniştvanên Qizilqulê mîna her panzdeh gundên mayîn bi çih bibûn, yanê ne

koçer û nîv-koçer bûn. Li vir heqe em bêjin wekî gotina "koçer" cîhê tê û netê bi milletê me ve dikin. Hatiye îspatkirinê, wekî piraniya civata me ya bingehîn bi cîhbûyî, cotkar bûye, di gund û bajaran de maye. Tenê hinek qebîle hebûne ku nîv-koçer bûne. Mala bavê Casim dewletî nîn bûye, ne jî belengaz. Bavê wî Celîlê Osê xwedî hesp bûye, siyarê hespê nêr-ereb. Wusan bû: yekî du kulek jî ber derê wî hebûne, ji xwe re bi rastî hesp dikirîn, wekî di şahiya de ji hevalhogirê şûnda nemîne, ew jî bikeve cirîdê. Casim delaliyê malê bûye, tek-tenê. Ew hezkiriyê dayîka xemxure dilşewat, Cewara Cewo bûye. Casim wusan jî delaliyê du xûşkan bûye: Xecê û Zelxê. Hemû metên wî, Şerê û Gevezê, çawa dibêjin xwe qurbana wî kirine. Di heft û heşt saliya xwe de êdî pişkoriyê malê bûye, fîq di dêst de bi heval û hogiran re çûye ber berxan. Payîz û zivistanan jî disa li rex wan binpiya odan û orta govendan de rûniştiye. Dersdar û şîretkarê wî yên pêşin ew mêrên mezin bûne, ên ku di odan de çarmêrkî ser sekûya rûniştine, derd û kulên xwe û enînivîsa millet rêtine û derbarê rewşa dinê de gilî kirine. Lê, heyf vê jiyana aşîtiyê dirêj nekişand. Sala xezebê, zordestî û zilmê di sala 1918an de hat û bi hezaran malên kurdan û ermeniyên re mala bavê Casim jî bar kir, wekî ji qirê, ji şûrê Romê xelas bibe.

Hêsîrên kurdan û ermeniyên hatin ber devê Ava Reş (Axûryanê), wekî derbasî vî berî, aliyê deşta Şîrakê û Araratê bin. Şev nîvê şevê bû heydade, got: "Rom hat!". Hêsîr nivîna ser çevên xwe, nanê riya xwe hişt û li avê ket, da nav çemê biharê yê gur û gelek di ro de çûn. Geveza met qîza xwe vî berî dihêle û kurê birê yê tek-tenê. Casim derbasî vî berî dike. Heta li qîzê dizvire, heta li vir de xwe dixurdile, heta wê de - qîz jî bi pêlên Ava Reş re diçe.

Casimê Celîl pêşiyê dikeve sêwîxana Aleksandropolê (Lenînakan), paşê ya Celaloxliyê (Stepanavan). Di sêwîxanê de ew hînî xwendin û nivîsarê dibe. Paşê qedê wî tîne Erîvanê. Ew bere-bere qewim û pizmamên xwe dibîne, meta wî Şerê lê dibe xweyî. Ew li Erîvanê bêminet dijî, çimkî qezîya êrîşa ordiya Tirkîyê bihurîbû, ew li Serdaravê hatibû hincirandinê û li Ermenîstanê sazûmana Sovyetê hatibû pêkanînê. Ew hînî pêşê elektrîk-mekanîkê dibe û gelek wext di elektrostansiya Erîvanê ya pêşin de kar dike. Hema li vira jî wî zilamî di nava cêrgên Komsomolê qebûl dikin û ev yeka ha mîna tiştêkî per û baskan dide wî. Ew di bajêr de ewqas berbiçav dikeve, wekî di sala 1927an de Kommerkeziya Partiya Ermenîstanê ya Kominîst ewî dişîne Bakûyê, xwendegeha leşkeriyê. Piştî demekê ewî cîguhîstî xwendegeha bajarê Tiflîsê ya leşkerî dikin. Di sala 1931an de Casimê Celîl, zilamê gihîştî, qalbûyî, perwerdê leşkerî hildayî, hizreta millet, qewim û pizmama dil de dibistanê xelas dike û vedigere Erîvanê. Hema wê salê jî li paytextê Ermenîstanê xwendinxana kurdî ya Pişkafkasiyê ya pedagogiyê vedibe û Casimê Celîl wek serokê wê yê pêşin kivş dikin. Ew digihêje miraz û armanca xwe, mecalê dest tîne ku bi kêrî cîmaeta xwe û

pêşketina wê ya medeniyetê bê. Û ji bo vê yekê wê demê li Errîvanê merc, mecal û îmkanên mayin jî saz bibûn. Elîfba kurdî li ser bingehên latînî hatibû çêkirinê. Dest bi çapkirina pirtûkên dersan bibû bo dibistanên kurdan. Di sala 1930yê de rojnama Riya Teze ronahî didît. Li Erîvanê bere-bere ronakbîr û xwendiyên kurdan yê pêşin hev digirtin û Casimê Celîl jî gihîştê wê komê û di nava wê de dest bi karkirina xwe ya afirandariyê, medeniyetê û mirovatiyê kir. Wê hênê û çend salên pey wê re êdî çawa nivîskar û dersdar, karkerên medeniyetê Ereş Şamîlov, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Cerdoyê Genco navdar bûn, tevî kîjanan Casimê Celîl kevîrê rikinên edebiyat û medeniyeta kurdên Sovyetê yê pêşin danî. Di vê xwendinxanê de tevger û merîfeta wî ya organîzekirinê tam diyar bû. Di xwendinxaneke wusan de serkarîkirin hêsan nîn bû. Gelek xwendevan ji aliyê



Beşek ji berhemên mala C.Celîl

Casimê Celîl afirandinên ji zimanên mayin werdigerîne kurdî û dide çapkirinê wek çend afirandinên A. Pûşkîn, Hovh. Tûmanyar, Xinko-Apêr, Arkadî-Gaydar. Ew wusan jî çend xebatên K. Marks û V.I. Lenîn tevî R. Dirampyan û Nurî Hîzanî werdigerîne kurdî.

Sala 1937an hat ya ku çawa dibêjin mîna kêrê bide penêr, wusan navbirî da pêştaçûyina edebiyat û medeniyeta kurdan li Yekitiya Sovyetê, xazima li Ermenîstanê. Rojnama Riya Teze girtin, xwendinxane girtin, dibistanên kurdan yê dersdayinê bi zimanê kurdî dane hilanînê û pêra jî çapkirina pirtûkên dersan. Ji sala 1938an şûnda hetanî nîveka salên 1950yê bawer bike tu pirtûkên helbestvan û nivîskarên kurdan nehatin çapkirinê. Diha rast nava deve-devî 20 salan de tenê 5 pirtûkên kurdî ronahî dîtin. Sala 1937an çend kedkarên edebiyat û medeniyeta me girtin: Ereş Şamîlov, Heciyê Cindî, Cerdoyê Genco, Ahmedê Mirazî, lê wusan jî bolşevîkê kevin Şemo Têmurow. Lê salekê şûnda, xên ji Ereş Şamîlov, ên din berdan. Û nava vê derecê de keda Casimê Celîl jî heye, ê ku di dadgehê de xurt pişta heval û hogirên xwe yê qelemê sekinî û elam kir: *'Eger ew dijminên cîmaetê ne, waha ne, çawa hevalê wan, ez jî mirovekî waha me'..*

Meydana medeniyeta kurda xalî bû. Casimê Celîl ji xebata hezkirî-çapkirina

pirtûkên kurdî hate birînê, diha rast, çapkirin hate sekinandin û ew derbasî ser xebateke mayin bû. Pêşiyê ewî biryar da ku xwendina xwe tam bike. Sala 1938an ew di Fakulteta Instutiya Pedagogiyê ya ser navê X. Abovyan de tê qebûl kirin. Bi serfirazî vê zanîgehê xelas dike û piştra dibe dîrektorê dibistana ortê ya êvarê (dibistana Nar-Dosda li Erîvanê)...



Di sala 1948an de berevoka *Efrandinên Nivîskarên Kurmanc yên Sovyetê* ya çaran hate weşandin ya ku Casimê Celîl amade kiribû. Di sala 1949an de bi wergera Casimê Celîl pirtûka Aleksandir Pûşkîn hate weşandin. Di sala 1954an berevoka *Nivîskarên Kurmanc yên Sovyetê* dîsa bi hazirkirina Casimê Celîl der çû.

Dimenek ji xebata Cemîla Celîl a berhevkarîya folklorê kurdî

Di etapa pêştaçûyina edebiyat û medeniyeta kurdî ya teze de, ku ji nîveke salên 1950yê dest pê dike, Casimê Celîl xwendevanên kurd bi çend pirtûkên xwe yê helbest û poemana dana şakirinê. Piştî navbiriya dirêj re, kîjan hêna zordarî, pêpesiya hebandina nevsê de qewimî, dîsa dest bi çapkirina pirtûkên kurdî bû, pêra jî Casimê Celîl. Û di vê etapê de pirtûkên helbestvanan pey hev li Erîvanê tên weşandin: *Rojê min* (1960), *Kilama Çiya* (1970), *Oda Kurda* (1975), *Kurdên bengî* (1980), *Kofîya diya min* (1984), *Şîer û poem* (di salnama Biharda, sala 1987). Casimê Celîl wusan jî gelek poem nivîsîne, wek Memê û Zînê, Memê û Eysê, Zembîlfiroş, Leylê û Mecnûn, Dim-Dim, Sindirnevat, Ker û Kulik, Hikiyeta Delî Ahmed û Delî Hemze, Sêva Hacê, Şêx Mîrza, Kilama Hozebêk.

Gelek kes tî wekî pirtûkxane û arjîva mala Casimê Celîl ya dewlemend û arjîva wan bibînin. Ew pirtûkxana û arjîv bi bingehe kurdnasiyê ewqas dewlemend e ku, wekî her navendeke kurdnasiyê bi eşkere dikare bi fikira qenciye dexesiye jê bike. Ev berhem payê pirîn bi destê Casimê Celîl hatine berevkirinê; jî pirtûkan bigire hate sûretan. Serokê vê pirtûkxanê û arjîvê jî dîsa Casimê Celîl e.

A bi vî tehrî, tomerîkirina gotinên xwe em dikarin bêjin wekî keda Casimê Celîl di nava pêştaborina hemû derecên edebiyat û medeniyeta kurdan de, kurdnasiyê de heye. Ji afirandariyê, helbestvaniyê bigire heta çapkirina pirtûkên kurdî, dengnivîsar û herfnivîsara folklorê, hazirkirina pirtûkên dersan, karkirina nava dereca xwendina cimaetê de, jî karkirina civakî bigire heta derecên medeniyeta netewî yê mayin. Navê kedkarê medeniyetê yê waha nayên ji bîr kirin, dimînin.

Edebiyat û nivşên wê

N.Zaxuranî

Mirov dikare bi hesanî bibêje ku, dîroka edebîyatê mîna dîroka mirovantîyê gelekî kevnarî bi şax û per e. Edebîyat, serçavîyên xwe ji diroka mirovantîyê ya rengîn digire. Bêguman, bi guhertin û geşbûna jiyana mirovantîyê ya bi reng civakî re, edebîyat jî, di serpêhatina dem û dewranan de ber bi guhertin û geşbûnê ve diçe. Ji xwe, gava ku mirov di serpêhatina dem û dewranan de li dîroka edebîyatê dikole, mirov bi çavê serê xwe dibîne ku, vegotina edebî di nava xwe de tê dabeş kirin. Mirov bi alîkarîya vê dabeşkirinê nivş / cureyên edebî yên ku xwedîyên vegotinên ji hev cuda ne, ji hev vediqetîne.

Hê ji serdema Yewnanîstana Kevnar ve, li ser nivşên edebîyatê ji alîyê filozofên wê çaxê yên mîna Platon û Arîstoteles ve, di nivîsandinên xwe yên bi reng felsefî û estetîkî de hatibû rawestandî. Di vî warî de, berhema herî berbiçav berhema Arîstoteles ya bi navê **“Poetîka”** ye. Arîstoteles, di vê berhema xwe de behsa sisê awayê vegotinê, an jî, pêşkêşkirina bi reng hunerî dike. Ango, bi peyva wî, li ser sisê şêweyê ku, mirov bi alîkarîya wan dîyarde (fenomen) û serpêhatîyên bi reng civakî û xwezayî **“taqlîd”** dike, mijul dibe. Ka em bi hev re, di vî warî de guh bidin Arîstoteles bê çî dibêje: **“Di nav nivşê hunera eynî / yek zimanî de, objeyek dikare bi awayên ji hev cuda bê taqlîd kirin. Him li ser navê xwe, him jî li gore cih û zeman bi xwe xistina şiklê şexsiyetên din, dikare bi awayên ji hev cuda bê taqlîd kirin.”** Bêguman, îro roj bi saya vê tasawûra Arîstoteles ya di derbarê nivşê edebî de, ku bi awayekî kurt di rêzên jorîn de hate pêşkêş kirin, bingehe sisê nivşê edebî yên ku li gor normên naverok û forma berhemên hunerî tên hunanadin, hatîye danîn.

Ji xwe, mîna ku tê zanîn, ev hersê nivşên - epîk, dramatik û lîrik - edebî ji destpêka jiyana civakî ya mirovantîyê û vir de hêdî bi hêdî peyde bûn û ji alîyê celebekî gihast celebên din. Li ser peydebûna nivşên edebî Aleksander Veselovskî lêkolîneke giranbiha ya bi navê **“li gorî awira dîrokî hunera zimên”** li dar xistîye. Aleksander Veselovskî di prosesa hunandina vê lêkolîna xwe de hewl dide ku, edebîyata serdema me ya ku di nava xwe de li gor nivşan dabeş dibe, raxîne ber çavan. Ji vê yekê wîrdetir, wî hewl dida ku, bi saya vê lêkolîna xwe bê çawa jiyana edebî li ser bingehe kevneşopîya jiyana civakî ya kevnar li gor hinek pîvanên edebî nivş bi nivş ji hev vediqete, ji bo aligirên tevgera edebî destnîşan

bike. Li gore wî, lawik û stranên merasîman yên ku ji alîyê koroyan ve li meydanên dansê an jî, bi gotina me kurdan di nav dîlan û govendan de dihatin gotin, di bingehê xwe de ifadeya qêrîn û hawarên şînê an jî yên şahîyên bi reng tevehî bûn. Bêguman, di nav prosesa dîrokî de ev qêrîn û hawar hêdî bi hêdî ji çarçova bicihkirina merasîman derketin, vegotinên bi reng lîrîkî peyde bûn. Heçî serbirrên serekî yên koroyan bûn, bûne serçavî ji bo vegotina awayên epîkî bi xwe. Pişt re jî, ev vegotin ji çarçove vegotina bi reng koroyî derketin, hêdî bi hêdî ber bi çarçoveyê stranên mêrantîyê û destanan ve çûn. Ji alîyê din ve jî, stranên ku endamên koroyê li hev vedigarandin û digotin, bûne bingeh ji bo vegotina bi reng dramatikî.

Îro roj , bi saya lêkolînên bi reng zanistî yên ku ji alîyê mirovên edebîyatzan ve têne li dar xistin, nerîn û ramanên Aleksander Veselovskî yên di derbarê kar û barê edebî de serast dike. Mînak, ji alîyê zanistîya edebî ve hatîye isbat kirin, ku lawik an jî melodîyên bi reng dramî li dorbera merasîmên ku bi mebesta / amanca şînê an jî şahîyan dihatin li dar xistin, peyde bûne. Ji ber ku, yên ku tevlî kar û barê merasîmên şahîyê an jî şînê dibûn, di dema dans an jî dîlanê de bi awayekî melodîk stran li hev vedigerandin. Bi saya vê lihevvegerandinê jî, hêdî bi hêdî stran û lawjên bi reng dramî peyde bûn.

Bêguman, mirov weha bi hêsanî nikare vê yekê ji bo lawik û leylanên bi reng epîkî û lîrîkî bibêje. Ji ber ku, hinek awayên vegotina bi reng dengbêjî li ser mîtolojîyên ku, di şiklê çîrokan de dihatin gotin, ji alîyê dengbêjan ve di nav civat û şevbêrkên mirovantîyê de dihatin pêşkêş kirin. Ji xwe, mîna ku tê zanîn, ev mîtolojî û çîrok ne bi awayekî melodîkî lê belê, bi awayê çîrokan di nav civatan de ji alîyê mirovên çîrokbêj ve bi awayekî destankî ji civatê re dihatin gotin. Heçî melodîyên bi reng lîrîkî bûn, hema bibêje di warê hemû jiyanê de şax û perên xwe berda bûn. Bi rastî jî, gava ku haya mirovî di prosesa bi reng dîrokî de ji civata Kurdistanê hebe, mirov rind dizane ku, çîrokbêj û dengbêjan bê çawa bi vegotinên xwe yên rengîn şevbêrkên dirêj yên me kurdan xweş û geş dikirin. Bi qasî ku tê zanîn, di van şevbêrkên ku bi pirranî li eywanên mîr û giregiran de dihatin pêk anîn, çîrokan Mala Zalê, destanê mîna Memê Alan, dramên bi reng evînî yên mîna Siyabend û Xecê, şerên mêrantîyê yên mîna Hemê Gozê û Eliyê Betê ji alîyê dengbêjan ve ji civatê re dihatin gotin. Ji alîyê din ve jî , em dizanin ku, melodîyên bi reng lîrîkî di êvarên înan de, di Belûteya Faqîyan de bi coş û qêrîn feqîyan ref bî ref li hev divegerandin. Bi saya vê bêlûta feqîyan li bajar û gundên Kurdistanê şahîyên xwezayî yên bi reng gelêrî dihatin li dar xistin. An jî, gava ku keçên Kurdistanê li dorbera destêr digahan hev, safar, simd, hûrîk û serîkê genim li destêr dikirin û lawik, leylan û melodîyên evînê yên cur bi cur li hev divegerandin, qêrîn û nalîn dikete nava gundên Kurdistanê. Bi peyveke din, wî çaxî pêlên coşê mîna pêlên Firat û Dicleyê şax û perên xwe tavêtin ser bajar

û gundên Kurdistanê. Di nava van pêlên coşê de keç, law, bûk, bav û kalan bi carekê re li wan guhdarî dikirin.

Herweha, dema ku paleyên ceh, genim, nîsk û nahkan / nokan ref bi ref di nava zevîyên çandî de paleyî dikirin û li gel vê paleyîya xwe stran û leylandin bi reng folklorîk yê kurdî li hev divegerandin, qêrîn û hawar bi nawal û deştên Kurdistanê diket. An jî, gava ku mirov bêne bîra xwe : Di kêlîka ku zava û bûk bi destên hevdu digirtin û xwe berdidan nava dîlanê û zerîyan li dora wan melodîyên bi reng folklorîk li hev divegerandin, pêlên şahîyê mîna xunava biharê bi ser rêzên govendê de difûriyan. Ji xwe, mîna ku baş tê zanîn, şahîyên ku bi munasebeta Newrozê di destpêka bihara rengîn de li seranserê Kurdistanê ji alîyê hemû refên gelê kurd ve dihatin pîroz kirin, bihara Kurdistanê bêtir xweş û rengîntir dikirin. Dê bela vê yekê bê ku şahî û seyranên Cejna Newrozê bûne mijar ji bo çarînen şairên me yê mîna Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û yê din. Bêguman, wan jî bi alîkarîya çarînen xwe pîrozkirina Newroza me kurdan bêtir bi wate kirin.

Vêca, mîna ku bi hêsanî ji mirovî tê xwîya kirin, mecal ji bo geşbûn û balbûna edebîyata me ya îroyîn / nûjen heye ku, di warê hemû jiyandê de bipîşkive. Lewra, rayên folklorê me xwe berdidin nav kûrahîya dîrokê. Bi saya vê yekê, edebîyata me ya îroyîn dikare pêşkeve. Lê bêguman, ji bo pêkanîna vê pêşketinê hewldanên bi gelek alî pêwîst in, ku ji alîyê ronakbîrên me kurdan ve bêne li dar xistin, da ku edebîyata me bikaribe li ser bingehê folklorê me ya netewî şax û per bide. Herweha, mirov dikare bibêje ku, bi giştî huner û bi taybet jî edebîyat serçavîya xwe ji cerg û dilê jiyana civakî ya ku di çarçoveyê neteweyî de tê pê, digire. Bi peyveke din, bê çiqasî jiyana civakî rengîn e, ewqasî jî, vegotinên bi reng edebî jî bi gelek alî ne.

Bêguman, di vî warî de li vir an jî li wir hewldanên - herçiqas li gor hewldanên ku ji alîyê rewşenbîrên netewên din ve tên li dar xistin, qals bin jî - pîrozî giranbîha ji alîyê rewşenbîrên me kurdan ve tên pêk anîn. Mirov êdî dikare bi dengê bilind bibêje ku, edebîyata me hêdî bi hêdî kirasê xwe yê berê yê bi reng kevneşopî diqetîne, li gor pîvanên hevçaxî bi şax û per dibe. Ji ber gava ku mirov li berhemên edebî / hunerî yê ku ji alîyê nivîskar û hunermendên me ve tên berhem kirin, dinere, hema bibêje mirov liqayî hemû cure berhemên bi reng edebî tê.

Bêguman, di serpêhatina dem û dewranan de bi geşbûna edebîyatê re nivîsên edebî him bi wate(mane) him jî mîna mefhûm herdem ber bi guhertinê ve çûne. Li ser vê yekê, mirovên mîna Schiller, Goethê û Hegel di dawîya sedla 18an û di destpêka sedsal 19an de hewldanên bi rêk û pêk li dar xistine. Di pey wan re, edebîyatzanên mîna Belinskî di vî warî de kar û barên bi rûmet li ser rêça wan domandîne. Biqasî ku, ji kar û barê Belinskî yê edebî tê têgihiştin, nivîsên edebî

yên mîna epîk, lîrîk û dramatîk li gor naveroka xwe ji hev tèn veqatandin. Ji bilî vê yekê, Belinskî ev nivşên edebî li ser bingehe obje û subjeya zanistîya hunerî ji hev cuda dikirin. Li gore Belinskî, berhemên epîkî xwedîyê têkilîyên bi reng organîkî ne, bi objeya zanistîyê re. Ji ber ku, berhemên epîkî him ji alîyê hunera bi zîmên ve, him jî ji alîyê xwendevan û nivîskarê wê ve objektîv in. Hunermend di prosesa vegotina berhema de, xwe bi carekê re dide alî û mirov dibê qey bûyer ji wî xweser têne pê, lê belê ji alîyê wî ve tèn vegotin. Li pêşberî vê yekê, li gore Belinskî heçî lîrîk e, subjektîv e. Ji ber ku, li ser şaîrî bi xwe diraweste. Heçî nerîna Belinskî ya li ser dramatîkî bû, bi kurtî ev e: Wi li dramatîkê mîna hevbeşdarîyeke ku, ji objektîvîya epîk û subjektîvîya lîrîk dihat rapêçan, dinirxand.

Bi rastî jî, gava ku mirov di vî warî de ji serdema Belinskî ta roja me li encamên lêkolînên ku li ser edebîyatê hatine li dar xistin, dimeyîne, mirov bi hêsanî têdighe ku, nerînen Belinskî yên ku li ser nivşên edebî hatine pêk anîn, mirov dikare iro roj jî, ji bo kar û barê edebî weke bingehe ji xwe re bigre. Li gel vê yekê jî, bî ya min tasawûra Belinskî ya ku, ji bo nivşê dramatîkê dibêje, ma gelo mirov nikare ji bo epîk û lîrîkê jî bibeje? Heger ku mirov nexwaze ku, mîna Belinskî bi yek alî di vî warî de birame, mirov dikare bi hêsanî bibêje. Lêbelê ji ber ku, ne bi tenê nivşa edebîyatê ya dramatîkê xwedî alîyê objektîvî û subjektîvî ye, herweha vegotinên epîk û lîrîk jî, ji alîkî ve unsurê objektîvî û ji alîyê din ve jî unsurê subjektîvî di nav hunandina xwe de bi cîh û war dikin. Bela vê yekê jî, her berhema edebî ne bi tenê rastîya bi reng civakî di xwe de bi cîh û war dike, herweha raman û tasawûrên nivîskarî yên di derbarê rastîya jiyana civakî de jî radixe ber çavên xwendevanan. Ji ber ku, gava xwendevan berhemeke bi reng hunerî dixwîne, bi tenê hîni mijara berhema hunerî nabe, herweha bê raman û xeyalên nivîskarî yên di derbarê vê mijarê de çî ne jî, fêr dibe.

Biqasî ku tê zanîn, berhemên edebî di nava xwe de têne dabeş kirin, Mirov dikare vê dabeşkirinê di çarçova sê grûb an jî nivşan de li hev bicivîne. Ew jî ev in: Ya yekê, epîk e, ya duduan, dramatîk e, ya sisêyan jî, lîrîk e. Herçiqas ev nivşên edebî di gelek waran de taybetmendîyên wan yê hevpişk hebin jî, di bingehe xwe de, her yek ji wan, xwedî pîvan û sixletên xwe yên xweser in.

Ji ber vê yekê jî, gava mirov berhemên epîkî û lîrîkî dixwîne, mirov bi çavên serê xwe dibîne ku, bi gelek alîyên xwe ji berhemên lîrîkî cuda ne. Mînak, berhemên epîkî û dramatîkî bi tuwanên (îmakanên) xwe yên zanistîya bi reng hîndarî ji berhemên lîrîkî dewlementir in. Di prosesa hunandina berhemên epîkî û dramatîkî de bûyer di nav çarçova cih û zamanî de tèn vegotin. Bêguman, kes û peywendîyên wan yên bi hev re li gel tasawûr û çalakîyên wan têne pêşkêş kirin.

Herçiqas, di prosesa hunandina berhemên epîkî û dramatîkî de şirovekirina

nivîskarî ya di derbarê vegotina jiyana civakî û karakterên wê de hebe jî, mirov gava ku wan dixwîne, mirov dibê qey bûyerên ku, di serpêhatina hunandina berhemên hunerî de hatine li dar xistin, ji îrade û daxwaza nivîskarî derin. Bi peyveke din, berhemên edebî yên epîkî û dramatikî xapandineke objektif bi mirovî re peyde dikin. Li gel van hevpişkên berhemên edebî yên epîkî û dramatikî yên wek hev, bêguman cudabûnên wan jî yên di warê uslûbî de hene. Tevina berhemên epîkî bi saya vegotina bûyer û çalakîyên di jiyana mirovî de tîpîk anîn. Heçî hunandina berhemên dramatikî ye, ji vegotinê wîrdetir, hewldan / kiryarî unsura herî serekî ye. Ji ber vê yekê jî, di rapêçana metnên berhemên edebî yên dramatikî de îfade û peyvên ku di serpêhatîna hunandina berhemê de di şûna çalakî û hewldanên wan de têne gotin, tê pê. Bela vê yekê jî, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku, usluba berhemên dramatikî li ser bingehe şanûgerîyê hatîye peyde kirin.

Heger ku mirov bi xwaze behsa berhemên edebî yên lîrîkî bike, bi kurtî mirov dikare di derbarê wan de weha bibêje: Li Yewnanîstana Kevnar berhemên edebî yên lîrîkî navê xwe ji instrumenteke ku lawca û leyvan pê re dihatin gotin, girtine. Berhemên edebî yên lîrîkî ji berhemên edebî yên epîkî û dramatikî bi objeya xwe ya zanistîyê tîpîk veqatandin. Bela vê yekê jî, berhemên edebî yên lîrîkî hema bibêje li ser bûyer û tîkîlîyên di nav mirovan de bi awayekî detay û bi gelek alî dirawestî. Di destê pêşî de, nerîn û hesasiyêtên wan ji xwe re dikin mijar. Ji ber vê yekê jî, di vegotina edebî ya bi reng lîrîkî de unsura subjektîv xwedî cihê girîng e. Ev yaka ha jî, bivê nevê li ba xwendevanan sergêjîyêke bi reng subjektîvî peyde dike.

Li ba hevbeşkirina edebîyatê ya nivîsî, berhemên edebî bi alîyên xwe yên qafîye/ nazm û bexşane jî ji hev tîpîk veqatandin. Herçiqas, carinan berhemên edebî yên lîrîkî mîna berhemên bi qafîye û berhemên epîkî jî mîna berhemên bexşane bêne pejîrandin jî, lê di rastîya xwe de hercar mirov weha bi hêsanî nikare wan destnîşan bike. Ji ber ku, di her cure berhemên edebî de berhemên ku, bi awayê çarînan an jî bi qafîye hatine nivîsandin hene. Bêguman, li ba vê yekê eserên ku bê qafîye ango, yên ku bi awayê bexşane hatine nivîsandin, mirov li wan rast tê. Dî demên berê de, piranîya destanan bi awayekî bi qafîye dihatin vegotin. Mînak, destana Memê Alan ya Ehmedê Xanî ku di nava me kurdan de bi navê “Mem û Zîn” tê nas kirin. Herweha, di çaxên piştî wê de jî, roman û çirokên ku, bi qafîye hatine nivîsandin, li vir an jî li wir mirov liqayî wan tê. Mînak, “Yevgenî Onegîna” Puşkîn û “Don Juana” Byron. Ji alîyê din ve jî, gava ku mirov li ser vê yekê bi rêk û pêk diraweste, mirov dibîne ku, berhemên edebî yên dramatikî carinan bi qafîye, carcaran jî bi awayê bexşane hatine nivîsandin. Mînak, gelek pîyes an jî leyztîkên W. Shkespeare bi vî awayî hatine berhem kirin. Heta bi berhemên edebî yên lîrîkî ku bi pirranî bi awayekî bi qafîye tîpîk

berhem kirin, carcaran bi awayê bexşane tên berhem kirin. Mînak, gelek ceribandînen Îvan Turgenyev bi sernivîsa "şîrên Bexşane" hatine berhem kirin.

Ji aliyê din ve jî, divê mirov bibêje ku, hinek pirsgirêgên din hene, ku li dorbera sîstemeke terman / bêjeyan tên rapêçan û ji bo hîndariya nivş / cureyên edebî gelekî girîng in. Mînak, carcaran behsa "wesfê epîkî" tê kirin, mebest ji vê yekê ew e : Yê ku tê wateya epîk, angî, yê ku hebûna epîkî li gel sixletên wê yê edebî di nav hunandina xwe de bi cih û war dike. Carinan jî, behsa "wesfê dramatikî" tê kirin, bêguman amanc ji vê yekê ew e : Yê ku hebûna bi reng dramatikî di nav rapêçana xwe de bi cih û war dike. Herweha li vî alî an li wî alî behsa "wesfê lîrîkî" tê kirin, amanc ji vê yekê jî ew e : Yê ku hebûna edebî ya bi reng lîrîkî di nav hunandina xwe de bi cih û war dike, ji xwe re dike mijar. Bi alîkariya van mefhûman, mirovê edebîyatzan hewl dide ku, li ser hinek wesfên edebî yê ku ji nivşên edebî cuda ne, raweste.

Bela vê yekê jî, gava ku mirov behsa wesfên epîkî dike, divê ku di destê pêşî de kesê ku ji nerîneke dîyar jiyana civakî ya rengîn li gel hemû nakokî û aliyên wê yê ji hev cuda bi detay - hur û kûr - li gor raman û tasawurên xwe dinirxîne, pêwîst e, ku mirov tê bigihe. Bi tenê, bi saya nerîneke weha mirov dikare bi hêsanî berhemên **Homeros** û yê **Ehmedê Xanîmîna** epîkên bi reng cihanî destnîşan bike. Ji ber ku, naveroka berhemên wan yê edebî têgihîştineke bi reng globalî di xwe de bi cih û war dike.

Heçî wesfê dramatikî ye, mirov dikare weha bi vî awayî bi xwendevanan bide danasandin : Atmosfereke civakî ya ku ji ber nakokiyên ji hev cuda mîna beroşa safarê dikele, bi mirov dide xuya kirin. Ji ber vê kelandîne jî, pêlên aloziyê hemû war û qadên jiyana netewî ya bi reng civakî radipêçe. Ji ber vê rapêçana alozî tevlihev bûyer û serpêhatiyên civakî yê cur bi cur mîna kumikên Newala Bûnisra tên pê. Angî, xeml û xeza jiyana civakî ji ber aloziyên netewî ber bi çirmisandinê ve diçe. Ji ber vê yekê jî, herkesê ku di nava jiyana wê civakê de dijî, bi awayekî ji awayan ev alozî û tevlihevîya jiyana civakî bandorê li ser dike.

Vêca, heger ku mirov li pêşberî vê yekê, wesfê lîrîkî bixwaze hîn bibe, bi kurtî mirov dikare weha bibêje : Him heyecana ku ji aliyê nivîskarî ve di serpêhatina hunandina berhema xwe de vedibêje, him jî heyecana ku, bi wesita karakterên edebî û bi alîkariya hewldanên xwe yê rojane vedibêje, bi rêk û pêk radixe ber çavên xwendevanan, bi xwe ye. Lîrîzma ku bi vî awayî rastîya civakî radixe ber çavên guhdar û xwendevanan, hema bibêje di hemû cureyên edebî de mirov dikare lê rast bê.

15 / 08 / 1998

Stockholm

Çend helbestvanên nû

Amadekar: **Xelîl Duhokî**

Di van salên dawiyê de, çendîn helbestvanên xort, jîr û lêhatî, yê hatine qada edebyata kurdî û rûpelên rojname û kovarên kurdî, li Kurdistanê başûr, bi peyvên xwe yê zêrîn nexşandîne. Helbestên wan jî aliyê form û naverokê ve serketîne û her zû cihê xwe di dilê mirovî de dikin. Hindeka pirtûkxana kurdî bi dîwanên xwe xemlandine. Ez çend helbestên wan jî tîpên erebî dikime yê latînî û pêşkêşî xwendevanên hêja dikim.

(1) Helbestvan: **BÎLÎND MÎHEMED**

STÎRANEKA HAVÎBÛYÎ

Ahînen te

di kûratiya dilê min de
deng vedidin.

Xew jî çavên min ya sil e.

Siruştê kirasekê nû li laşê min kir.

Ji kel dergehpêvadan û

di kujîkê oda tarî ve,

li ser kuntika hêlam.

Bêomêdiyê...

Toka xwe havête stûyê min û hilawîstim.

Ahînen te çiya disimin.

Biyabana di birrin û di guhên min de,
deng vedidin.

Hemî awîzên laşê min

ji kar dikevin.
Heku dibînim
tu ya dibîye bûk û li ser textê qiralê şevê
dihêye razan.
Tiliyên dax dayî.
Çavên girêdayî.
Hez dikin te ji binkefşê Dêwa
birrevînin û keçîniya te biparêzin.
Lê pêngav di serlêjin.
Ahînên te,
heku di ber benda stiranên min da dihên.
Kovanên min dikên.
Xweşiyên min bijale dikin!
Givêşûka didin canê min.
Bizavên min
li ber hêzeka ne diyar dihelweşin.
Di kûratiya derûnê xwe de
li kujîkên tarî digerim û lê dinivim.
1998.11.19

(2) Helbestvan: Dr. ARIF HÎTO

JIVANDARÎ
Xemgîn im...
Tu yê xweşî...
Xewna bi te ve dibînim,
Dê kengî hêy?
- ...
1989

HOZAN

Bi hizara stêr

nebin qurban.

Roja zêrîn na helêtin.

Ger ji hinavan,

kovan nezan.

Qeyda hozana şoreşgêr...

naşkêtin.

1988

AGIRDAN

Her ji roja...

Vînosa evînê

ji dilê min û te zay.

Mîni di gel xweşiyê jivan e.

Her ji roja...

Soza manê, di gel karwanê

jînê me day.

Çavên min bo

şeve reşka xilwetên te

agirdan e.

1990

JİYAN

Jiyan... Jiyan

Kî ve diherî, li dîf te dibezim?

Tu li kê digerî?

Xemdar û xoşevî ez im.

Dê kî ve çî?

Di destên min de,
cîhan hol e û te dîgezîm.

1988

(3) Helbestvan: LOQMAN ASÎHÎ

SÊ PISYAR

. 1.

Ho civata
bi agirê vînê kelayî.
Agirê çî ji van gerîmtir e!
Yê dojhê.
Yan agirê du lêvên
Pêkve nûsyayî?

. 2.

Bêje min key
Didanên şey
Di nav pêlên ewê pirça te şîrînê.
Li xwepêşandana evînê.
Bes şiyane, bên û biçin.
Û serxweş nebin
Ku her davê diramûsin
Jê vedixun, sed pêkên mey?

. 3.

Ew çî kes e keç perîstîn?
Paşî rû û lêv,
pêkve gestîn.
Di xeyala keçekê de,

çav mayne hişyar û ne nivistîn.
Şiyay nebit hozanvanek,
ji koma kul û derdên xwe
dîwan ji rondika neristîn?!

(4) Helbestvan: BEYAR BAVÎ

LEHÎ

Wa dîsa
dengê van borîsa.
Yê dibêtin, subehî.
Ev rûbare dê bîte lehî.
Jor de hêtin
berên binsirta qesra te axay
Dê bilind ke.
Tora masîgira veday
dê pêçît û serhindke.
Û ew bişkurîna ji jivanê xwe vemay
Ser ji nû dê qesta
wan du lêvên te yên
sor û şenge ring ke!
1989

HER ŞEV

Heker tu nivistî û heta spêdê
çi Dêw nehatin
te ji xew rakin
Pisyar kin:
Xudê te kî ye?
Navê te yê sêqolî çi ye?
Bizane: Yan tu jî Dêw î
Yan jî bextê te yê sipî ye!

1988

(5) Helbestvan: **MIHEMED JÛRÎ**

JI HELAMETÊ STÊRAN DAKEVE

Aşopa romaneke entîkeyî.

Xwe di berbejna hişkeberan de dialand.

Werîsek zivir li elindên zelal

ji hevrikyâ subê,

hêviyên di qurnetî re hatin bendkirin.

Şifşên pîlayî, sergopkirina darên serkûrha

li benderiya sîtafka

ya ji min, ya ji te.

Yan jî, ji agirê xewnan.

Pel carê sor dibûn,

carcaran jî kesk bi xwe ve digirt.

Ferhenga xewnên kujek,

malxulyanê digel hizrên betal dikir,

Pexşeka yekser dide.

Ji helameta stêran dakeve!

Rêportajên berperên reşkovara...!

Du çavên hilweryayî, li benda çi ne?

Di kêliyan re, bêhna qeveda serdikeve.

" Ya sittar û bê loma be.!

guhbel bi sê zêran dê êne sizakirin."

Dê Dayê:

Heyranoka bêje.

Ma Emo çi lê hatiye?

Bo carekê basî misk û embera nakî?

Pêl di dijwar in!

Xişexişa Êzgeyî,
guhên min ber bi aloziya birin.
Gêryên te, perasiyên pîtî kirine şivik.
Esman xodîk e, xor salekê hatiye paš.
Ji nû ve cêmik û kêvjal û şêr,
kiç û kevan û neheng...

(6) Helbestvan: DIRBAS MISTEFA

ÇEND WÊNEYEKÊN KÛVIYÊN PARÇEKIRÎ

. 1.

Papora te,
di derya sîngê min de
bûye kund û
pêl wê pêla diramûsin.

. 2.

Di rikeha sîngê min de,
tev Kin lê dilîsin.
Û bi bayê sibana ve
dileyizin.

. 3.

Sîngê te, solîn e.
Û destvedanên min di sinêleyî ne.
Ditirsim di nav destên min de,
bibuhijin.

. 4.

Destên min yê zivir

li ser laşê te yê xav, şoreş e.
Û pirça te ya qereçî,
yariya bi tiliyên min dibe.

. 5.

Ji bejna te ya yaxîbûyî re
xwîna dirijit.
Birakujî mîrate ye û kevra disimît.
Jîngeh ya xiş û teng dibe.

. 6.

Ewrên tên,
di stewir û kûvî ne.
Kulî berhemdar e.
Ga...
di kulekê re diçe.
1998

(7) Helbestvan: EBDULEZÎZ XEYAT

GIRTIYÊ ÇAVANIM EZ

Çavên te zîndana min in,
Êxsîr im keftîme tê de.
Mijûlankên herdu çava,
bûn asteng, keftîne di rê de.
Heta kengî dê mînim girtiyê çava?
Kengî dê tu dere hîkey,
wê evîna di dilê xwe de
da ku bigehîne omêda?
Carcar dibêjî:

Derya evîna min kûr e.
Pêl û şilqavên wê zûr in.
Têr zivro in.
Hişyar be dê te daîrin.
Tîrên çavên min dijwar in.
Hişyar be dê te êşînin.
Agirê vîna min germ e.
Hişyar be dê cerg û dila li te sojînin.
Lê ez çi bikim!
Neşê mî terka çavên reş û belek bikim.
Baş dizanim,
çi derya bê zivrok nînin.
"Çi agir bê dûkêl nînin."
Lê hêvî û omêd min hene,
felek çerxa xwe li me bidit
herdu dilên me pêk bînin.

1990.2.10

Ji civata me kurdan

Laleş Qaso

Di eslê xwe de eva ku ez ê ji we re rave bikim, şêwirdarên axan, beg û begleran jê re çîrok ne digotin, lêbelê ji bo ku ez lingên xwe nekim soleke teng, ez ê mijarê wek "Kultur û edebiyatê" bigirim û binivîsînim.

Temoyê kurd bi nexweşiyêke îllellahî dikeve. Yanê wek hebanê dinepîxe û li erdê vedizile. Lawê Temo Rizgo, bavê xwe li ser bergîlê dişidîne, rêya Fafê digire û rast berê xwe dide mala Hekîmê Luqman. Hekîm omerî bû û di keleha Fafê de rûdinişt. Piştî ku Hekîm xêrhatinê di wan de dide, ji Temo re doşekeke hirî û li ser doşekê jî çep û rast şeş zemberîşan datîne û Temo li ser vedizilîne. Hekîm bêyî ku nexweşê xwe venerxîne, di nexweşiya wî de digihê û hema di cih de dest bi axaftinê dike:

"Temo, tu mirovekî pir mezin î!"

Temo bi vê gotinê diçirise, li ber xwe dikeve û zikê wî hinekî dadipiçe. Hekîm gotinê ji gotinê pêdixîne:

"Di temamê kurdan de mirovekî wek Temo jîr û zane tune!"

Zikê Temo hinekî din dadipiçe. Hekîm şiqaman li ruyê xwe dide û dibêje:

"Temo Temo, ma tu ê vî halî bû haho! Yekî wek te hemû aqil, gerek mezinê welêt ba! Mîrê Botan li himberî te çî ye!.."

Temo dadipiçe û dadipiçe. Hekîm piştî ku Temo bi qasî pêximberê mezin dike, destên xwe li ser hev datîne û jê re dire sicûdê. Werma zikê Temo jî li himberî vê hereketa Hekîm, bi carekê ve difise û sipîsaxlem radibe ser xwe.

Îcar Gemşoyê ku bi nexweşiya Temo ketibû, bi haweyekî din dibe. Bi kurtî, Ferhoyê lawê Gemşo, bavê xwe radike meqamê Hekîmê Luqman. Hekîm çûye nêçîrê, lêbelê lawê wî li malê ye. Law mîna ku bav kiribû bi Gemşo re dike û dibêje:

"Gemşo, tu mirovekî pir mezin î!"

Gemşo hinekî din dinepîxe. Lawê Hekîm bi gotinên yekweqî dajo ser:

"Gemşo, ma tu ê vî halî bû haho! Gerek tu mezinê dinyayê ba, wey li min pepûko!"

Gemşo dinepîxe û dinepîxe. Lawê Hekîm piştî ku Gemşo bi qasî Xwedê mezin dike, destên xwe li ser hev datîne û jê re dire sicûdê. Werma zikê Gemşo

jî li himberî vê hereketê bi qasî meşkên koçeran dinepîxe û ji nişkê ve jî diteqe.

Mafir, Hekîm tê malê, rewşê dibîne û lawê xwe mehkeme dike:

”Te çi kir ku ev mirov teqîya?”

”Yabo, tiştê ku te bi Temo re kiribû, min jî bi Gemşo re kir.”

”Tu hekîmekî nezan î!”

”Ez çawa nezan im yaho! Min sed û bîst û neh salan ilmê hekîmtiyê xwendiyê. Û ev pêncî sal e jî ku venerxana min heye. Tam pêncî û neh hezar mirov di nav lepên min de mirine...”

”Kuro te sê sed salî jî xwendibe, tu nezan î. Îcar gava ku pêncî û neh hezar kes di nav lepên te de miribin, tu zir ehmeq î lawê min. Li min guhdar bike:

Di dinyayê de du tiştên ku wê mirov nikaribe qebûl bike hene. Yek, mirovê ku seroketiyê li xelkê dikin nikarin ehmeq bibin. Siyaset û ehmeqî dijminên hev in. Lê çi fêde lawê min, axê me yê Fafê Pelqo jî ehmeq e. Bi şev û roj pesnê xwe dide; bûye nûkerê Çelqoyê mîrê mihelmiyan û bi hevêrkiyan re, omerî, bûblanî, mêrsînî û heta cara bi urûsan re jî şer dike. Di Fafê de xort neman. Dijminan keleha me xirîxopan kirin; rez û werzên me şewitandin...

Dudu, hekîm nikare nezan be. Ji ber ku hebûn û nebûna mirovê nexweş di dest wî de ye. Tu nezan î lawê min. Temo mirovekî ku li ber xwe diket û ji xwe fedî dikir. Gemşo jî mirovekî ku ji ber xwe fedî ne dikir. Ma ez hîn jî bibêjim?”

”Yabo min mereq kir, gelo wê rewşa Pelqo çawa bibe?”

Hekîm hers dibe:

”Lawê min bi rastî jî tu zir ehmeq î, mirovên wek te hekîm çima kirî bi vê mirina wî nizanibin! Pelqo saxekî ji mirîyan e. Ew ji zû de miriye.” û şiqamekê bi lawê xwe vedike. Dû re jî digirî. Çima Hekîm digirî gelo? Ez ê wê yeka ha nebêjim, ji ber ku wê mijara me ji rengê”Kultur û edebiyatê” dûr bikeve...

Di pêvajoya dîrokê de zimanê kurdî

Zekî Bozarslan

Gelê kurd di pêvajoya dîroka jîyana xwe ya dûr û dirêj de, ji ber gelek sedemên netewî û navnetewî, mercên ku bikaribe welatê xwe ji bin destê dagirker û mêtinkaran rizgar bike, ji bo ewletîya xwe û welatê xwe, ji bo parastina ziman, edebiyat û çanda xwe, li ser axa xwe, ji xwe re dewletek damezirîne, pêk nanî. Mîr, beg, axa û serokeşîrên kurdan, fersendên ku di hin demên dîrokê de bi destên xwe xistin, lê wan jî pir baş bi kar nanîn. Dewletên ku di hin demên dîrokê de dameziranandin, ew jî ji ber tunebûna artêşeke wana xurt, berjewendîyên şexsî, komplo û dijminatîyên li dij hev, emirdirêj ne bûn.

Gelê kurd, xeyn ji desthilatîya mîrekîyên xwe, demeke dûr û dirêj e, jîyana xwe ya civakî, bê dewlet, di bin zilm û tehdayeke pir giran de dimeşîne. Zimanê kurdî mecala ku bikaribe li Kurdistanê bibe zimanekî fermî; gelê kurd di dibistanan de pê perwerde bibe, kovar, rojname, û pirtûk pê derkevin; radyo û televîzyon pê weşan bikin. Kar û barê dezgehên dewletê bi wî bimeşin. Zimanzan li ser wî xebat û lêkolîn bikin. Elfabe û rêzimana wî amade bikin; wî pêş ve bibin, hêsantir û dewlemendtir bikin, bi dest nexist.

Ji ber tunebûna dewletê, zimanê kurdî pêşveçûna xwe ya xwezayî ku bi pêşveçûna civakî ve girêdayî ye, nebî serî. Wî, di vê meşa xwe ya dûr û dirj de, jîyana xwe di civatê de; bê dibistan, bê elfabe û bê rêziman, wek zimanê axaftênê, di bin hoyên pir giran de meşand û xwe gihand heta dema îro.

Herçiqas zimanê kurdî li Kurdistanê ne zimanê fermî bûye jî, lê dîsa zimanê kurdî; zimanekî dewlemend, xwedî qayîde, xwedî bingehekî qewî, xwedî dîrokeke kevin û xwedî çandeke dewlemend e. Zimanê kurdî ji dema kevin û vê de, di civata kurd de, zimanê pêwendîyên civakî bûye. Gelê kurd di jîyana xwe ya civakî de, hertim bi kurdî axifîye, derd, kul, hîs, fikir û ramanên xwe bi wî anîye ziman.

Gelê kurd, wek civateke bicî û warkirî, di pêvajoya jîyana xwe ya civakî de, bi pêşveçûna civatê û ziman re, folklor û edebiyateke devkî ya dewlemend jî pêk anîye. Ji edebiyata kurdî ya devkî pir hindik tişt hatine nivîsandin û gîhane destê nivîşên sedsala 20an. Ji sedsala 10an heta dawîya sedsala 19an, di nava: mir, beg, şêx, zanyar (alim) û meleyên kurd de, çend kesan tenê, bi kurdî helbest, destan, xezel, beyt, qesîde, kurteçîrok û tiştên wiha nivîsîne. Hin şair, edebîyatzan û

dîrokzanên kurd ên din jî, berên xwe bi farisî, erebî û osmanî nivîsîne. Herwiha ji van zimanan re xizmet kirine û edebiyata wan dewlemend kirine. Wek mînak, mîrê Bedlîsê, şeref Xan Beg, çar sed sal berê (1597) pirtûka xwe ya dîrokê a bi navê **"Şerefname Dîroka Kurd"** ne bi kurdî, bi farisî nivîsiye.

Şair û edebîyatanên kurd, eserên ku ji sedsala 10an heta dawîya sedsala 19an nivîsîne, eserên ku, heta niha kurdan bi destê xwe xistine, li welat û li dervayê welat çap kirine, hejmara wan ji 5, 6 pirtûkan derbas nebûye. Mîrên ku li Kurdistanê dewlet damezidandibûn; bi sedsalan desthilatîya herêmên Kurdistanê di destên wan de bû û xwedîyê îmkanên mezin bûn. Li ber destê wan: zanyar, katib, qadî, şair, dengbêj û çîrokbêj hebûn. Van mîrên kurd, rojek ji rojên Xwedê ji bo ziman, edebîyat û dîroka wxe tiştek nekirin û nedan kirin jî. Wisa xuyaye, mîr û begên me, xeyn ji nêçîr û şahîya xwe tu tiştekî din nefikirîne!..

Bêşik, edebîyata kurdî ya nivîskî evqas hindik nebûye. Ji yên ku heta niha kurdan bi destê xwe xistine, li welat û li dervayê welat çap kirine, ji vana bêtir bûye. Dibe ku helbest, destan, qesîde, beyt û nivîsên din ji ber tunebûna îmkanên çapê, nehatibin çapkirin. Destnivîs di destên xwdîyên xwe de mabin. An jî çar, pênc nusxe destnivîsên ku hebûne, ew jî baş nehatibin parastin; wenda bûnin; an jî, ji alî dijmin de hatibin şewitandin û tunekirin.

Nivîsên ku di dema kevin û di dema pêşîn de, bi mîxnivîsê hatine nivîsîn, di dema îstîlayên împeratoriya: Asûr, Faris, Bîzans, Erebi, Selçûq, Moxil û Osmanî de hatine şewitandin, şikandin û talankirin. Herwiha, ji edebîyata kurdî ya kevin a berya dema ereban, tu tişt ji destê dewletên dagirker xilas nebûye.

Ziman, edebîyat û çanda kurdî, derbeyên herî giran di dema Komara Tirkîyê de xwarin. Ziman, edebîyat, çand û dîroka kurdî, yên ku ji ber tîr, rem û şûrê dewletên dagirker xilas bûbûn, vê carê jî ketibûn bin singûyên dewleta tirk a nîjadparêz.

Di pey damezirandina Komara Tirkîyê de; dewleta tirk hebûna gelê kurd nepejirand. Ziman, edebîyat, çand û dîroka wî qedexe kir. Serhildanên wî yên ji bo serxwebûn û azadîyê, bi awakî bêînsaf pelçiqand û perwerdê ji Kurdistanê rakir. Temamê tîrêjên ronahîyê ji ser gelê kurd qut kir û wî ber bi zilm û tarîtiya dema navîn ve bir! Dibe ku, mîr, beg, zanyar, mele û ronakbîrên kurd; pirtûk, kovar, rojname û destnivîsên kurdî ku di destên wan de hebûne wan bi xwe şewitandibin; an jî di bin axê de rizandibin ?

Edebîyata kurdî ya devkî, ji dema pêşîn heta 30-40 sal berê jî di civata kurd de, pir zindî bû. Hê jî di gund û qezayên Kurdistanê de zindî ye. Di hemû bajar û gundên Kurdistanê de, şahî û şevbêrkên mîr, beg, axa, bajarî û gundîyan, bi çîrok, destan, helbest, tiştanok, pêkenîn û bi sitranên kurdî dihatin xemilandin. Çîrokbêjan, guhdarên xwe ji dinya wan hildidan, dibirin dinyake din. Wan di çîyayên asê de, di gaz û gedûgan de, di qadên şer de, di çol û berîyan de, di deryayên bêserî û bêbinî de, di dinya cin û perîyan de, digêrandin dûre wan dîsa

danîyan di odê dê li hemberê xwe didan rûniştandin.

Edebiyata kurdî ya devkî di nava civatê de pir xurt bû. Li her bajar, qeza û gundên Kurdistanê bav; dayîk, dapîr û bapîr ji bo zarûk û torinên (nevîyên) xwe, dengbêj û çîrokbêj jî di qesir û qonaxên mîr, beg û axayan de, di civatên bajarî û gundîyan de, ji bo guhdarên xwe pirtûkên edebîyatê bûn.

Folklor û edebîyata kurdî ya devkî, zimanê kurdî dewlemend kirine. Ziman jî, wan bi pêş xistîye û kemilandîye. Ziman û çand; di dîroka civatan de, him di bin mercên azad de, him jî di bin mercên berbendkirî de, herdem jîyana xwe bi hev re meşandine. Him erîn, him jî neyîn li hev tesîr kirine. Di bin hoyên azad de, hev pêş de birine û hevûdu kemilandine. An jî di bin hoyên berbendkirî de, herdu jî para çûne, xizan bûne û ji holê rabûne. Mînakên ku mêtînkaran bi darê zorê, ziman û çanda gelek gelan ji holê rakirine û dîsa bi darê zorê yên xwe bi wan dane hînkirin, li dinyayê gelek in!

Çawa ku meriv nikaribe bê zimanekî standart û pêşketî, edebîyateke xurt û dewlemnd bifikire, herwiha meriv nikare bê edebîyateke xurt û dewlemend, zimanekî standart û pêşketî jî bifikire. Herçiqas, her netewe, li gora xwe, xwedîyê çand û edebîyatekê bin jî, lê dîsa her netewe bi qasa pêşveçûna xwe ya civakî, edebîyat û çanda xwe pêk tîne. Meriv nikare ziman, edebîyat û çanda netewên pêşketî, bi ziman, edebîyat û çanda netewên paramayî re, qiyas bike. Pêşveçûn û dewlmentbûna ziman, edebîyat û çanda netewan, bi dîroka serxwebûn, azadî û bi pêşveçûna wan a civakî ve girêdayî ye.

Ji ber terora devleta tirk, li Kurdistanê tu kes li ziman, edebîyat û çanda kurdî nebûye xwedî. Ji bo pêşveçûn û dewlmentbûna wan hewl nedaye. Herçiqas ziman û çanda kurdî dewlemed bin, lê dîsa jî demeke direj e, di bin zixta dijmin de bêxwedî mane. Şair û nivîskarên kurd, xeyn ji çend kesan, zimanê kurdî wek zimanê nivîsê bi kar nanîne. Ziman û edebîyata kurdî ya nivîskî bi pêş nexistine. Di xebatên xwe yên edebî de, hertim, giranîya xwe dane ser zimanê tirkî, erebî û farisî. Ji van zimanan re xizmet kirine; edebîyata wan xurt û dewlmenttir kirine. Gelek şair, edebîyatzan, lêkolîner û dîrokzanên kurd ên navdar, bi berên xwe yên hêja edebîyata van gelan birûmet kirine.

Ji ber tunebûna dewleta kurdan, pêşî li şer, talan û tehrîbatên dijmin nehatin girtin. Him êrîşên dagirkeran ji bo dagirkirina Kurdistanê, him jî, ji bo parvekirina Kurdistanê, şerê dagirkeran li dij hev, nehîşt gelê kurd di hêla civakî de bi pêş bikeve. Herwiha pêşî li pêşveçûna civata kurd a tabîî hat girtin. Ji ber vê yekê sinet û aletên berhemê bi pêş neketin. Berhem û bazirganî qels man. Pêwendîyên aborî di navbeyna herêman de pêş neket. Bendên feodalî xurt man. Ji bo pêşketin û dewlmentbûna ziman û çanda kurdî dezgeh ava nebûn. Perwerde û civata kurd ji hev re xerîb man. Di jîyana civakî de, zaravayên kurdî mecala pêwendîyên civakî nedîtin; di pêvajoya dîrokê de ji hev dûr ketin, ji hev re bûn xerîb. Kurdên ku bi zaravayên cûda axifin bi zehmetî ji hev fêm kirin. Bi vî awayî, di devokên

herêman de jî qayîdên cûda derketin holê.

Mîr, axa û serokeşîrê kurdan 250-300 sal di pey îstîlayên ereban de; desthilatîya Kurdistanê xistin destê xwe. Li rojhilat û rojavayê Kurdistanê dewletên cûda damezirandin, dewleta Lor û Merwanîyan. Dewletên kurdan demeke dirêj bi xelîfeyên Bexdayê û bi dewleta Bîzansê re di nava aşîtîyê de jîyan. Di wê demê de, li Kurdistanê berhem, bazirganî û sinet pêş de çûn. Ziman, edebîyat, çand û folklorê kurdî dewlemendtir bûn. Mîr bi carîyên xwe re di kêf û şahîyê de bû. Şair, dengbêj û çîrokbêj bi helbest, stran û çîrokên nû re, gel jî bi berhem û bazirganîyê re mijûl dibûn.

Ji sedsala 11an heta sedsala 19an di bin desthilatîya mîrekîyên kurd de, perwerdetîya medresê li bajar, qeza û gundên Kurdistanê pêş de çû. Hejmara zanyar, mele û feqîyan li Kurdistanê zêde bû. Bi sedan feqî di medreseyan de; li ber destê zanyar û meleyên kurd perwerde dibûn. Bi pêşveçûna perwerdetîya medreseyan re; di edebîyata kurdî de demeke nû dest pê kir. Di medreseyan de bi xwendina pirtûkên dîn; huquq, felsefe, dîroka îslamê, dîroka gelmperî, edbîyata farisî û erebî re; di nava zanyar, mele û feqîyên kurd de; kesên şair û edebîyatzan derketin holê. Van kesan li Kurdistanê pêşengîya edebîyata kurdî ya nivîskî kirin. Bi vî awayî edebîyata kurdî ya nivîskî anîn pê.

Dema meriv li edebîyata kurdî ya kilasîk û lêkolînên li ser wê dinêre, meriv dibîne, ku edebîyata kurdî ya nivîskî di sedsala 11an de, di dema Elî Herîrî de dest pê kirîye. Bêşik, edebîyata kurdî ya nivîskî di demên berya Elî Herîrî de jî hebûye. Lê, tu tişt ji ber destê erebên dagirker xilas nebûye. Herçiqas edebîyata kurdî ya nivîskî di sedsala 11an de, dest pê kiribe jî, meriv dibîne ku ji destpêka sedsala 13an heta nivê sedsala 19an, di dema Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Melayê Batê, Ehmedê Xanî û Sîyahpûş de, bi pêş ketîye, dewlemend bûye û gihaye qonaxa xwe ya herî bilind. Şair û edebîyatzanên kurd ên herî hêja di van deman de derketine.

Edebîyata kurdî ya nivîskî di sedsala 20an de jî, di medreseyan de hebû. Lê ne wek demên navbeyna sedsalên 14 û 19an ewqas xurt bû. Mîrekîyên kurdan heta sala 1860-70î jî li Kurdistanê bihêz bûn. Desthilatîya herêmên Kurdistanê di destê wan de bû. Di qesir û qonaxên wan de zanyar, şair, dengbêj, çîrokbêj, di medreseyan wan de jî bi sedan feqî û mele hebûn. Kurdîya herî xweş di civata wan de dihatin axaftin. Şairan di civatên wan de helbest dixwendin. Dengbêjên navdar di qesirên wan de distirîyan. Çîrokbêjan çîrokên xwe yê herî xweş di civatên wan de digotin. Di dema mîrekîyên kurd de; ziman, edebîyat, çand û folklorê kurdî azad bûn; ji ber vê yekê jî bi pêş ketin, dewlemendtir bûn.

Piştî sala 1800î dewleta osmanî êrîş bir ser Kurdistanê. Ji sala 1800î heta sala 1913an di navbeyna dewleta osmanî û gelê kurd de, demdemî (periyodîk) şer hebû. Dewleta osmanî ya dagirker, dixwest desthilatîya xwe li Kurdistanê xurt bike. Mîrekîyên kurdan bipelçiqîne; Kurdistanê bike perçeyek ji axa dewleta

xwe. Gelê kurd jî di bin serokatîya mîr û serokeşîrên xwe de, ji bo parastina welatê xwe li dij artêşa osmanîya dagirker şer kir.

Dewleta Osmanî, bi artêşên xwe yên herî hêz êrîşê Kuredistanê dikir. Herêmen Kurdistanê tev ne di şer de bûn. Eşîrên kurdan li dij êrîşên artêşa dijmin alîkarîya hev nedikirin. Ji ber vê yekê jî kurd di van şerên parastina serxwebûna welatê wxe de, bi ser neketin; têk çûn. Artêşa Osmanî di êrîşên xwe de, kurdan qir dikir. Herêmen ku di şer de bûn xera dikir, dişewitand û welatekî wirankirî li pey xwe dihîşt. Bêguman, di welatekî wêrankirî de, ne aborî, ne berhem, ne aletên berhemê, ne bazirganî, ne çand, ne edbîyat û ne jî ziman bi pêş dîkeve!

Ji sala 1870î û ve de, li Stenbolê ji karkerên kurd re, rêya kar û ji xwendekarên kurd re jî rêya xwendinê vebû. Çend sal paşê, Siltan Evdilhemîdê 2an (1876-1908) li Stenbolê, ji zarûkê eşîran re dibistan vekir. Navê dibistanê "Dibistana Eşîran" bû. Mîr, beg, axa û serokeşîrê kurdan, zarûkên xwe dişandin Stenbolê, xwendinê.

Ji sala 1870î heta sala 1914an li Stenbolê girseyeke kurd çêbûbû. Di nava vê girsê de karmend, xwendekar, ronakbîr û zanyar hebûn. Siltanên Osmanî, nedihîştin ronakbîrên kurd, li ser ziman, edebîyat, çand û dîroka xwe bixebitin. Rojname, kovar û pirtûk bi kurdî derxînin. Ziman, çand û edebîyata xwe ya nivîskî xurt bikin. Ji ber vê yekê, ronakbîrê kurd, Mîqdad Mîdhet Bedirxan, rojnameya xwe ya kurdî ya bi navê '**Kurdistan**' (1898-1902) li dervayê welat, li Misirê derxistîye.(1)

Di pey Meşrûtiyeta 2an (1908) de ronakbîr, xwendekar û welatparêzên kurd, li Stenbolê xebatên sîyasî û çandi kirine. Ji bo dewlemndbûna ziman, edebîyat û çanda kurdî çapxane danîne; dibistan vekirine, rojnameyêke kurdî, bi navê '**Kurdistan**' (1908-09) û sê, çar kovarên kurdî-tirkî derxistine. Ev cara pêşîn e, ku ji dervayê medreseyan, ronakbîrên kurd li Stenbolê ji bo pêşketina ziman, edebîyat û çanda kurdî ya nivîskî hewl dane. Lê xebata ronakbîrên kurdan ên sîyasî û çandî emirdirêj nebûye. Hukumeta îttîhad û Terakkî, komelên kurdan girtîye; weşana kovarên wan qedexe kirîye û berê ronakbîrên kurd daye enîya ûris.(2)

Di şerê cîhanê yê yekem (1914-18) de, dewleta osmanî şer wenda kir. Gelê kurd hê jî di bin nîrê wê de bû. Gelên din di şer de, bi alîkarîya dewleta îngliz û fransiz xwe ji bin nîrê wê rizgar kirin. Piştî Peymana Mondrosê (30/10-1918) înglîstan, Fransa û îtalyayê dest danîn ser dewleta osmanî. Wê bê çek kirin. Pîranîya artêşa wê ya Anadolîya Rojava bela kirin.

Piştî Peymana Mondrosê; welatparêz, ronakbîr, xwendekar û rêberên kurd jî, ji bo bidestxistina mafê xwe yê netewî, li Stenbolê dest bi xebata sîyasî, çandî û dîplomasî kirin. Li Stenbolê û li hin bajarên Kurdistanê komele damezirandin. Kovareke bi kurdî-tirkî, bi navê '**Jîn**' (1918-19) derxistine. Edebîyata kurdî ya kilasîk; ji nû ve çap kirine. Ji ber ku pîrsa ziman, çand û edebîyata kurdî, bi

çareserkirina pirsî kurd ve girêdayî ye; rêber, ronakbîr û welatparêzên kurd jî giranîya xwe dane ser xebatên sîyasî.(3)

Çawa ku, şair û edebîyatzanên kurd ên kevin, helbest û destanên xwe, bi bêjeyên bîyanî xemilandine; herwiha rêber û ronakbîrên kurd jî rûpelên kovar û rojnameyên xwe bi nivîsên tirkî xemilandine. Ji sala 1900î, heta damezirandina Komara Tirkîyê, ronakbîrên kurd, di xebatên xwe yê çandî de, edebîyateke nivîskî ya ber bi çav pêk nanîne. Temamê xebatên wan bi deranîna çend hejmar kovar û rojnameyên kurdî-tirkî, bi sînor mane. Ji xwe, di demeke wiha kin de û di bin zixteke pir giran de, mûcîze çenedibû.

Ji roja damezirandina Komara Tirkîyê û vê de, gelê kurd ket bin zixteke pir giran. Ziman, çand û folklorî wî paş de çûn. Dîroka wî hat jî bîrkin. Bi hezaran, bi deh hezaran kurd, zimanê dayîka xwe ji bir kirin; hatin helandin. Bi pirsî kurd re, bi ziman, edebîyat, çand û dîroka wî re mijûl bûn; bû wek lixwekirina kirasê hesin! Ji roja damezirandina Komara Tirkîyê û heta sala 1990î pirtûkên ku bi kurdî li Tirkîyê hatine çapkirin, hejmara wan ji deh, yazdeh heban derbas nabe. Gelê kurd di bin van hoyên pir giran de jî, di ber xwe de daye. Ziman û çanda xwe parastîye.

Piştî têkçûna serhildana şêx Seîd Efendî, rêber û ronakbîrên kurd, ên ku ji ber sungû û sêpikên dewleta tirk xilas bûn, revîyan dervayê welat. Pirsîya wan li Sûrîyê civîyan. Hin rêber û ronakbîrên kurd, berya damezirandina Komara Tirkîyê, ji ber zilma Mustafa Kemal revîyabûn dervayê welat. Kesên ku berya damezirandina Komara Tirkîyê revîyabûn dervayê welat, çend kes ji wan ev in : Malbata Celadet Alî Bedir-Xan, Memduh Selîm, Hemze Begê Muksî...

ZIMANÊ EDEBÎYATA KURDÎ LI DERVAYÊ WELAT.

Ronakbîrên ku revîyabûn dervayê welat, hejmara wan ji hejmara tilfîyên du destan derbas nedibû. Welatparêzên kurd, li dervayê welat jî vala nesekinîn. Rêxistin danîn, xebatên sîyasî, çandî û dîplomatîk kirin. Li Sûrîyê, li dij dewleta tirk çalakîyên sîyasî, li hesabê dewleta fransîz jî nedihat; lê bi destûra wan, pirtûk, kovar û rojnameyên kurdî derxistin ji bo wan ne mesele bû. Ronakbîrên kurd, bi xebatên xwe yê sîyasî re xebatên, çandî û edebî jî kirin. Ji bo ziman û edebîyata kurdî ya nivîskî kovar û rojname derxistin.

Ronakbîrên kurd, ji bo hişyarbûna kurdan, ji bo pêşvebirina ziman û edebîyata kurdî ya nivîskî, di 15ê gulana sala 1932an de, kovareke kurdî, ya çandî, bi navê "Hawar" li Şamê derdixistin. Xwedî û berpirsyarê kovarê, Mîr Celadet Alî Bedir-Xan e. Hawar, kovareke 15 rojî bûye. Hawar, demdemî, 57 hejmar derketîye. Di pey hejmara 26an de, 5 sal û 8 meh derneketîye. Di pey navbireke dirêj de, hejmara 27an di 15/4-1941ê de, disa derketîye. Hejmara Hawarê ya dawîn, di 15/8-1943an de derdikeve. Di pey hejmara 57an de, Hawar êdî

derneketîye. Bawer im, ku şerê cîhanê yê duyem nebûya, dibe ku kovara Hawarê jî piştî hejmara 26an êdî der neketa.

Di dîroka ziman û edebîyata kurdî de cara pêşîn e, ku ronakbîrên kurd, li dervayê welat, bi awayekî hevdem li ser ziman û edebîyata kurdî ya nivîskî xebitîne. Qedrî Cemîl Paşa, di bîranînên xwe de, dibêje "Xelîl Xeyalî û Zîya Gökalp, bi hev re, di sala 1900î de, li ser gramera kurdî dixebitin. Gramer û ferhengê amade dikin. Zîya Gökalp wê demê ji ber dîtinên xwe, ji dibistanê tê avêtin. Dema Zîya Gökalp vedigere Amedê, rêziman û ferhengê jî bi xwe re dibe. Piştî ku Zîya Gökalp dev ji kurdîtiya xwe berdide, derbasê sefê tirkên nîjadparêz dibe, ferheng û rêzimanê nade Xelîl Xeyalî. Wan li ba xwe dihêle an jî diqetîne, davêje. Di pey vê bûyerê de, Xelîl Xeyalî wan ji nû ve amade dike." Ji ber ku, ji xwebatên Xelîl Xeyalî û Zîya Gökalp tu tişt nehatine çapkirin, meriv dikare bêje, xebatin Mîr Celadet û birayê wî Kamiran Beg, li ser elfabe û gramera zaravayê kurmançî yên pêşîn in.(4)

Dem a em dibêjin xebatên Celadet û Kamiran Beg li ser elfabe û gramera kurdî yê pêşîn in, em xebatên zimanzan, rojhilatnas û gerokên biyanî ku hatine li Kurdistanê gerîyane; kurdî hîn bûne; li ser ziman û edebîyata kurdî lêkolîn kirine; elfabe, gramer û ferhenga kurdî amade kirine, em wan kesan nahesibînin. Li vir, qesta me xebatên ronakbîrên kurd ku li ser ziman, edebîyat û çanda kurdî xebitîne; elfabe, gramer û ferhenga wî amade kirine, ew in.

Gelek zimanzanên biyanî, wek alman, îtalî, fransîz, îngiliz..., ji nivê sedsala 19an heta nivê sedsala 20an jî li ser zimanê kurdî xebitîne; gramer û ferhenga wî amade kirine û li welatên Ewrûpayê çap kirine. Lê mixabin haya ronakbîrên kurd ên sedsala 20an ji van xebatan çênebûye û ji van beran jî fêde nedîtine. Ev gramer û ferhengên ku biyanîyan amade kirine, di refên pirtûkxaneyên welatên Ewrûpayê de mane. Tu fêda wan negîhîştîye zimanê kurdî.

Celadet Beg, bi derxistina Hawarê re, xizmeteke mezin ji ziman û çanda kurdî re kir. Ji bo pêşveçûn û dewlmedbûna wan hewl da. Wî, li gora îmkanên xwe û di mercên wan rojan de, elfabe û gramera wî amade kir. Bawer im armanca Celadet Beg ev bû:

1- Qayîdên zaravayê kurmançî yên gelemper binivîse.

2- Zaravayê kurmançî ji zimanê axaftinê xilas bike, wî bike zimanê nivîsê, zimanê çandî.

3- Yekîtiya zimanê axaftinê û zimanê nivîsê pêk bîne, zimanê kurdî li ser bingehê qayîdên nivîskî bide rûniştandin.

4- Zimanê kurdî û qayîdên wî li dij zimanên biyanî biparêze û herwiha di zaravayê kurmançî de, pêşî li tevlihevîyê bigire.

Ji bo zimanê kurdî yê nivîsê; elfabe, rêziman û ferheng divêyabû. Ji ber ku zimanê kurdî ne elfabe, ne rêziman û ne jî ferhenga wî hebû, berya îstîlayên ereban elfaba kurdan a serbixwe hebûye. Şair, nivîskar û edebîyatzanên kurd ên

kevin helbest û nivîsên xwe bi elfabeya erebî û farisî, bi tîpên erebî, nivîsîne. Ji ber vê yekê jî, Celadet Beg pêşî elfabeya zimanê kurdî ya bi tîpên latînî amade kirîye. Ji ber ku elfaba latînî hê bêtir nêzikê fonetîka kurdî ye. Herdu ziman jî zimanên hînd û ewrûpayî ne. Zimanê erebî, zimanê Samî ye; komên wan, qayîdên wanên gramatîk û hejmara dengdêrên wan cûda ne. Di wê demê de dewleta tirk jî li Tirkîyê û li Kurdistana Bakur elfaba tirkî bi tîpên latînî bikar dianîn.

Qayîdên zimanê axaftinê nivîsandin, bê elfabe nabe. Meriv bi alîkarîya elfabê dikare qayîdên zimanê xwe yê axaftinê binivîse, gramer û ferhenga wî amade bike. Zimanê xwe li ser qayîdên nivîskî bide rûniştandin. Bi vî awayî meriv dikare di zimanê xwe de, derbasê pêşîya xerabûna qayîdên ziman û talanbûna dewlemendîya bêjeyên wî bibe. Dewletên dagîker bi talankirina dewlemendîyên gelê kurd yên ser û bin erdê re, zimanê wî jî talan kirine. Bi bêjeyên kurdî xezîna bêjeyên zimanê xwe dewlemend kirine. Bi alîkarîya elfabê meriv dikare ziman û edebîyateke nivîskî ya dewlemend pêk bîne.

Neteweyên xwdî dewlet, ji bo xebatên li ser ziman, çand û ferhenga xwe, dezgeh ava kirine, zanîngeh û enstîtu vekirine. Bi sedan zimanzan û pisporên wan hene. Li ser ziman, çand û ferhenga xwe, xebat û lêkolîn dikin. Zimanê xwe dewlementir, hêsantir û xweştir dikin. Ê kurdan ne dewlata wan heye û ne jî zimanê wan azad e, ku bikaribin dezgehên ziman û enstîtuyan vekin, zimanzan li ser wan xebat û lêkolîn bikin. Ji ber vê yekê jî, xebatên li ser zimanê kurdî, li dervayê welat, ketîye ser milê ronakbîrên kurd. Herkes bi îmkanên xwe yên şexsî hîne xwendin û nivîsandina kurdî dibê. Li ser wî xebat û lêkolîn dike. Elfabe û rêzimana wî amade dike. Loma "serokên" kurdan, li dervayê welat, him "serok in" him jî "zimanzan" in!...

Pirsa ziman û çanda kurdî, bi pirsa çareserkirina mafê kurdan î netewî ve girêdayî ye. Pirsa mafê kurdan ên netewî, pirseke sîyasî ye. Çareserkirina wê dikare dirêj bajo. Ji ber vê yekê jî, ronakbir û sîyasetzanên kurd, ên ku revîyane dervayê welat, li dervayê welat li ser ziman û çanda kurdî dixebitin. Ronakbîrên kurd, mecala xebata li ser ziman, edebîyat û çanda kurdî, tenê li dervayê welat dibînin.

Celadet û Kamiran Beg, ji bo ziman û edebîyata kurdî ya nivîskî pêwîstîya elfabe, gramer û ferhengê dibûn. Zimanê nivîsê bê elfabe û rêziman nabe. Hemû zimanên çandî xwedî elfabe, gramer û ferheng in. Mîtanîyan, sumerîyan, hîtîtîyan, misrîyan û fenîkeyîyan, ji bo zimanê nivîsê 4, 5 hezar sal berê elfabe çêkirine. Bûyer û edebîyata xwe ya wan rojan bi xêra nivîsê gihandine demên pêşerojê. Dîroka kevin, hindik be jî, bi xêra wênenivîs (hîyeroglif) û mîxnivîsan gihîştîye ronahîyê. Zimanên di bin zixtê de, zimanên bê elfabe, bê gramer û bê ferheng, zimanên kuçê ne. Hertim, xetera xerabûn, qelsbûn û mirinê li pêşîya wan heye. Ji ber vê yekê, Celadet û Kamiran Beg, giranîya xwe dan ser ziman

û edebîyata kurdî ya nivîskî. Elfabe û gramera wî amade kirin.

Celadet Beg, elfabe û gramera xwe di kovara Hawarê de weşandîye. Elfabeya wî bi navê "Elfaba Kurdî" di hejmarên Hawarê yên pêşin de derketîye. Gramera wî jî bi navê "Bingehên Gramêra Kurdmancî" 22 beş, di Hawarê de hatîye weşandin. Beşa yekem di 15ê nisana sala 1941an de, di hejmara 27an de dest pê kirîye. Beşa dawîn jî di sala 1943an de, di hejmara 54an de xilas bûye.

Celadet Beg û ronakbîrên li dora wî, bi rêya kovara Hawar, Roja Nû û Ronahîyê, ji ziman, edebîyat û folklorê kurdî ya nivîskî re xizmetên giranbaha kirine. Lê mixabin, ji ber tunebûna xwendewanan, tunebûna îmkânên aborî, li hev nekirina pêşevanên kurd û helwesta dewleta îngiliz û fransîz li himberê pîrsa kurd, nehîştine van weşanên kurdî emirdirêj bibin. Bi vî awayî ziman û edebîyata kurdî ya nivîskî dewlemend bibin.

Li Tirkîyê derxistina weşanên kurdî, kirîn û firotina wan qedexe bû; Hawar û kovarên kurdî yên din nediketin Kurdîstana Bakur. Di şerê cîhanê yê yekem de, û di pey serhildanên kurdan de, dewleta tirk, Kurdistanê wêran kiribû. Gelê kurd pîr feqîr bû, sedî 95ên wî xwendin û nivîsandin nizanîbû. Çend hejmarên Hawarê ku derbasê ser xetê bibûna, ew jî bi dizî, diketin destê çend zanyar, mele û ronakbîran. Di wê demê de, dewleta tirk ne axa, ne mîr, ne beg û ne jî ronakbîr li Kurdistanê hiştibû!.. Ji ber vê yekê jî, xwedevanên Hawarê li Kurdîstana Bakur tunebûn. Di be ku, Hawarê çend xwendevan li herêma Behdînan û çend jî di nava kurdên Sûrîyê û Lubnanê de peyde kiribe.

Sînorên ku dijmin li ser axa Kurdistanê kişandibûn, nedihîştin dengê hawara ronakbîrên kurd li dervayê welat, bigihê gelê kurd. Ji ber van sedeman, Celadet Beg weşana Hawarê da sekinandin. Hawar di pey hejmara 57an de, êdî derneket. Ji bo derxistina weşanan, ku pere tunebe, xwendevan tunebin û bi ser de jî meriv di bin zixta dijmin de be; wê çawa weşan derkevin? Bi derneketina kovara Hawarê re, li dervayê welat di ziman û edebîyata kurdî ya nivîskî de jî, sekinandin çêbû. Lê hindik be jî, Celadet û Kamiran Beg di kovara Hawarê de bingehê zimanê kurdî yê nivîsê danîbûn; elfabe û gramera wî amade kiribûn û li ser ferhengê wî jî dixebitîyan.

Di gelek hejmarên Hawarê de, Celadet Beg pelek jî, ji ferhengê re veqetandîye; hin bêje û termên ziman ên ku wan çêkirine, mena wan nivîsîne. Herwiha Celadet Beg sê bingehê zimanê nivîsê, elfabe, gramer û ferheng, di kovara Hawarê de danîye. Ji xwe zimanê nivîsê bê van her sêyan nabe. Bi derneketina Hawarê re ziman, çand û edebîyata kurdî ya nivîskî li dervayê welat, rehên xwe yên jîyanê wenda kirin. Ziman û edebîyateke qedexe, wek ziman û edebîyata kurdî; hewcedarîya wan hê bi gelek kovarên wek kovara Hawarê û bi ronakbîrên kurd ku li dora wê civîyabûn, hebû. Ziman û edebîyata kurdî ya nivîskî tam di dema ku, êdî dikaribûn li dervayê welat rabin ser pêyan; weşana kovara Hawarê jî ber tunebûna îmkânên aborî hat rawestandin. Ev, ji bo ziman û edebîyata

kurdîya nivîskî, li dervayê welat mirin bû!.. Bi derneketina kovara Hawarê re; êdî Hawar ji bo nivşên pêşerojê, dibû rûpelek ji dîroka gelê kurd!..

Bi derneketina Hawarê re, dengê ronakbîrên kurdan jî, li dervayê welat hat birîn. Piştî demekê, kovara Hawarê, Celadet Bedir-Xan, Kamiran Bedir-Xan û ronakbîrên din, hêdî hêdî hatin ji bîrkirin. Hawar di destê çend ronakbîrên kurd û di refên çend pirtûkxaneyan de ma. Haya gelê kurd ji xebatên ronakbîrên kurd û ji van kovarên kurdî ku li dervayê welat derketin, çênebû. Ji xwe armanca dijmin jî ev e, ku ziman, çand û dîroka meriv bi meriv bide ji bîrkirin. Kesên ku zimanê dayîka xwe nizanibin, di pîrsa mafên xwe yên netewî de sist in. Kesên ku dîroka xwe nizanibin, nikarin pêşîya xwe jî bibînin.

Hemreş Reşo 33 sal di pey çapa Hawarê de, di sala 1976an de li Berlîna Rojava 34 hejmarên wê yên dawîn, 24-57, ji nû ve çap kir. Di pey çapa nû de haya xwendekar, ronakbîr û welatparêzên kurd ên li Ewrûpayê, ji zîman, edebîyat, çand û xebatên Celadet û Kamiran Bedir-Xan çêbûn. Herwiha, kovara Hawarê, zîman, edebîyat û çanda kurdî ya nivîskî ji nû ve hatin vejandin. Dibe ku di vê demê de, çend ronakbîr ji Kurdistana Bakur bi minasebeta gerê, hatibin Ewrûpayê û bi vî awayî haya wan ji kovara Hawarê û ji xebatên Celadet û Kamiran Beg çêbûbe. Ji dervayê vîya, haya welatparêz û ronakbîrên Kurdistana Bakûr ji kovara Hawarê û ji xebatên Celadet û Kamiran Beg tunebûn.

Ji sala 1960î heta 1980î li Kurdistana Bakur, dema bilindbûna hestên netewî bû. Di van deman de, li gelek herêmên dinyayê û him jî li Kurdestana Başûr, şerên netewî û çîneyetî dest pê kiribûn. Di nexşeya dinyayê de gelek guhartin çêbûbûn, bûyerên li dinyayê û şerê gelê kurd ji bo serxwebûn û azdîya wî, tesîrên mezin li Kurdistan Bakur dikirin.

Ji sala 1955-1970î li Kurdistana Bakur hejmara xwendekar, ronakbîr û welatparêzên kurd zêde dibû. Xwendekar û ronakbîrên kurd li Enqerê, li Stenbolê û li hin bajarên Kurdistanê, gelek rojnameyên sîyasî û çandî derdixistin. Rojnamên ku xwendekar û ronakbîrên kurd derdixistin, zîmanê wan bi tirkî bû. Lê hin çîrok, helbest û nivîsên kurdî jî weşandine. Di vê demê de, muxalefeta gelê kurd hêdî hêdî bilind dibû, hejmara ronakbîrên kurd zêde dibû. Lê di zîman, edebîyat û çanda kurdî ya nivîskî de, tu pêşketin çênebû. Zîmanê kurdî disa wek berê, di nava gel de jîyana xwe wek zîmanê axaftinê didomand.

Ronakbîr û welatparêzên kurd, piştî destpêka şerê gelê kurd î netewî, li Kurdistana Başûr, ji bo avakirina tevgerê sîyasî, li Kurdistana Bakûr, hewl didin. Di sala 1965an de, partîyeke sîyasî ya bi dizî dadimezirînin. Lê ronakbîrên kurd ji bo pêşketin û dewlemendbûna zîman, edebîyat û çanda kurdî ya nivîskî hewl nadin; weşaneke kurdî, dernaxin.

Ji roja ku Komara Tirkîyê hatîye damezirandin û heta dawîya sala 1970î li Tirkîyê şeş pirtûkên kurdî çap bûne:

1- Mûsa Anter: "Qimil" (1962), "Birîna Reş" (1965), "Ferhenga kurdî -tirkî"

(1967).

2- Kemal Badilli: "Gramera kurdî" (bi îzeheta tirkî 1965).

3- M. Emîn Bozarslan: "Elfabeya Kurdî" (1968).

4- Ehmedê Xanî: "Mem û Zîn" (A ku M. Emîn Bozarslan, wê ji tîpên erebî wergerand tîpên latînî û ji nû de, him bi kurdî him bi tirkî çapkir 1968).
Di dema Komara Tirkîyê de, ziman, edebîyat û çanda kurdî di bin zixta dewleta tirk de, paş de çûn.

Rejima 12ê adarê ya navbeyn, 1971-73, ji dêlva ku muxalefeta gelê kurd a netewî û demokratîk bipelçiqîne, hê jî wê bi hêztir kir. Di salên navbeyn 1974-80î de, ronakbîrên kurd, çend partiyên dizî yên din jî damezirandin. Dîsa kovar derxistin, komele danîn û xebatên girseyî kirin. Ev dem ji bo partî û komikên sîyasî, dema avakirina îdeolojîyê û zelalbûna sîyasî bû. Lê ronakbîrên kurd di vê demê de ji bo ziman û edebîyata kurdî tiştê nekirin; ji dêlva zimanê xwe yê zikmakî de, tirkîya xwe pêş de birin; xwe hînê nivîskarîyê kirin.

Di vê demê de, li Tirkîyê arenayêke sîyasî vebû, kurdan jî di vê arenaya sîyasî de, cîyê xwe girtin. Li Tirkîyê û li Kurdistanê, zimanê xebatên sîyasî û weşanên kurdan bi tirkî bû. Hin kovar û rojname, navên wan bi kurdî bûn, lê nivîsên wan, xeyn ji çend silogan û nivîsên sembolîk, tev bi tirkî bûn. Haya serok û rêberên partiyên kurdan, ji ziman û çanda kurdî tunebûn. Ziman û çanda kurdî di bin bombabarana dewleta tirk a nîjadparêz de bûn. Çerxa asîmlasyonê li Kurdistanê pir bi lez digerîya. Tu hewldanên rêxistinên kurdan, yên berbiçav, ji bo parastina ziman û çanda kurdî, li dij asîmlasyonê çênebû!

"Ma çî dibe? Îrlandî û îsçoçî bi înglîzî qise nakin?! Ma cezayîrîyan, erebî ji bîr nekiribûn?! Gelek welatên Afrîqayê, bi înglîzî û fransîzî qise nakin?! Berezîlya bi portekîzî û temamê Emrîqa Latîn bi îspanî qise nakin?!" Ku ew jî bi tirkî bi axifin, wê enerjîya tavê xilas bibe (?)

Çawa be, karkerên tirkan wê bi alîkarîya gelê kurd li Tirkîyê şoreş çêbikira!? Di pey şoreşê de, wê gelê kurd jî "azad" bibûya (!) Bi azadbûna gelê kurd re, wê zimanê wî jî azad bibûya!... Wê demê kurd dikaribûn bi hêsanî li kuçê bi hev re kurdî bi axifin! Bi vî awayî jî pîrsa ziman û çanda kurdî dihatin çareserkin!?

Ji sala 1970î heta sala 1980î li Tirkîyê çar pirtûkên kurdî derketine:

1- Kamiran Alî Bedir-Xan: "Gramera Kurdî" (bi îzeheta tirkî 77).

2- Ereş şemo: "Şivanê Kurd" (destan 77).

3- M. Emin Bozarslan: "Meyro" (kurteçîrok 79).

4- Rojên Barnas: "Li Bandeva Spêde" (helbest 80).

Welatparêz û ronakbîrên kurd jî di sala 1979-1980î de, sê hejmar kovareke kurdî ya çandî, bi navê "Tirêj" derxistin.

Bi qasa ku ez dizanim ji dervayê van pirtûkan, li Tirkîyê, tu weşan û pirtûkên kurdî derneketine. Li Tirkîyê derxistina kovar, rojname û pirtûkên kurdî, ne hêsan bûn. Dewleta tirk li dij xebatên kurdan yên sîyasî û çandî di şer de bû.

Weşanên kurdî dihatin qedexekirin, dihatin berhevkerin. Xwedî, berpirsîyar û nivîskarên wan dihatin cezakirin. Polîsên tirk, firotxên wan digirtin bin çav, li wan zilm û tehde dikirin! Bêguman, di bin van hoyên pir giran de, ziman, edebîyat û çanda kurdî nikaribûn bi pêşkevin!

Pêşveçûn û dewlemendbûna ziman, çand û edebîyatê, di bin mercên azad de, bi derketina weşanan gengaz (mimkûn) dibe. Bê weşan, ziman û edebîyat pêş de narin; para de derin.

Lê, rêxistinên kurdan dikaribûn di nava xwe de, biryar bigirtana, civîn, nîqaş û suhbetên xwe bi kurdî bikirana. Kesên ku kurdî nizanibûn, an jî hindik zanibûn, hînê kurdî bibûna. Ev jî ne gengaz bû; ji ber ku piranîya serok û rêberên rêxistinên kurdan, kurdî nizanibûn. Ên ku zanibûn jî fedî dikirin, di civatê de kurdî biaxifin. Bi vî awayî zimanê wan î zikmakî qels bû. Bi gotina wan, êdî nikaribûn di suhbetekê de, bi zimanê dayîka xwe, xwe "îfade" bikin. Van kesan ziman di nava însanan de tenê wek alavekî lihevkerin û lihevhatinê didîtin. Ji dervayê vîya, ziman ji bo wan tiştekî din nebû. Çawa be, alavekî wanê wisa hebû. Dikaribûn di civatê de, pir baş derdê xwe pê bînin ziman! Ew jî zimanê dijmin bû! Ev tiştekî pir ecêb bû, lê ji wan re tiştekî xwezayî bû!

Ev pêvajoya sîyasî û çandî, di 12ê îlonê sala 1980î de, li Tirkîyê û li Kurdistanê bi darbeya leşkerî ya faşîst hat seknandin. Darbeya 12ê îlonê bi temamê hêza xwe, li muxalefeta kurdan a netewî û li çepên tirkan xist. Di îşkencexaneyên dewleta tirk de, qîrîn û nalînên kurdan, dîwar û serbanên beton qul dikirin ber bi ezman ve bilind dibûn; ji wê jî pêl bi pêl li ser "Dinya Azad" û wlatên sosyalîst de bela dibûn. Ne kesî dixwest qîrîn û nalînên kurdan bibihîze û ne jî têştên ku dewleta tirk tîne serê wan, bibîne. Herkes, bi Tirkîyê re, li pey îmkarîna peymanên xwe yê sîyasî û aborî bûn. Ji dervayê kara wan, tiştekî din ji wan re girîng nebû.

Di pey darbê de, dîsa ziman, edebîyat, çand û folklorê kurdî hatin qedexekirin. Li bajarên mezin, gel disa ji tîrsa dewletê, li derva, li sûkê bi hev re tirkî axifin. Pirtûk, kovar û rojname disa hatin berevkerin, hatin şewitandin. Bi hezaran şoreşger, welatparêz, ronakbîr û xwendekarên kurd hatin girtin, îşkencekirin, kuştin û cezakirin! Kesên ku neketin destê cûnta leşkerî jî, disa xwe li sînoran xistin, revîyan dervayê welat! Vê carê kurd ne bi tenê bûn. Çepên tirka jî, ji ber zilma dewleta xwe ya faşîst direvîyan.

Piranîya kurdên ku revîyabûn dervayê welat, li Sûrîyê civîyan. Kurd demek li Sûrîyê man. Piştî demekê; hin rêxistinên kurd çûn Ewropayê û hin rêxistin jî li wir man.

Toreya civata kurdî

Zeynelabidîn Zinar

Her neteweyek çewa ku xwediyê toreyeka xwe ya taybetî ye, herweha Neteweyê Kurd jî xwediyê toreyeka xwe ya taybetî ye. Îcar ew toreyaya nijadî, te divê bila li gorî hinekan «paşverûtî» be, yan li gorî hinekan «rewa» be û li gorî hinekan jî te divê bila «pêşverûtî» û «demokratî» be, gelekî pêdivî û pêwîst e ku mirov wê toreyaya xwe ya nijadî têxe libatê û heger mirov li kîjan de vera dinyayê be jî, divê ku li gora wê toreyê bilipike. Eger ne wisan be, mana ku ez Kurd im, ev Tirk e, ew Faris e, ewê din Elmanî ye û ewê dîtirkê jî Swêdî ye namîne.

Em Kurdên ku niha li van welatên biyanî dijîn, dema ku em ji welatê xwe hatine, me gelek tiştên xwe yê nîjadî jî bi xwe re anîne van deran. Û me jî, mîna gelek pîtên (grûb) biyanî, li van welatan lenger bera erdê dane; ji bazirgantiyê bigir heta xwendin û siyasetê, em têkilî nava pir tiştan bûne. Me, wek Kurd çewa ku di van 15-20 salên bihurî de pir tişt wenda kirine û gelek kesên xwe «gurax warî» kirine, me ji aliyekî ve pir tişt qezenc jî kirine. Qezencine wisan ku niha gelek ciwanên me hene ku îro dizanîn û pêşketina xwe ya teknîka modern de, dijminên Kurdistanê av li destên wan nakin. Îcar niha di vê dema gengeşe de çi kesê ku xwe Kurd dihesibîne û ku xwe berpîrsyarê vê Doza Pîroz jî dibîne, barê herî giran li ser piştê ye û pêwîst e jî ku ew pir hay ji Toreya Civata Kurdî bimîne, wê toreyê di jiyana xwe de jî têxe pêveçûnê.

Pirsa ku ango Toreya Civata Kurdî çi ye û ew pêwîstî çi ne ku em bikin? Bêguman bersivdana ji bo van herdu pîrsan, bi cotkirina mexereke ango qadeke pir mezin jî nayê reşbelekiya rûpelan. Lê belê em ê gelekî kurt û bi hawayekî wisan zelal hewl bidin ku bînin bîra xwendevanên Çirayê ku çaxê kî vê nivîsê bixwîne, pêre pêre dê ferhenga mejiyê xwe vekirî bibîne û wê rûpelên jiyana li welêt li ber xwe vekirî bibîne û bi bînahiya çavên xwe jî dê bixwîne.

Berî ku ez dest pê bikim, divê ku vê yekê jî bînim bîra xwendevanên hêja ku her zimanekî li dinyayê, her toreyeke cuda ya li dinyayê, nexşekî gulîstana mirovatiya gêtiyê ye ku li jiyana xwe herûher û bêsekan didomîne. Bi zimanekî din ku ez bibêjim, yanî îro heger mirovên li dinyayê ku tevek zerik bûna, çenedibû. Lewra wê dengeya dinyayê leq bibûna û lihevbanîna mirovatiyê jî dernediket holê. Eger mirovên li dinyayê ku tevek reşik bûna, dîsa çenedibû. Eger mirovên li dinyayê ku tevek sorik bûna jî û wekî din xwedîgûnên pirtexlît

bûna, dîsanê çênedibû. Ji aliyê xwezayê ve jî ku ne weke niha bûna, yanî heger rewşa bej û behrê ne weke vêgavê bûna, dîsanê jiyana çênedibû. Ha nexwe madem ku rewş ev e û em tev jî bi vê rastiyê dizanin, nexwe eger hin tiştên toreyaya me ku li gorî nihek neteweyan paşverûtî û demderî bin jî, dîsanê pêdivî ye ku em Kurd xwedî lê derbikevin û di pêvajoya jiyana xwe de bidine jiyandin. Bi vê yekê, em Kurd ha wisan ji dinyayê re didine peyitandin û ji her kesî re diyar jî dikin ku bê guman e em jî neteweyekî serbixwe ne, xwediyê toreyeka xwe ya taybetî ne û her tiştên me yê toreyî ji Nijada Kurdî ne. Lê hema welatê me ku îro bindest û mêtingeh maye, jixwe her kes rind dizane ku ew gelşeke siyasî ya dinyayê ye.

Şirovekirina Toreya Civata Kurdî li vê derê, ne karekî hêsan e. Lewra çaxê ku em dibêjin «Civata Kurdî», ew civat gelek texlîtên xwe yê cihêreng hene. Weke Civata Olî, Civata Siyasî, Civata Axatî, civata ji bo bêş û bacan, ya ji bo şewbêrk û kêmuşan û gwn... Lê çewa ku me li jorê jî gotiye, bi kurdî em ê ji pratîka jiyana xwe ya biçavdîtî çend xalan li jêrê weha binivîsin:

- Kurd di civat û caxiyê xwe de, bi kurdî dipeyivin.

Li virê tenê axaftina bi kurdî têr nake. Dema mirov bi kurdî bipeyive, divê ku mirov hay ji kultura kurdî bimîne, hay ji toreyaya kurdî, rêzimana kurdî, bikaranîna peyvikên kurdî, sazkirina hevokên kurdî û rastaxaftina bi kurdî bimîne.

- Di civatan de, Kurd siyaneta rîspiyan xwe digirin û rêzaniya xwe bo wan pêşkêş dikin. Herweha pê li sêncê rewşenbîr û zanayên xwe nakin. Hiskirina xwe ji ciwanê nûhatî re nîşandidin û alîkariya wan dikin; bevzê wan xweş dikin û bîngeheke rind bo demepêşê ji wan re radixînin.

Rastiya vê gotinê, di koçberiya Kurdên Başûr de hate dîtin ku çî zilamê gava ji wir ve dihat, zarûkek li qoqlîka wî hebû, çî kalekî yan pîreka ku nikaribû bi rêve biçûna, ew li ser çardarekê dirêj kiribûn û çend zilam ew danîbûne ser milên xwe.

- Çî kesê dixwaze ku di civatekê de bipeyive, berî ku ew bipeyive, piştî xwestina destûrê hinekî disêwire û hêj bêjeyên ferhenga dilê xwe dixwe rêzkinê. Û hîç, bi tu rengî jî, ew gotina paşî li serê pêşî naxe.

Lewra gotineke Pêşiyana weha dibêje: «Mirov eger yê hev be, mirov ji hev nabe.» , «Eger mirov hevûdu bikuje jî, wê mirov laşê hevûdu veşêre.»

Îcar dema ku merov li van herdu Gorinên Pêşiyana difikire, tê de gelek tiştên ku hebûna me didine parastin xuya dibin. Şrûveya wan jî êdî bila xwendevan li ba xwe şekirrêz bikin.

- Civata Kurdî hertim weke xwendeghekekê dilqa xwe daye leyztandin. Ji dîroka Kurdan bigir, serpêhatî, gotina çîrok û meselokan, tar û bêş, alîkarî û tevdirgirtina li pêşberî dijminan hertim di xwe de wergirtiye û wek ragîhandineke netewî xeber û siqûmat belav kirine.

Çî kesê ku çî tiştêkî rind zanibûye yan tiştêkî çak ji deverêkê bihîztibe, ew hatiye û li civatê gotiye da her kes pê bizanibe û li wê gorê têgihîştina xwe berepêş bibe.

Lewra gotinek li nava Kurdan heye, weha dibêjin: "Timatî di her tiştê de dibe, lê di zanîne de nabe. Kesê ku di zanîna xwe de çikûztî bike, ew ji kirasê mirovan derketî ye."

- Dema Kurd li civatekê rexneyên baş, yan rexneyên nebaş li hevûdu dikin, ew rasterast ne bi peyvikên şor, yê wisanê tehl û tîrş, lê bi peyvikên pir xweşik û bi libelib meselokên kurdî dibêjin.

Eger pesnê yekî bi qencîti bidin, bi gumaniyeke hindik jî ku ew kes qenim bi ser xwe ve neçe û lingê xwe ji berika bavê xwe dirêjtir neke, bi gotina gotinên xweş tu carê wî nayînin coşê. Lê li pişt wî, hertim çakî û gencyên wî têne gotin.

Eger pesnê yekî bi xirabî bidin, bi gumaniyeke ku dîsanê ew kes li ber xwe nekeve, ango neêşe û bevzşkestî nebe, yan konê bêumîdî û naçartiyê ew mîna Konê Pîrê nehingêve, bi gotinên xirab tu carê wî naxin bêhêviyê; kesên zana, yê rîspî û rewşenbîr pê re dikevin têkiliyê û ji bo ajotina li ser riyeke rast pê re dibin alîkar. Ew kesê terebûyî çendî ku pir ji nava xwe razî ye, bi xwe her bawer e û kesî nayîne gûzeka xwe jî, lê bi rêveçûneke wisan pê re dilipikin ku ew hay ji xwe namîne.

Li ser vê yeka hanê, bi hezaran meselokên kurdî hene. Civatzanên Kurd hertim wan meselokan dibêjin û pê radeya tîna germiya civatê, yan ya wan kesên terebûyî dadixînin jêre ku jê xisarek mezin çênebe.

Lê gotina li virê de vera mixabinî û xebînetê ye ku hin birader li civatên kurdî radibin pê û meselokên biyanî dibêjin, pê hevûdu rexneyên erênî yan ên neyênî dikin. Ev yeka wan jî, sedsala 18-19'an tîne bîra mirov ku di wan heyaman de ne sînor hebûn û ne jî paseport. Lê îro rewş ne wisan e û tiştên wisa ji me re ne rewa ne.

- Di civata kurdî de niheqî û kêmxistinî çênabin. Yê ku bi devê xwe dişihite, yan çorsiyekê dike, bi tûjî lê nayête hilohilokirin û jê re ya rast bi delalî tê gotin.

- Kesê ku pîkoltiya xirabiya civatê dike, ew tawanê xwe ji aliyê civata kurdî ve dibîne. Ew tawan, lê ne weke yê desthelatiyeke xirab, erê weke ku li Kurdistanê ta niha jî Kurdên gundî dikin tete kirin.

Dema yekî gundî pîkoltiya xirabiya gund dike, gundî tawanê ku didinê ev e: Çend rojan an heftiyekê dewarên wî ji garanê vediqetînin. Pezê wî ji kerî cihê dikin û wî naxin nava tar, bêş û zibareyên gund. Îcar ev tawanê bi vî hawayî gava li kîjanê gundî tete kirin, ew gundî weke ku hatibe kuştin li ber xwe dikeve û careke din wê nebaşiyê nake.

Di vî warî de pir tiştên ku mirov bibêje, hene û nayêne jimartin. Lê ji ber ku rûpelên kovarê çavrêniya xameya pir kesan dikin, em ê li vir dawî bidin vê babetê. Di xweşiyê de bimînin.

Gelê kurd lawekî xwe î hêja winda kir!

Helbestevan, nivîskar û rojnamevan Orhan Kotan di 9ê tîrmeha 1998an de saet li dor 16:20an, rojke xembar a havînê, bi tenê, lê mêran e li odeyeke tenha ya nexweşxaneyê Karolinska (Stockholm-Swêd) bi dilçûkiya ku hemû jîna wî ya xebatê xemilandibû, ji nav me bar kir.

Orhan Kotanê ku temenê xwe giş pêşkêşî tekoşîna gelê kurd kiribû, heta rojên xwe yên dawî jî ji perspektîva xwe ya îdeolojîk, ji piştrastiya baweriya bi tekoşînê daneket. Her cara ku li dij nexweşîya bêbext serî hildida, digot "Di îdeolojiyê de tekoşîna gerîlayî nabe. Mîrov nikare lêxe û bireve. Divê niyeke xurt a şer hebe. Vê ji bîr nekin!"

Ew heta roja dawî jî xwediyê jiyaneke bi rûmet bû. Lê ji bo wî "Bi tenê xwedî rûmetbûn têrê ne dikir." "Diviyabû tekoşîn bi kakilê rûmetê bihata neqîşandin." Heta ku çavên wî ketin xeweke giran jî, ev felsefeya wî bû. Tev li jan û êşên 15 salên dawî jî, Orhan Kotan tu caran xwe ji xebat û tekoşînê neda paş, li ber xwe da, têkoşa. Rojek ji rojan nexweşîya xwe (tev li du emeliyatên gurçikguhertinê, du emeliyatên vekirî yên dil jî) ne kir mahne, yan jî bi hin argumentên din, destê xwe ji xebatê venekişand. Ji ber her rêza ku, her peyva ku dinivîsî, ji bo wî heman kat awayê jiyaneke bêhîle û bêderew bû...

"Bila nefrît bi xwîn û kema xwe gurçikên min veroje, ne xem e, madem bi qêrîna lorîkên îro û sibe çav li dinyayê vedikin, eger li Stokholmê jî be, bihar dibîşkuve."

Rojên ku ev rêz dirijyan ser kaxeta Orhan Kotan li dijî mirinê ketibû keftelefa jiyane; ne guh dida tirsê û ne jî westiyane cih ji xwe re li ba wî didît.

Orhan Kotan di sala 1944an de wek zarokekî duyem yê malbateke memûr û feqîr, lê li ser mohra "Komunîst-Kurtçî" heyî, hat dinyayê. Piştî xwendina pêşî û navîn ya li Kurdistanê, wî li Enqerê li fakulteya "Zîma-Dîrok" dest bi xwendina unîversîteyê kir. Bi aktîvî beşdarî tevgera ciwan a "68an" bû û ji ber vê yekê ha mecbûr ma ku dev ji xwendina xwe berde. Ji xwe dilê wî yê mezin ji bo Kurdistanê diavêt û di dawîya dawî de vegeriya Kurdistanê û li Melezgirê bi cih bû. Gava destana dîroka Kurdistanê li ser erdê Kurdistanê nivîsand hîn 24 salî bû.

Belkî jî vegera wî ya li Kurdistanê di jiyana wî ya rengîn û pirxebat de

qonaxeke bingehîn e. Di destpêkê de tev li tevgera Dr. Şivan bû û heta sekreteriya herêmê xebata xwe domand. Piştî mirina Dr. Şivan, bû yek ji giregire partiyê. Piştî sala 74 ê çaxê DDKO yê di nav grûba "Ocak Komunu" (Komuna çileyê paşîn) ya ku li girtîgeha Seyrantepe ya li Diyarbekirê serî hildabû, cihê xwe girt û bi hevalên xwe re li Kurdistanê jorî yekem navenda zanist û kulturê "Weşanxaneya Komal" danî û karê wê bi rê ve bir.

Ew qahremanê bênav yê ronahîdîtina bi dehan belgeyên dîrokî bû. Gava 76 ê kovara Rizgarî wek birûskekê li ezmanê Kurdistanê veda, ew yek ji endamê komîteya nivîsaran bû. Tev li ku Orhan Kotan xwîna dilê kovarê jî bû, wî wek dilpiçûkiya xwe ya her car navê xwe bi kar ne anî. Piştî inqîlaba eskerî ya di sala 1980î de, salên pîrxem û surgomê dest pê kirin. Her çend surgom jî bo wî "Xemên bi hezaran salên li ezmanê rengxwelî û tenhatiya li kolanên biyani" bû jî, kerba tekoşînê bi dehan car hat sûyîn.

Piştî qonaxa Dengê Komal, organîzekirina Organa Navendî ya Partiya Komunîst ya Kurdistanê "Yekîtî" da ser milên xwe, çaxê "Kurdistan Press" destpêka qonaxeke nû ya çapemeniya modern ya kurdî derket, cara pêşî Orhan li jêra nivîsan navê xwe danî. Di sala 1991ê de biryara ku bi serê xwe parastina perspektîvên xwe yê îdeolojîk bike da, dest ji pêwendiyên rêxistinî vekişand û wek ronakbîrekî kurd daket meydana tekoşînê. Ew jî ji ber ku, li gor wî, sînoren rêxistinî qonaxa xwenûkirina îdeolojîk dixist kirasekî teng. Piştî emeliyata duyem ya gurçîkê, doktorên wî pêşniyara bêhnvedaneke sedî sed dabûnê. Lê felsefeya wî zelal bû.

"Sitiranên min birnoyeke egîd in li lûtkeyên çiyayên min, va ye bereketa ji qesirên dîwarbilind, ji koşkên împaratorên têrutbe, ji camên ronahî durdan e, dadikeve ser destên min, ma kengî situyê min ji xeleda sêdarê ditirse gelî hogiran heyyy hey, hûn in binevşên mor û bişkuvî yê heviyên min."

Piştî salên surgomê Orhan Kotan vegeriya Stenbolê û weşana rojnameya Realite Press organîze kir. Di vê demê de jî dîsa ji perspektîvên xwe danediket. Di nivîsên bêhejmar û programên TV. de her tim hîn bêtir demokrasî dixwest û ji bo wî pîrsgirêk ne tenha pîrsgirêka kurdî, lê pîrsgirêka Kurdistanê bû. Bi tenê gotinên Orhanê ku bi sê kitêbên helbestan, bêhejmar gotar û lêkolîn û lêgerînan li pey xwe gencîneyeke dewlemend hiştiye, dikare wî bide nasîn.

"Ev demeke ku ez wek neferekî tekoşîna netewî û civakî ya li welatê xwe, ji bo bi cihanîna erkên xwe di kefteleftê de me. Li ser vî bingehî her kirinek, her helwestek, her fikira ku ketiye ser kaxetê ji bo min wek perçeyên destaneke mezin in. Ji mêj ve ye li fabrîkeyan, li zevîyan, li xwendegahan, li gundên çiyê û li ser sînoran, bi sedan milîtanên û digel texên din yê civakî mil bi mil em destaneke mezin dinivîsîn û dijîn. Bi vê maneyê bi pîvanên nas

nivîsandina helbestê pir sipehî ye! Lê jiyana wek helbesteke milîtan sipehîtir e. Destana vê mêrxasî û fedekariya mezin ya bi jana pirxwîn hatiye bistirîn, tê jiyîn. Wê bê nivîsandin jî.”

Bilâ dilê te rehet be Orhan Kotan...

Bicihanîna perçeyên destana ku te nivîsandiye, sonda me ye.

9 tîrmeh 1998 Stockholm



Li ber devê xwekuştina mawzeran Xalit Begê cibrî,
Seyid Riza di intûxara mawzeran de
şikeftên Dêrsîmê sitiraneke heyveronî ne,
mîrê mîran nema dikare biqîre, ew bêdeng e,
serdar û fermandar durû ne
û Milî Cephe bi pêxwasiyeke pozbilind
hinekî Marks, hinekî Hîtler
begên kurdan ku hatine xeniqandin
di gorên xwe de tîn gulebaran kirin
û Mustafa Kemalek di elîfbêya burjûwazî de

Di van çiyên de nîr
li situyê sitiranên me yên hinekirî hatin xistin
bi navê biratiya gelan
di van çiyên de zikên jinên ducan hatin qelişandin
di van çiyên de îstîklala tam hat fetisandin
lê lûle hîn sar ne bûbûn
rizgarxwazên milî dimeşiyên
pê li serên bi xwîn yên zarokan dikirin
û dimeşiyên rizgarxwazên milî
ji bo qetlîamên milî!

Orhan Kotan

SERSAXÎ

Bo malbata birêz Orhan Kotan,
Birêz Orhan Kotan ji bo doza gelê Kurd gelek xizmetên hêja kirine û di
vê rêyê da gelek êş û renc dîtine. Birêz Orhan Kotan heta ku çû heqîya
xwe jî, endamê Komela Nivîskarên Kurd li Swêd bû û dilê wî bi doza gelê
Kurd ra bû.

Em ji ber wefata şaîr nivîskar û welatparêzê birêz Orhan Kotan xemgîn
in û xwe wek hevparê êşa malbata wî dibînin. Bila serê malbata wî û gelê
Kurd sax be.

Komela Nivîskarên Kurd li Swêd

23.07.1998

Ji Komelê

1- Konferansek li ser mafê mirovî

Komela Nivîskarên Kurd li Swêd di 19.08.1998an da konferansek amade kir. Gotarvanê vê konferansê M. Selahattin Esmer (ji Komîta Rêvebirî ya Navendî ya Komela Mafê Mirovî li Tirkîyê) bû. Birêz Esmer hatibû vexwendin da ku bo Swêdîyan li ser bînpêkirina mafê mirovî û azadîya çapemenî konferansek bide. Me jî ji vê derfetê pêşdestî girt û bo kurdên Swêdê civînek li dara xist.

Birêz Esmer li ser mafê mirovî û azadîya çapemenî ya li Tirkîyê û Kurdistanê bi berfirehî sekinî û guhdaran agahdar kir. Ji ber ku statîstîk an bilançoya jêr, wêneyek baş ji rojeva civînê pêşkêş dike, em zêde dirêj nakin û blançoyê bo xwendevanên xwe ji tirkî werdigerînin kurdî.

Bilançoya Bînpêkirina Mafên Mirovî ya 1994 - 1997

Mafê Jîyanê

Kuştiyên bi destê qatîlên "nenas"	578 kuştî - 182 birîndar
Kuştinên bêdadî, encama êşkence û mirinên biçav.....	724
Kesên ku di şer da hatine kuştin.....	14267
Êrîşên ser sivîlan.....	958 kuştî - 1267 birîndar
Kesên êşkencedîtî û îddîayên êşkenceyê.....	3124
Girtiyên ku ketine biçav.....	76688
Girtin	6654
Îddîayên windabûyîyan.....	808
Gund û mezrikên valakirî -sotî.....	1834
Deverên bombekirî û derbxwarî	611

Jîyana Kar (kesên ji kar hatine avêtin)... 727818

Azadîya Raman, Çapemenî û rêxistinî

Rêxistinên girseyî, sazîyên siyasî û weşanên ku hatine girtin û mor kirin.....	508
Rêxistinên girseyî, sazîyên siyasî û weşanên ku ketine ber erîş û avêtinser.....	639
Weşanên ku hatine berhevkerin û qedexekirin	1227
Cezayê girtin û pereyî yên ku tên xwestin.....	5543 sal, 9 meh - 19 mîlyar 371 mîlyon LT.
Cezayê girtin û pereyî yên ku hatine birrîn.....	1139 sal 3 meh - 147 mîlyar 873 mîlyon LT.
Tawanbarên ramanî yên ku ketine girtîgehan..	466
Tawanbarên ramanî yên di girtîgehan da.....	133

2- Mesaj

Bo Berpirsiyar û karmendên MED-TVê

Komela Nivîskarên Kurd li Swêd, televîzyona MED-TVê wek dezgeheke bingehîn a çapemenîya kurdî dipejirîne, jiyandin û pêşketina wê dixwaze. Reşkirina ekrana MED-TVê rûreşî û korsanîyeke hovane ye, bînpêkirina mafê çapemenî, azadîya pêzanî û agehîgirtinê ye. Li dinyayê cara yekem e ku rûreşîyeke weha tê kirin. Û bêguman kesî ku xwe bike bin barê vê rûreşîyê jî, ji bilî dewleta Tirk kes nîne. Barbarîya vê dewletê ji berê va naskirî ye. Ew ê bi reşkirina ekrana MED-TVê û korsanîya ser peykan cardin bikeve tarîxê û wê gemarî bike.

Dewleta Tirk ketiye pêsirtengîyê. Li hundir serapê dirize, li derva hemû derî lê hatine girtin û rûmeta wê bûye pênc pere. Di bin her kevirî da pirsra kurdî dertê pêşîya wê û çareseriyê dixwaze. Ew bi rojevên şovenî, bi krîza sûnî ya li hember Sûrîyê û dewletên din nikare bigihîje cîhekî. Ev sîyaset arava serê wê ye, lewma jî:

- Divê dewleta-Tirk hişê xwe bide serê xwe û bersîva agirbestê bide!
- Rîya aşîfîyê veke û pirsra kurdî bi awayekî sîyasî çareser bike!
- Xwe ji çeteyan paqij bike û rîya demokrasîyê veke!
- Destê xwe yê qilêrî ji ser MED-TV û dezgehên kurdî bikêşîne!

Komela Nivîskarên Kurd Li Swêd

18.10.1998

3- Mesaj

Bo Rêvebirên Festîvala Şîera Kurdî

Şîer him di edebîyata kurdî ya nivîskî da him jî di parastina hebûna gelê Kurd da du rolên sereke daye ser milê xwe û rûyê me sipî kiriye. Di pêvajoya sedsalan da, ji Baba Tahir Hemedanî heta bi Cîgerxwîn barek ku di tu civatê da nayê dîtin daye ser milên xwe. Me hêsirê çavên xwe bi wê paqij kiriye û bi wê hestên me pêl dane, herikine ser dijminê gelê Kurd; me bi wê Mem û Zîn, Zembîlfiroş û Sîyabend û Xecê tam kiriye, derketine ser textê dildaran û evîna wan a kurdî; bi wê em şa bûne û me gerandiye govend û delîloyan; dîsa bi wê em fêrî zimanê kurdî û dewlemendiya wî bûne. Ango em deyndarê şîera kurdî û afirandêrên wan in.

Bi organîzekirina festîvala şîera kurdî, hûn him deynê xwe didin him jî karekî pir hêja bi cîh ûnîn. Ji herkesî bêtir jî, ev kar ji we tê xwestin lewra Cîgerxwîn ji nav we derketiye, Osman Sebrî û Namî ji nav we derçûye; Seydayê Tîrêj, Gundî û Seydayê Keleş ji nav we derketiye; Mîr Celadetê nemir li ba we afirandiye Hawarê û gramera zimanê maderî. Li ba we aj dane gelek hêjayîyên kurdî.

Em we pîroz dikin û bi daxwazên xurtkirin û domandina vê tradîsyonê silavên germ ên biratî ji we ra dişînin.

Komela Nivîskarên Kurd Li Swêd

12.10.1998

4- Semîner li ser şîera kurdî

Di 27ê hezîranê de li ABF'a Stockholmê li ser helbesta kurdî semînerek hat dayînê. Weke semînerdar Ahmed Huseynî di şîera kurdî de li ser erk û hêza peyvê hûr bû û dîtinên balkêş bi lêv kir. Giraniya semînera xwe li ser zarê kurmancî berhev kir û da zanîna ku: Di zimanekî de divê raman, peyv û hestên meriv bi hev re di harmoniyekê de bin. Raman, peyv û hest divê ji derekê, ji kaniyekê derkevin. Di berhemeke edebî de divê ev hersê fenomenên ha li gel hev biguncin ku meriv bibêje berhem berhema wî zimanî ye. Ji lewre ev hersê fenomen zimanekî karakterîze dike. Ev jî di roja îro de di kurmancî de têra xwe peyda nabe. Raman bi tirkî, hest bi erebî û tenê peyv bi kurdî be, bilindiya hunera berhemê jî ew ê tenê li gor wê peyva xwe be.

Semînerdarê duyemîn Xebat Arif jî pêşiyê li ser şîera Başûrê Kurdistanê agahdariyek berfere da û dûre bi pirs û bersivên beşdarên kêmhejmar semîner germtir bû. Xebat Arif da zanîn ku şîera kurdî li wir li gor pêlên siyasî û sosyal pêl dane. Ev rewşa siyasî û sosyal bêguman bandorek li kalîta şîrê jî kiriye.


Di 100 Salîya Rojnamegerîya Kurdî de Rojname û Kovarên ku li Swêdê Derketine

Mahmûd Lewendî

Li Swêdê di navbera salên 1956-1998an de 123 kovar, rojname û bulten derketine. Piraniya wan ji teref partî û rêxistin û komeleyên kurdan ve hatine derxistin. Ji van 123 kovara û

rojnameyan:

- 71 bi Kurdî
- 21 bi Kurdî-Tirkî
- 3 bi Kurdî-Swêdî
- 3 bi Kurdî-Erebî
- 13 bi Swêdî
- 7 bi Tirkî
- 1 bi erebî
- 1 bi almanî
- 3 bi îngilîzî ne.





- AŞTÎ (PEACE-FRED), Stockholm, kovar, 1983, Kurdî
- ALA, Spånga, kovar, 1986, (Berey Yekgirtuy Dimukrati Kurdistan, Kurdî)
- ALA, Swed, Organi Partî Serbexoyî Kurdistan, no: 5, 1993, sal: 7, Kurdî
- ALAY SÛRÎ KURDAYETÎ, Kovar, Irak, 1981 (Çapi 2. Stockholm, kurdî)
- ALAY YEKGIRTIN, Uppsala, 1976, (Organa Komîta Merkezî ya Partiya Komunîsta Iraqê) kurdî
- ARARAT, Eskilstuna, kovar, Kurdî-Swêdî, 1994
- ARMANC, Stockholm, rojname, 1979 (destpêk kurdî-tirkî, piştî Kurdi)
- ASO, Uppsala, kovar, 1976, Kurdî
- AVAŞÎN, Stockholm, 1996, kovar, Kurdî
- AVESTA, Sweden, no:1, 1990-91, Bi Swêdî
- AYLIK BÛLTEN, Stockholm, 1971, Tirkî
- AYRE, Stockholm, 1985
- BAHOZ, kovar (?) 1956
- BAHOZ, Swêd, kovar, 1970
- BELAVOK, Uppsala, no:7, 1979, Kurmancî
- BERBANG, Stockholm, 1982, Kurdî, Kovara Federasyona Komelên Kurdistan

Li Swêd

BERBANGÊ KURDISTAN, Uppsala, kovar, 1984, Tirkî
BERGEH, Stockholm, kovar, no;1, 1989, Tirkî-Kurdî
BERHEM, Stockholm, 1/1988, Kurdî-Tirkî
BERXWEDAN, Stockholm, 1983, Kovara Federasyona Demokrat ya Komelên
Kurd li Swêdê. Kurdî
BÎRNEBÛN, Almanya/Swêd, Kovar, 1997, Tirkî-Kurdî
BULTENA KOM KAR SWÊD, Stockholm, 1990, Kurdî
BULTENA KOMELA PIZÎŞKÊN KURDISTAN LI SWÊD, Stk.1988, Kurdi
ÇARÇIRA/ÇIWARÇIRA, Stockholm, kovar, 1/1986, Kurdî
ÇIRA, Stockholm, Komela Nivîskaran, 1995, kovar, Kurdî
ÇIRRO, Nynashamn, kovar, 1992, Kurdî
DEMOKRAT, Stockholm, kovar, 1988, Tirkî-Kurdî
DENG, Stockholm, 1/1985, KSSE, Kurdî
DENGÊ ŞAGIRTAN, Stockholm, 1991, Kurdî
DENGÊ WELAT, Stockholm, 1989, Stockholm, Organa TSK, Tirkî-Kurdî
DENGÎ YEKÊTÎ, Stockholm, 1978, "Rojnamey YNK-Liqî Ewropa"
DÎDAR, Stockholm, kovar, 1992, YCK Swêd, Kurdî
DÎMANE, Vesterås, kovar, 1991, Kurdî
DUGIR, Stockholm, kovar, 1995, Kurdî
ERKÎ NWÊ, Uppsala, 1988, YNK, Kurdî
GIZING Swêd, kovar, 1/1993, Kurdî
HELEBCE, Molndal, kovar, 1/1988, Kurdî-Erebî
HÊLÎN, Stockholm, Kovara Zarokan, 1982, Kurdî
HELWEST, Stockholm, Kovar, 1995, Kurdî
HEVGIRTIN/EL-ÎTTÎHAD, Stockholm, 1/1989 Kurdî-Erebî
HEVAL, Stockholm, kovara zarokan, 1995 (? b.t.), Kurdi
HÊVÎ, Stockholm, 1981, Kovara Zarokan, Kurdî
HÊVÎYA ME, Stockholm, kovara zarokan, 1997, Kurdî
HOMIL, Linköping, 1990, Kurdî
INFORMATION OM KURDISTAN, Stockholm, 1980, Swêdî
ÎNSÎYATÎF, Stockholm, kovar, 1996, Kurdî-Tirkî
ÎSOT, Stockholm, Kovar, 1/ 1985, Kurdî, Mizahi
JÎNA NÛ, Wan/Stockholm, kovar, 1979, Tirkî
JÎNDAN, Stockholm, kovar, 1/1996, Kurdî
KOÇER, Stockholm, 1/1988, kovara zarokan, Kurdî
KOMAR, Stockholm, 1/1990, Kurdî
KOMKAR INFO, Stockholm,
KONSEYA KURD, Stockholm, kovar, 1995, Kurdî
KONTRAKT, Uppsala, kovar, 1998, Kurdî
KORMIŞKAN, Stockholm, kovar, 1995, Kurdî (Dimilkî)

KULÛLK, Stockholm, kovara zarokan, 1980, Kurdî
 KURDERNAS VÄNNER I SVERIGE, Stockholm, kovar,2/1989, Swêdî
 KURDISK INFORMATION, Malmö, 1/1989, Swêdî
 KURDISTAN BULLETTINEN, Stockholm, 1981, Swêdî
 KURDISTAN BULLETTINEN, Stockholm, kovar, 1/1988, Swêdî
 KURDISTAN INFO, Swêd, nr.8/1988, Swêdî, Komkar
 KURD LI SPANGA/KURDER I SPÅNGA, Stockholm, kovar,1/1990
 KURDISTAN PRESS, Stockholm, rojname, 1986, Kurdî-Tirkî
 KURDISTAN RAPPORT, Stockholm, kovar, 1/1992, Swêdî
 KURDISTAN, Stockholm, kovar, 1/1991, Swêdî
 KURDISTANS SOL/ROJA KURDISTAN, Stk.1995, Heyva Sora Kurdistanê
 LEDAYIKBÛN, Uppsala, 1/1987, Kurdî
 MAMOSTAY KURD, Stockholm, 1985, Kurdî
 MÎRKUT, Stockholm, kovar, 1/1985, mizahi, Kurdî
 MUZÎK Û HUNER, Stockholm, kovar, 1980, Kurdî
 NEWROZ, Angered, no:1/1986, Kurdî
 NEWROZ, Komela Norsborg, Stockholm, kovar, no:2/1986, Tirkî-Kurdî
 NEW PESH MERGA, Stockholm, no:17, 1982, îngilîzî
 NEW TIME, Stockholm,1/1987 (Serdemi Nwê), Ingilizî
 NIŞTIMAN, Stockholm, kovar, 1983, Tirkî-Kurdî
 NÛDEM, Stockholm, kovar, 1/1992, Kurdî
 NÛSER Stockholm, 1991(?) (Kovara Yekiti Nuserani Kurdistan), Kurdî
 NYHETSREVY, Stockholm, nr.1/1990, Swêdî
 PALE, Uppsala, kovar, no:2, 1978, kurdî
 PÊŞENG BO ŞOREŞ, Kurdistan, Stockholm (Kurdî-Tirkî)
 PÊŞREW, Swêd, 2/1984, (organi K.X.K.E) Kurdî
 PÊŞREW, Uppsala, 1983, Kurdî
 PEYAM, Jönköping, no:5-6/1997, Kurdî
 PÎYA, Stockholm, kovar, 1/1988, Tirkî-Kurdî (Dimilkî)
 QÊRÎN, Stockholm, kovar, 1981, Tirkî-Kurdî
 RABÛN, Stockholm, kovar, 1/1991, Kurdî
 RABÛN, Uppsala, 1975, Organa BAHÖZ
 RASTÎ, Stockholm, kovar, 1998, Kurdî
 RAYET EL ÎTTÎHAD, Uppsala, 1984, Erebi
 REHEND, Stockholm, kovar, no:2/1997, Kurdî
 RÊNASÎ, Stockholm, bulten, 1984, Kurdî, xwedî:Kurdiska Projekt
 RIYA AZADI, Stockholm, 1982, (Organa PSK-T)
 RIZGARIYA KURDISTAN, Stockholm, kovar, 1979
 ROJA NÛ, Stockholm, kovar, 1978, Tirkî-Kurdî (piştire Kurdî)
 ROJBAŞ, Luleå, no:2/1997, kovar, kurdî-tirkî
 ROJEV, Uppsala, kovar, 1991, Kurdî- Tirkî

ROJNAMA BIYANÎYAN, Norköping, hejmara taybetî, 1985, Kurdî
 ROJNAME, Stockholm/Istanbul, 1991
 RÛNAKBÎRÎ, Stockholm, 1/1992, Kurdî (Sorani)
 SERDEMÎ NWÊ (Serdema Nû), Stockholm, 1/1986, Kurdî
 SERHILDAN, Swêd, kovar, 1/1992, PAK, Kurdî
 SLAGBORREN, Stockholm, 2/1984, Swêdi (xwedî: Kurdiska Projekt-
 SOSYALÎZM YAN BERBERÎ (Socialism and Barbarism), Eskilstuna, kovar, 1985
 STÊRKA SOR/RÛDA STJARNAN, Stockholm, 1977, Kurdî-Swêdi
 STIMME KURDISTAN, Uppsala, kovar, 1980, Almani
 SVENSK KURDISK JOURNAL, Stockholm, kovar, 1985, Swêdi
 ŞANO, Stockholm, kovar, 2/1987, Kurdî
 ŞANO Û SÎNEMA, Stockholm, kovar, 1995, Kurdî
 TÊKOŞÎNA SOSYALÎST, Stockholm, kovar, 1/1989, Tirkî
 TEVGER, Stockholm, 1/1989, Tirkî-Kurdî
 THE SPARK, Stockholm, 1977, YNK, Ingilîzî
 TÎRÊJ, Izmir/Stockholm, kovar, 1979, Kurdî(Kurmanci-Dimilkî)
 VATE, Stockholm, kovar, 1/1997, Kurdî (Dimilkî)
 WAN, Stockholm, kovar, 1/1992, Kurdî, (Yekitiya Nivîskarên Kurd)
 XEBAT JIBO SERXWEBÛNA KURDISTAN, Kurdistan/Swêd, Kovar, 1990/
 1991 (PDK-T)
 XEBERNAME, Linköping, 1/1989, Kurdî
 XERMANE, Stockholm, kovar, 1991, Kurdî
 XWÊNDIKARÎ KURD, Stockholm, kovar, 1/1982, Kurdî (SOKSE)
 YAYIN DÛNYASI/CÎHANA WEŞANAN, Stockholm, 1997, Tirkî-Kurdî
 YEKBÛN ÎNFO, Stockholm, 1993, Kurdî
 YEKÎTÎ/YEKÊTÎ, Swêd, 3/1981, Erebi-Kurdî, Xwedî: Komela Xwendavanên Iraqî
 YEKÎTÎYA SOSYALÎST, Suriye/Swêd, 1984, no:23: 1990, Tirkî
 ZENGIL, Stockholm, 1985, Kurdî, mizahi



Sersaxî

Wek ku Sebrî Botanîyê birêz bixwe dibêje, ew ji sala 1944an virda dest avêtiye pênivîsê û ew û helbest bûne yek parçe di şerê azadîya Kurdistanê da. Pêncî û çar sal bi xewna Kurdistanê serbixwe û Kurdên azad di ber xwe daye. Di zîndanên da di ber xwe daye; li çîyayên qedirnas ên Kurdistanê di destekî wî da pênivîs di yê din da çek pêşmergetî kiriye; mecbûr maye derketiye dervayî welat û li penaberîyê jîyaye lê dilê wî hertim bo welatê wî avêtiye, bi wî rabûye û bi wî rûniştîye. Apê Sebrîyê helbestvan, rojnamevan û ronakbîr heta ku çû ser heqîya xwe jî KURD bû û xewn û xeyala wî KURDÎSTAN bû. Bila serê gelê Kurd û malbata wî sax be.

Komela Nivîskarên Swêd Li Swêd
29.10.1998



Sebrî Botani
1927 - 1998.10.25

Heyhê

Gote ji kengî ve?
Got ji hingê ve
Ez ê pê ve
Her bi rê ve
Çûme û diçim
Gêj û pîr dibim
Heware keko
Rabe Çeko
Min xo winda kir
Heşa reşa hezar gunda
Li ser xo kir,
Ya xo jî bi serê
Hezar gunda kir
Dil bi kul û jan im
Bê nav û nîşan im
Tiştêkê ji xo nizanîm
Şikestî me
Mişxetî me
Setembar im
Gunehkar im
Fihêtkar im
Ji welat jî
Şermezar im
Bê pênas im
Xo nenas im
Çax û dem im
Ne ji Adem im
Ji axa Kurdistan im
Dijminê faşîstan im
Êk bêjît êkê
Ne hêk ji mirîşkê
Ne mirîşk ji hêkê
Ez meymûn im
Kekê Şileymûn im

Darwîn dît û got û
Nivîsand
Ew gotina berî xo betal kir û
Şewitand

Hey hêêêêêê
Hezar hey hê
Min xwe dît û
Rê winda kir,
Tarîxek nû min peyda kir
Rê windame
Li Ewrûpa me
Li Bexda me
Keşkola xem û derda me
Xem kirim, pê difirim
Diçim Amed û Wanê
Mehabad û Batmanê
Dikim çîrok
Dikim dîrok
û.....

Venagerim

Têm û diçim li te d'gerim
Aware bim li te d'gerim
Direvim ji li te d'gerim
Dikevim jî li te d'gerim
Ku nivistim xewna min î.
Êrîş dikim li te d'gerim
Navegerim heta d'gehim
Li te d'gerim, li te d'gerim


Ji weşanên nû

”Hoybûn örgütü ve Ağrı ayaklanması” Rohat Alakom




Rohat Alakom bi vê kitêba xwe ya ku bi tirkî nivîsiye, di derheqê rêxistina Hoybûnê û serhildana Agirî de bi belge, agahdariyeke berfireh dide xwendevanan. Nivîskar li ser sereketiya Hoybûnê, kadroyên wê, nakokiyên ku di nava rêxistinê de pêtî dabûn û serhildana Agirî, sekiniye. Ev kitêba ku ji teref weşanxana Avesta ve hatiye çap kirin, 184 rûpel in. 25 rûpel jê belge û 24 rûpel jî wêneyên birêvebirên Hoybûnê ne.

”Helbestvanê tepeser û hejaran Letîf Helmet”



Ev berhem ji alî Xelîl Duhokî hatiye amadekirin. Weşanxaneyê Enstîtuya Kurdî ya li Brukselê ev pirtûk çap kiriye. Pirtûk ji 122 rûpelan û du beşan pêk tê. Beşek jê şirovekirin e, ya duduyan şîer û ferhengoka wan e.

”Kurdistanî İroyîn” (Problemên tevgera netewî)



Ev pirtûk ji alî Navenda Lêkolînên Kurdî hatiye amade kirin. Di vê pirtûkê da gotarên zanyarên Rûs û Kurd cîh digrin. Zanyarên wek M.S.Lazarêv, Şekro X. Mihoyî, M.A.Hasretyan, O.İ. Jîgalîna û A.H.Bagîrov di gotarên xwe da, bi çavekî ilmî problemên tevgera netewî ya Kurd a nûdemî analîz dikin. Gotar ji rûsî hatine wergerandin. Ev berhema hêja 152 rûpel e û ji alî Weşanên Roja Nû hatiye çap kirin.

"Li welatê qirokan" Cemalî



Ev çîrok beş bi beş di rojnama Ronahî û piştire jî di Hêvîyê da hatine weşandin. Bi temamî 35 beş in û niha jî wek pirtûk hatine çap kirin. Çîrok him bo mezinan him jî bo zarokan e. Him meriv dikenîne him jî dide fikrandin. Nivîskar, qirokan dike mane lê di eslê xwe da li ser merivan dibêje û li nebaşîyên wan bi şêweyê pêkenîne rexne dike. Berhem bi wênexetên karîkatorîstê navdar Ender Özkahraman hatine xemilandin û hêjayê xwendinê ye. Ew, 176 rûpel e û ji alî Weşanên Roja Nû hatiye çap kirin.


"Hozanvanêt Kurd"

Sadiq Behaedîn Amêdî




Ev berhem, lêkolîneke hêja ye û li ser jîyana 19 helbestvanên Kurd rawestiyaye û nimûne ji helbestên wan pêşkêş kiriye. Jîyan û berhemdarîya helbestvanên Kurd bi rêzeke kronolojîkî hatine bi cîh kirin. Pirtûk ji 468 rûpelan pêk tê, ji alî Weşanxaneyê Çanda Kurdî - Pencînar hatiye çap kirin û wergera wê ya ji tîpên Erebi ji alî Zeynelabidîn Zinar va hatiye kirin.

"Sêkêşan"- Melle Evdîhadîyê Comanî



Ev pirtûka helbestê ya kitejimar di 1384ê (1963-64 zayînî) koçê da bi tîpên erebî hatiye nivîsandin. Zeynelabidîn Zinar ew ji tîpên erebî wergerandiye û digel orîjînalê wê daye çapkirinê. Pirtûk 232 rûpel e û ji alî Weşanxaneyê Çanda Kurdî-Pencînar hatiye çap kirin.



"Dîwana Osman Sebrî"

Ev berhem, ji devê Osman Sebrî, Îsmet Şerîf Wanlî û A.Balî jîyana ronakbîrê mezin û berhemdariya wî dide nasîn. Digel vê danasînê temamîya pirtûkê ji helbestên Osman Sebrî pêk tê û wek ku ji navê pirtûkê jî xuyaye, berhem dîwana Osman Sebrî ye. Pirtûk 216 rûpel e û ji alî Weşanxaneyê Apecê va hatiye çap kirin.

12-13 december 1998
PÊŞENGEHA KITÊBÊN KURDÎ

(Ustállning av kurdiska böcker)

Di pêşengeha îsal de semîner, xwendina helbest, çîrok û munaqeseyên cihê hene. Herweha ji bo sedsaliya Rojnamegeriya kurdî weşanxaneyên kurdan li hev kirine ku îsal kitêbên xwe ji % 30 î heta 70 yî bi erzanî bifroşin.

Semîner:

12 December: Li ser kovara Hawarê **Firat Cewerî**

12 December: Li ser Şerefnameyê **Abdollah Mardux**

13 December: Li ser modernîte, etnîsîte û neteweyetî **Ebbas Welî**

Dem/ Datum:

Şemî/Lördag 11.00 - 18.00

Yekşem/ Söndag 10.00 - 18.00

Cih/ Plats:

ABF-Huset, Sveavägen i Stockholm

Amadekar/Arrengörer:

Apec, Helwest, Deng, Jîna Nû, Kitab-i Erzan, Kawa, Medya, Nûdem, Vate, Jîndan, Bîrnebûn, Rewşen, Peyam, Pencînar, Dugir, Rabûn, Rehend, Gizing

ji telefon û faksên jêrîn hûn dikarin agahdarî werbigirin:

Tel: 08-26 23 75, 761 81 18

Faks: 08-25 38 57, 761 24 90